



K.T.

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTÛKLÛYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

RISTEYÊN KOMPLEKS DI BAZEBERÊ DA

Abdurrahman DALAR

Şêwirmend

Prof. Dr. Tahirhan AYDIN

Mardîn 2022

K.T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTÛKLÛYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

RISTEYÊN KOMPLEKS DI BAZEBERÊ DA

Abdurrahman DALAR

Şewirmend

Prof. Dr. Tahirhan AYDIN

Mardîn 2022

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
TEZ ONAYI

Enstitümüz Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı 19711007 numaralı Yüksek Lisans programı öğrencisi Abdurrahman DALAR’ın hazırladığı “Risteyên Aloz di Bazeberê da” başlıklı YÜKSEK LİSANS tezi ile ilgili TEZ SAVUNMA SINAVI, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 22/11/2022 Salı günü saat 09:00’da yapılmış, tezin onayına OY BİRLİĞİYLE karar verilmiştir.

Başkan

Prof. Dr. Hayrettin KIZIL

Üye

Prof. Dr. Tahirhan AYDIN

Üye

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

ONAY

Bu tezin kabulü, Enstitü Yönetim Kurulu’nun Tarih ve sayılı kararı ile onaylanmıştır.

.....

Enstitü Müdürü

ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;

Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,

Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,

Tez çalışmada kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,

Tez çalışmasının özgün olduğunu,

Tez çalışmasının Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından kullanılan “bilimsel intihal tespit programı” ile tarandığımı ve hiçbir şekilde “intihal içermediğini” beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucu kabullendiğimi bildiririm.

.../.../.....

Abdurrahman DALAR

KURTE

Teza Lîsansa Bilind

Risteyên Kompleks di Bazeberê da

Abdurrahman Dalar

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

96: Rûpel

Di vê xebatê da lêkolîn li ser kitêba Mela Se'îd a bi navê Bazeberê hatîye kirin û risteyên kompleks hatine ravekirin. Wekî adetî ne bi awayekî klasîk, lê bi nerîneka modern risteyên kompleks hatine dabeşkirin. Rewşên ku risteyên kompleks pêk tên bi hûrgilî hatine ravekirin û bi nimûneyên ku ji Bazeberê hatine wergirtin, mijara xebatê hatîye zelalkirin. Di beşa yekem da ji bo ku rê li ber tevlihevîya mijareka termînolojîk were girtin cudahîya riste û hevokê hatîye kirin û riste weke "sentence" hevok jî weke "clause" hatine şirovekirin. Herwiha cureyên riste û hevokan hatine şirovekirin û ji bo pihêtiya mijarê hinek mînak ji Bazeberê û hin çavkanîyên dîtir hatine wergirtin. Beşa duyem li ser jîyan û berhemên Mela Se'îdê Şemdînanî ye. Rola wî ya civakî û siyasî, şewirmandîya wî ya ji bo rayedarên siyasî û dînî, banga wî ya xêrxwazane ji bo kurdan, nefîkirina wî ya ji ber fetwaya siltanê Osmanî, hevkarîya wî ya bi Basil Nikitinî ra hatîye vegêran. Di beşa sêyem da ji nimûyên ku ji Bazeberê hatine wergirtin behsa risteyên kompleks hatîye kirin. Pêkhatina risteyên kompleks yên ku bi cureyên hevokan çê dibin hatine ravekirin. Risteyên kompleks bi para zêde ji cureyên hevokan pêk tên. Risteyên kompleks yên ku bi hevokên sereke, nesereke, tamamker, hevseng, tamamker û espektîf pêk hatine bi nimûneyên ji risteyên Bazeberê hatine polînkirin û ravekirin. Fonksiyona cureyên hevokan, tesîra wan ya li ser pêkhênên risteyê yên wekî biker û berkarê û fonksiyona bingihênak ku pêwenda riste û hevokê saz kirine di çarçoveya nimûneyên ji Bazeberê wergirtî, hatine nirxandin.

Bêjeyên Sereke: Riste, sentaks, hevok, cureyên hevokan, risteyên kompleks, bingihaneke, şewaza Mela Se'îd, Bazeber.

ÖZET

Yüksek Lisans Tezi

Bazeber’de Kompleks Cümleler

Abdurrahman Dalar

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

96: Sayfa

Bu çalışma kompleks cümleler çerçevesinde Mela Se’îd Şemdînanî’nin Bazeber adlı eserini araştırma konusu yapmaktadır. Kompleks cümleleri alışlagelen klasik bakış açısıyla değil, modern bir bakış açısıyla ele almıştır. Kompleks cümleleri meydana getiren durumlar ayrıntılı bir şekilde açıklanmış ve Bazeber adlı eserden alınan örnek cümlelerle araştırma konusuna açıklık getirilmeye çalışılmıştır. Birinci bölümde terminolojik bir konu olan cümle ve tümce arasındaki karışıklığa açıklık getirilmeye çalışılmış ve cümle “sentence”, tümce ise “clause” olarak tanımlanmıştır. Ayrıca cümle ve tümce türlerinin tanımı yapılmış ve konunun pekişmesi için Bazeber adlı kitaptan ve diğer kaynaklardan örnekler verilmiştir. İkinci bölüm ise Mela Se’îd Şemdînanî’nin hayatı ve eserleri için ayrılmıştır. Sosyal ve siyasi açıdan rolü, dini ve siyasi yetkililere yaptığı danışmanlığı, Kürtler için iyi niyet göstergesi olarak yaptığı çağrı, Birinci Dünya Savaşı döneminde Sultan Mehmet Reşad’ın emriyle çıkarılan fetvaya uymadığı için sürgün hayatı ve Basil Nikitin ile geçirdiği mesai arkadaşlığı anlatılmıştır. Üçüncü bölümde Bazeber adlı eserden alınan örneklerle kompleks cümleler anlatılmıştır. Tümce çeşitleriyle kurulan kompleks cümlelerin tanımı yapılmıştır. Bazeber’den alınan kompleks cümleler temel, bağımlı, bağlaçlı, ilgi, isim ve ara tümcelerle kurulan kompleks cümleler açısından sınıflandırılıp yorumlanmıştır. Bazeber’den alınan örnek kompleks cümleler, tümce çeşitlerinin cümlede içerisinde özne ve nesne fonksiyonu üzerinden değerlendirilmiş olup cümle ve tümceyi birleştiren *ku* bağlacının görevi anlatılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Cümle, sentaks, tümce, tümce türleri, kompleks cümleler, bağlaç, Mela Se’îd’in üslubu, Bazeber.

ABSTRACT

Master's Thesis
Complex Sentences in Bazeber
Abdurrahman Dalar
Mardin Artuklu University
Institute of Living Languages in Turkey
Department of Kurdish Language and Culture

96:Page

This study focuses on Mela Se'îd Şemdînanî's work called Bazeber within the framework of complex sentences. Complex sentences are handled with a modern point of view, not the usual classical point of view. The situations that make up complex sentences are explained in detail and the research topic is tried to be clarified with sample sentences taken from Bazeber. In the first chapter, the confusion between sentence and clause, which is a terminological subject, was tried to be clarified and the sentence was defined as "sentence" and the clause as "clause". In addition, definitions of sentence and sentence types were made and examples from Bazeber and other sources were given to reinforce the subject. The second part is devoted to the life and works of Mela Se'îd Şemdînanî. His role in social and political terms, his consultancy to religious and political authorities, his call as a sign of goodwill for the Kurds, his exile life for not complying with the fatwa issued by Sultan Mehmet Reşad during the First World War, and his working friendship with Basil Nikitin are explained. In the third chapter, complex sentences are explained with examples taken from Bazeber. The definition of complex sentences formed with sentence types has been made. Complex sentences taken from Bazeber were classified and interpreted in terms of basic dependent, conjunction, complex sentences formed with relation, noun and intermediate clauses. Example complex sentences taken from Bazeber were evaluated through the subject and object function of the sentence types in the sentence, and the function of the conjunction ku that connects the sentence and the clause was explained.

Key Words: Sentence, syntax, clause, clause types, complex sentence, conjunction, Mela Se'îd's style, Bazeber.

PÊŞGOTIN

Mijara vê xebatê ji aliyê risteyên kompleks ve li ser Bazebera Mela Se'îdê Şemdînanî ye. Risteyên kompleks ji aliyê avasazîyê ve beşek ji cureyên risteyan e û di rêzimanê da giringîya xwe gelekî heye. Risteyên kompleks bi piranî bi navgîniya cureyên hevokan pêk tên ku em dê jî li dorhêla cureyên hevokan risteyên kompleks yên Bazeberê destnîşan bikin. Ji Celadet Bedirxanî û vê da di warê ristesazîyê da xebat pir hindik hatine kirin û bi taybetî di derbareyê risteyên kompleks da gelek valahî hene. Ji bo her zimanî parastina ristesazîyê gelekî giring e lewra ziman wekî bingeh xwe li ser ristesazîyê ava kirîye. Heçî ristesazîya kurmancî be giringîya parastina ristesazîyê ji ber tesîreka neyînî ya zimanên cîranên kurmancî xwe ferztir dide nîşan. Ji ber ku vê xebatê bi nerîneka modern cureyên risteyên kompleks dabeş kirîye û berhemeka berîya nêzî 120 salan ji xwe ra kirîye qada lêkolînê meqsed jê ew e ku vê xebatê bi qasî qeware û derfeta xwe tiştêkî li ser xebatên ristesazîyê zêde bike.

Di vê xebatê da cureyên riste (sentence) û hevokan (clause) hatine pênasekirin piştra jî ji aliyê cureyên risteyên kompleks ve risteyên kompleks ên Bazeberê hatine destnîşankirin û dabeşkirin. Xebatên Dr. Mikail Bülbül bi taybetî teza wî ya doktorayê ya bi navê *Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêziya Wan* û maqaleyên wî yên bi mijara tezê ra eleqedar û xebatên dîtir yên li ser ristesazîyê bûne çavkanîyên sereke.

Ev xebat, ji destpêk û encam û sê beşên bingehîn pêk tê. Di destpêkê da pêşî xebat hatîye danasîn û piştra rave û şiroveya mijarê û giringiya tezê, sînorê wê, dijwarî û

çavkanîyê wê hatine ravekirin. Di beşa yekem da çarçoveya teorîk û têgehên sereke yên mîna ristesazî, riste, ji alîyê armanc û avasazîyê ve riste, hevok û cureyên wan hatine danasîn. Di beşa duyem da jîyan û berhemên Mela Se'îd, bîr û boçûn û cîhanbînîya wî, ziman û şêwaza wî, kurmancîya Şemzînanê û ya Mela Se'îd bi qiyasa kurmancîya standart hatîye behskirin. Di beşa sêyem da bi hûrgilî behsa cureyên risteyên kompleks hatîye kirin û risteyên kompleks ên Bazeberê hatine destnîşankirin. Di beşa encamê da jî bi kurtî mebesta yekûna xebatê hatîye kirin û giringîya risteyên kompleks û ya Bazeberê hatîye destnîşankirin.

Hêvî ji vê xebatê ew e ku ji bo baldaran di warê risteyên kompleks da bibe derfetek û herweha di vî warî da bi nerîneka modern xebatên pir hêjatir bi domdarî werin kirin. Malavayîyê li mamosta Prof. Dr. Tahirhan AYDIN dikim ji bo ku di her pengaveka vê xebatê da min ji alîkarî û derfetdayîna xwe bêpar nehişt û spasîyê li Dr. Mikail BÛLBÛL dikim ku bi têbinîyên xwe kir ku mijar ji bo min zelaltir bibe da bikaribim analîzên xwe li ser mînakên risteyên kompleks bi hêsanî bikim.

Abdurrahman DALAR

Mardin 2022

NAVEROK

KURTE	iv
ÖZET	v
ABSTRACT	vi
PÊŞGOTIN	vii
NAVEROK	ix
DESTPÊK	1
<i>Mebest, Mijar û Giringîya Tezê</i>	1
<i>Sînor û Çarçoveya Tezê</i>	2
<i>Rêbaza Lêkolînê</i>	3
<i>Dijwarîyên Lêkolînê</i>	3
<i>Çavkanîyên Tezê</i>	4
1. ÇARÇOVEYA TEORÎK Û TÊGEHÊN SEREKE	5
1.1. Ristesazî	5
1.2. Riste	5
1.3. Cureyên Risteyan	6
1.3.1. Riste ji alîyê armancê ve	6
1.3.1.1. Risteya ragihandinê	6
1.3.1.2. Risteya pirsyarî	7
1.3.1.3. Risteya fermanî	8
1.3.1.4. Risteya baneşanî	8

1.3.2. Riste ji alfyê avasazîyê ve	9
1.3.2.1. Risteyên xwerû.....	9
1.3.2.2. Risteyên kompleks	10
1.4. Hevok.....	12
1.4.1. Cureyên hevokan	13
1.4.1.1. Hevoka sereke	13
1.4.1.2. Hevoka nesereke	13
1.4.1.3. Hevoka hevseng	14
1.4.1.4. Hevoka pêwendîyê.....	15
1.4.1.5. Hevoka navdêrî	16
1.4.1.6. Hevoka tamamker	16
2. JÎYAN, BERHEM Û REWANBÊJÎYA MELA SE'ÎD ŞEMDÎNANÎ.....	18
2.1. Jiyana Mela Se'îd Şemdînanî.....	18
2.1.1. Raman û cîhanbînîya Mela Se'îd Şemdînanî.....	19
2.1.2. Baldarîya Mela Se'îd Şemdînanî ji bo çapgêrîya kurdî	21
2.1.3. Bangeka xêrxwazane ya Mela Se'îd Şemdînanî ji bo milletê kurd	22
2.1.4. Rawêjkarî û rêzanîya mela Se'îd Şemdînanî	24
2.2. Berhemên Mela Se'îd Şemdînanî	26
2.3. Ziman û Şêwaza Mela Se'îd Şemdînanî	27
2.4. Kurdîya Şemdînanê û Bazeberê û Qiyasa Wê bi Kurdîya Îroyîn ra	30
3. RISTEYÊN KOMPLEKS Û CUREYÊN WAN DI BAZEBERÊ DA.....	33
3.1. Risteyên Kompleks ku Hevokên Hokerî di Wan da Hene	34
3.1.1. Risteyên kompleks ku hevokên hokerî yên armancî di wan da hene.....	34
3.1.2. Risteyên kompleks ku hevokên hokerî yên mercî di wan da hene.....	38
3.1.3. Risteyên kompleks ku hevokên hokerî yên sedemî di wan da hene	41
3.1.4. Risteyên kompleks ku hevokên hokerî yên demî di wan da hene.....	45
3.1.5. Risteyên kompleks ku hevokên hokerî yên dijberî di wan da hene	48
3.1.6. Risteyên kompleks ku hevokên hokerî yên rewşê di wan da hene	51
3.2. Risteyên Kompleks ku Hevokên Temamker di Wan da Hene.....	52
3.2.1. Risteyên kompleks ku hevokên tamamker ên lêkerên pêhesînê di wan da hene.....	56

3.2.2. Risteyên kompleks ku hevokên tamamker ên lêkerên pêzanînê di wan da hene	59
3.2.3. Risteyên kompleks ku hevokên tamamker ên lêkera vegotinê di wan da hene	62
3.2.3.1. Hevokên tamamker ku lêkera vegotinê ya veguhestina rasterast di wan da hene	63
3.2.3.2. Hevokên tamamker ku lêkera vegotinê ya veguhastina nerasterast di wan da hene	65
3.2.4. Hevokên tamamker ku lêkerên modal di wan da hene	67
3.2.5. Hevokên tamamker ku lêkerên manîpulatif di wan da hene	70
3.3. Risteyên Kompleks ku Hevokên Navberî di Wan da Hene	73
3.4. Risteyên Kompleks ku ji Hevokên Hevseng Pêk Tên	73
3.5. Risteyên Kompleks ku Hevokên Pêwendîyê di Wan da Hene	76
3.6. Risteyên Kompleks ku Lêkerên Espektîf di Wan da Hene	80
ENCAM.....	81
ÇAVKANÎ.....	83

DESTPÊK

Ev xebat di derbareyê risteyên kompleks yên Bazeberê da ye. Xebat li ser risteyên kompleks û teknîka pêkhatina wan e ku cureyên hevokan navgînîyê wê dikin. Di kurdîya kurmancî da bi giştgirî û li ser bingeheka modern xebatên rêzimanê gelekî kêr in û hevterîba wê xebatên li ser risteyên kompleks jî di heman rewşê da ne. Ji ber hindê me xwast ku di vî warî da bi navgînîya xebata me sûdewerîyek pêk were. Lewma me bala xwe da çavkanîyên berdest ên di warê risteyên kompleks da û risteyên xwe yên nimûne bi giranî ji *Bazeberê* piştra jî ji kitêbeka folklorîk *Senem Xanim* û kitêbeka ji çîrokên modern pêkhatî *Xanima Kozê* wergirt. Me pêşîyê xwast ku cudahîya riste û hevokê dîyar bikin lewra di gelek kitêbên rêzimanê da li şûna hev tîr emilandin. Ji ber ku çavkanîyên me yên sereke ji bo peyva “sentence” riste û ji bo “clause” jî hevok bi kar anîbû ji bo bergirîya kêşeyan û zimanekî terminolojîk ê standart me jî bi heman hûrgilîyê xebata xwe dewam kir. Paşê me ji alîyê avasazîya wan, pênaseya cureyên riste û hevokan kir. Asoxî jî me berê pirsên xwe da mijara xwe ya esasî risteyên kompleks û şêweyên pêkhatina wan.

Mebest, Mijar û Giringîya Tezê

Heta serdema 20. di edebîyata kurdî ya kurmancî da qîyas bi berhemên menzûm xebatên peşanê kêmtir in. Di sedsala 17. da Elîyê Teremaxî bi kurdîya kurmancî bi navê “Serfa Kurmancî” bi peşankî kitêbek nivîsîye ku herçend mijara wê li ser morfolojîya erebî û farisî be jî carcaran rêzikên rêzimana kurmancî jî vegotîye. Di

sedsala 18. da Melayê Erwasî bi pexşankî li ser tiba gelêrî berhemek nivîsîyê ku di nav gel da wekî “Tiba Melayê Erwasî” tê nasîn. Di sedsala 19. da Mela Mehmûdê Bazîd

hevkarê Aleksander Jaba bi pexşankî “Adat û Rusumatnameyê Tewayîfê Ekradîye”, “Tewarîxê Cedîdê Kurdistan”, “Cami’iyê Risaleyên û Hikayetan”, “Mem û Zîn” nivîsîye. Dema em bala xwe didin ev her sê nivîskaran em dibînin ku her sê jî ji herêma Serhedê ne lê herçend Serhedî bin ji ber ku di wê heyamê da devoka Botî di warê nivîsê da serdesttir bûye karîgerîya devoka Botî jî li ser zimanê wan zal bûye. Herçend Devoka Botî û Behdînî hevsînor bin jî cudahîyên morfolojîk û fonolojîk digel hev dihewînin. Herwiha li ser berhema Eliyê Teremaxî tezeka mastirê, li ser berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî “Cami’iyê Risaleyên û Hikayetan” û “Adat û Rusumatnameyê Tewayîfê Ekradîye” tezên mastirê hatine kirin. Ji ber wê me xwast em li ser berhemeka pexşankî ya sedsalan 20. û wekî herêm, herêma Behdînan bixebitin. Lewma me Bazebera Mela Se’îd Şemdînanî ji bo xebata xwe bijart. Yek ji sedema bijartina me ew bû ku heta niha xebateka ristesazîyê xasma risteyên kompleks li ser vê berhema navhatî nehatiye kirin. Sedema me ya duyem jî rewanbêjîya Mela Se’îd Şemdînanî û bikaranîna wî ya risteyên kompleks e ku di temamê Bazeberê da rewanbêjî û risteyên kompleks hêmaneka gellekî berbiçav e.

Mijara xebata me “Risteyên Kompleks di Bazeberê da” ye. Xebata me weke ku ji navê wê jî dîyar e li ser risteyên kompleks e û wekî qada xebatê jî ji xwe ra berhema Mela Se’îd a bi navê Bazeberê bijartîye. Giringîya mijara me duşaxî ye. Yek jê kêmbûna xebatên ristesazîyê ye û hevterîba wê xebatên risteyên kompleks e, ya dinê jî xebateka pexşanî ye ku teqrîbên di navbera salên 1916-1918an da hatiye nivîsîn û di warê risteyên kompleks da gellek nimûneyan dihewîne.

Sînora û Çarçoveya Tezê

Sînora vê xebatê ji risteyên kompleks pêk tê lê ji ber ku risteyên kompleks bi navgînîya cureyên hevokan pêk tên ew jî daxilî nav sînorên xebatê bûne. Herwiha ji bo

têgihîştina risteyên kompleks bi awayekî giştî baldarî ji bo ristesazîyê jî pêk hatîye. Herwiha ji bo ku nîvenda xebata me li ser Bazeberê ye zimanê xebata me jî bi kurdîya kurmancî ye û cudahîya devoka zimanê berhemê û zimanê standart jî bûye beşek xebata me.

Rêbaza Lêkolînê

Vê xebatê bi nerîneka tîpolojîk hatîye amadekirin. Nerîna tîpolojîk rêzikên giştî ji bo zimanan napejirîne û her zimanekî bi xweserîya wî dinirxîne. Herçend rêzimana hemû zimanan li gorî hin qaîdeyan saz bibe jî her zimanek qaîdeyên xwe hene û lazim e li gorî wan qaîdeyan mijarên rêzimanan wê were danîn. Herwiha vê xebatê bi rêbaza monografîk jî hatiye amadekirin û ji ber divêtiya monografîk mijar bi qasî ku pêkan be û bi derfetdayîna çavkanîyên berdest bi kurahî hatiye lêkolîn.

Dijwarîyên Lêkolînê

Dijwarîya sereke ya ku di her warî da em tûşî wê tên bêguman kêmbûna xebatên li ser ristesazîyê bi taybetî avasazîya risteyên kompleks e. Kêşeya standartbûna kurdîya kurmancî ji ber ku di termînolojîya rêzimanî da jî heye tevlihevîyek çê dibe. Gelek mijar hene ku bi sernavên cuda di berhemên cuda da hatine vegêran. Vê rewşê carina dike ku heman mijar ji ber sernavên cuda wekî mijarên cuda were famkirin. Ji bo ku kêm zêde em tevdira vê tevlihevîyê bikin me di nava metnê da hem navên sernavan bi îngilîzî û kurdîya soranî dan hem jî hevmanaya wan dest nîşan kir. Herwiha ji ber ku xebat xwastîye bi awayekî modern tesnîfa mijaran bike çavkanîyên herî bi kêrhatî bi zimanê bîyanî, ingilîzî ne. Herçend bi qasî zanîna xwe me ji ingilîzî sûd wergirtibe û çendek berhemên soranî bûbin çavkanîyên sereke jî kêmasîya kevneşopîyeka rêzimanî karê me diwartir kirîye.

Çavkanîyên Tezê

Rêzimana Celadet Bedirxan û Roger Lescot cara pêşî li ser risteyên kompleks hin agahî daye lê bi kurahî mijar ron nekirine û destnîşan kirine ku ronkirina risteyên kompleks yê kurdîya kurmancî pir zehmet e heta ne gengaz e. Agahîyên heyî bi me dide zanîn ku di kurdîya kurmancî da bi awayekî berfireh cara pêşî İbrahim Seydo Aydogan di berhema xwe ya ***Guman-1*** da bi navê ***Hevokên kompleks*** mijara risteyên kompleks ron û dabêş kirîye. Xebata herî berfireh ku di hemû teza xwe da me sûd jê wergirtîye teza doktorayê ya Mîkaîl Bülbül ya bi navê ***Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêzîya Wan*** e. Di vê xebatê da bi awayekî modern ristesazîya kurdî hatîye polînkirin û ji alîyê standarkirina têgihan hewlek hatîye dayîn. Kitêba Ba'îz 'Umer Ehmed ya kurmancîya behdînî ***Riste ji Layê Pêkhatinê ve Di Dayalêkta Serî ya Zimanê Kurdî da Govera Badinî***, kitêbên bi kurdîya soranî ya Kurdistan Mukrîyanî ***Sîntaksî Ristey Têkel***, ya Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw ***Ristesazî***, ya Sacîde 'Ebdulla Ferhadî ***Hendê Layenî Ristesazî Zimanê Kurdî*** ji bo xebata me wekî çavkanîyên sereke cî girtine.

1. ÇARÇOVEYA TEORÎK Û TÊGEHÊN SEREKE

1.1. Ristesazî

Syntax anku ristesazî ji du gotinên yûnanî pêk tê: syn û tactics. Syn manaya “bi hevra, pevra” didêre, tactics jî manaya saz kirin, dirist kirin û ava kirinê didêre (‘Ebdulla Ferhadî, 2013: 4). Ristesazî anku zanista risteyê wekî bineşaxeka zimannasîyê pêkhatina riste û hevokan vedikole û têkilîya navbera riste û hevokan û pêkhate û yekîneyên mîna ravekê, biker, lêker û berkarê, risteyan ji aliyê mana, armanc û avasazîya ve û cureyên hevokan dipolîne. Xebatên ristesazîyê, navgînîya zimanekî têkûz dike. Ristesazî sînorê teşeya avakirina risteyan danayne, bîleksê wê sînorên hişk an vezelokî yên ku zimanekî ji bo avanîya risteyan ji xwe ra danîye destnîşan dike. Tîpolojîya risteyan jî herweha beşeka ristesazîyê ye û tîpolojî zimaman li gorî ristina biker, berkar û lêkerê dabeş dike. Kurdî li gorî vê dabeşê zimanekî SOV anku risteyeka kurdî bi rêza biker (subject), berkar (object) û lêkerê (verb) saz dibe (Bülbul, 2017: 7). Ji ber ku di her zimanî da pergala rêzkirina peyvên û hêmanan resen e û ji bo ku vegotina hest û raman bê kêmasî bîn ziman, lazim e peyv û komepeyv li gorî rê û rêbazên rêzimanî bîn rêzkirin (Ornek, 2022: 51).

1.2. Riste

Riste anku sentence yekîneya herî mezin û serbixwe ya rêzimanê ye. Her derbirineka serbixwe ji aliyê rêzimanê ve dibe riste û ji bo şirovekirina her risteyekê giring e riste ji rola xwe neyê veqetandin lewra her risteyek di nav rola xwe da tenê şirovekirinek xwe heye (‘Umer Ehmed, 2012:41). Riste ji peyv û komepeyvên ku hest, raman, rewş û bûyerekê li gorî pergalekî û bi awayekî hûnandî radigihînin pêk tê. Herwiha vegotina hestan û ramanan bi risteyan tîn ziman(Ornek, 2022: 37). Ew bi herfeka mezin dest pê dike û bi xalekê yan bi pirsnîşan yan jî bangnîşanekê bi dawî dibe. Riste ji reha dema borî ya peyva ristinê û paşgira -e`yê hatiye dariştin ku manaya ferhengî ya peyva ristinê durist kirin û rêz kirin e. Riste ku bi awayekî adetî pênaseya wê

tê kirin ji hevokekê yan du û zêdetir hevokan pêk tê û ji gotineka ku biker û lêkerekê dihewîne û his û ramaneka t êkûz derdibe, saz dibe (Bûlbûl, 2017: 63). Wate riste mezintirîn yekeya zimanî ye ku dişê ji gireya navî û gireya karî pêk bê (Jabar Abozaid, 2018: 56).

1.3. Cureyên Risteyan

1.3.1. Riste ji alîyê armancê ve

1.3.1.1. Risteya ragihandinê

Risteyên ragihandinê anku declarative sentence rûdan, tevger, nêrîn û rastîyekê yan jî karekî radigihînin yan jî destnîşan dikin. Di vê cure risteyê da axêver xwe wekî şahid nîşan dide û cextê li ser agahîyê yan gotinê dike ku guhdar jê dilniya bin ('Ebdulla Ferhadî, 2013: 47). Rewşa van risteyan dibe ku erênî yan jî neyînî be.

1. Derkete etege Qirêjdaxê bala xwe day li ser mile rastê mêze kir tek konekî li dere hanêkî danîye (Akyol, 2000: 54).
2. Ez gîhaştim devê deriyî ku dengê dêya min û bavoyî tê (Karahana, 2005: 68).
3. Gurgî ji xeflet xo hawête ser pişta gayê sor, leqek dana pişta stukira gay (Şemdînanî, 2021: 65).
4. Ez tenegeştim te çi got (Şemdînanî, 2021: 66).

Dema em bala xwe didin mînakên xwe yê jor em dibînin ku her lêkerek an jî pêveberek bizavekê radigihîne yan jî destnîşan dike. Di mînaka me ya (1, 2, 3, 4.)ê da lêkerên wekî *derkete*, *bala xwe day*, *mêze kir*, *danîye*, *gîhaştim*, *xo hawête*, *leqek dana*, *tenegeştim* her yek ji wan rûdan yan jî bizavekê radigihînin me.

Risteyên ragihandinê dibe ku ji alîyê teşeyê ve neyînî, lê ji alîyê manayê ve erênî bin (Kan Yukuş, 2017: 66).

5. Hung herdu dizanin ku li nik min kesek nîye wekî hingo mu'teber û emîn. (Şemdînanî, 2021: 222).

Di vê mînak me ya (5.)ê da riste bi teşeya xwe neyînî ye, dema em bala xwe didin vê pêkhêna risteyê *Hung herdu dizanin ku li nik min kesek nîye* bi hêsanî tê famkirin ku riste neyînî ye li ji dewama risteyê *wekî hingo mu'teber û emîn* ku qîyasekê dike tê famkirin ku riste bi manaya xwe erênîyê û bi vî awayî bizava risteyê diguherîne.

1.3.1.2. Risteya pirsyarî

Risteyên pirsyarî anku interrogative sentence ew cure riste ne ku pirsyarekê çê dikin. Risteyên pirsyarî bi navgînîya cihnav, hevalnav, daçek û hokerekê saz dibin. Herweha risteyên pirsyarî bi guvaşa li ser gotinê jî pêk tên û bi vî rengî cudahîya wan ji risteyên erênî çê dibin (Malmîsanij, 2015: 287). Mebest ji pirsyarîyê bidestxistina zanyarîyêkê ye ji ber wê guhdar berê xwe dide çavkanîya pirsê anku qisekar ('Ebdulla Ferhadî, 2013: 47). Herweha bi peyvên mîna xêr e, gelo, ma, ka, kengî, çend, ma qey jî risteyên pirsyarîyê saz dibin.

1. Ma tu ji vê yeka hane re çî dibêjî, xanim? (Karahana, 2005: 40).
2. Xêr e ti ku da diçî? (Akyol, 2000: 112).
3. Hingo bo çî heta noke mala feqîran xirab kirîye bi xeberê pîr-û-pûç û duro? (Şemdînanî, 2021: 148).
4. Canebê mam rîwî çî emir difermûn? (Şemdînanî, 2021: 148).
5. Tu bi Xudê bo min rastî bêje ka tu kurê wî yî yan ne? (Şemdînanî, 2021: 69).

Mînakên me yê jorîn da yekser pirsyarek heye. Mînaka 1. bi daçeka *ma'yê* û hokera pirsyarîyê *çî'yê*, ya 2. bi qaliba *xêr e* û hokera *ku'yê*, ya 3. *bo çî* bi hokerê pirsyarîyê, ya 4. bi *çî'yê* rengdêra pirsyarîyê, ya 10. bi hokera pirsyarîyê *ka'yê* saz bûne.

1. Ma tu mar î ku bi axê bijîy? (Şemdînanî, 2021: 66).
2. Ma edî ez ji wan karan re dibim, Mûsa efendîîî? (Karahana, 2005: 38).
3. Ma ne wiha ye? (Karahana, 2005: 39).

Mînakên me yên jorîn da neyekser pirsyarek û daxwaza pesendê heye. Mînakên me yên **1, 2, 3**. bi daçeka *ma'yê* saz bûye, pirsyarekê bi daxwaza pesendê raber dike ku yê pirsyarî raber dike bi bersiva wê dizane.

1.3.1.3. Risteya fermanî

Risteyên fermanê anku imperative sentence ew cure riste ne ku ferman, hişyarî, şîret an daxwaza axêver destnîşan dikin. Di vê cure risteyê da axêver daxwazê jî kesekî duyem dike ku karekî bike yan helwestekê nîşan bide ('Ebdulla Ferhadî, 2013: 49). Risteyên fermanê dikarin erênî yan neyînî bin û bi xal û bangnîşanekê diqedin.

1. Ûlan Kerîm rê vî artistî bide bê mirov li vira çawa tevdigere! (Karahana, 2005: 17).
2. Divê hûn hemû bi linge çepê re bijmêrin û lingên we bi hev re rabin û dakevin! Temam? (Karahana, 2005: 16).
3. Hela çayekê bide min loo! (Karahana, 2005: 77).
4. Şêrî gote gurgî “ wan sêyane teqşîm ke , da bixoyn (Şemdînanî, 2021: 66).
5. Wê carê, madam we ye, zû be, kêjkekê bo min hawêje xarê da bixom, dilê min qahîm bibît, bişêm çiyay ragirim.” (Şemdînanî, 2021: 53).
6. Marî got, “me'lûmî cenabê hingo ye ez bêpê me, neşem li bazberî derbaz bim. Dibît cenabê mam rîwî himmet biket, bende derbaz ket (Şemdînanî, 2021: 51).

Wekî ji mînakên me jî dîyar in di risteyên **1, 2 û 4**. da ferman heye, di risteya **3**. û **6**. da daxwazek heye û mînaka **5**. da jî hişyarî û gef heye.

1.3.1.4. Risteya baneşanî

Risteya baneşanî anku exclamative sentence ew cure riste ye ku bi navgînîya wan, mirov hisên xwe yên mîna xemgînî, kêfxweşî, tirs, matmayîn û ecibandîne derdibin. Van cure risteyan rêbazek e ji bo bangkirin yan jî agahdarkirina kesekî 'Ebdulla (Ferhadî, 2013: 50). Herweha, gazîya ji bo agahdarîyê jî bi van cure risteyan pêk tên û ew bi baneşanekê diqedin.

1. Hemîyan pêkwe gotin, “aferîn! aferîn! bo re’ya Kak Şasuwar! (Şemdînanî, 2021: 91).

2. Tu tişteki min û wan di ber hev de nema ye! (Karahana, 2005: 39).

Wekî ji mînakên me yê jorê dixuyên mînaka 1. bi gotina *aferîn! aferîn!* kêfxweşiyekê û mînaka 2. xemgîniyê nîşan dide.

1.3.2. Riste ji aliyê avasaziyê ve

Di risteyekê da hejmarên lêkeran binyada risteyê ji aliyê sadebûn û kompleksiyê ve dabeş dike. Heger di risteyekê da tenê lêkerê hebe ew risteyeka sade anku xwerû ye û heger herî kê du lêker hebin ew riste wekî kompleks tê dabeşkirin (Bûlbûl, 2017: 97). Bi awayê dabeşiya klasîk risteyên kompleks wekî çar paran dihatine polînkirin: xwerû, kompleks, hevedudanî, hevedudanî û kompleks. Dema em bala xwe didine dabeşiya klasîk em dibînin ku risteyên hevedudanî û hevedudanî û kompleks ji ber ku herî kê li ser du lêkeran hatine saz kirin jixweberê divê di bin serenava risteyên kompleks da werin dabeşkirin. Lewma ji bo ku di dabeşiyê da tevîhevî çê nebe em dê rêbaza modern bibijêrin û ji aliyê avasaziyê xwe ve risteyan wekî du serenavan anku xwerû û kompleks dabeş bikin.

1.3.2.1. Risteyên xwerû

Risteyên xwerû yan jî “simple sentence” ew cure riste ne ku tenê ji darazekê pêk tên lewra hevokên alîkar nahewînin. Ji risteyên yekdarazî re risteyên xwerû tê gotin (Ornek, 2022: 65). Risteyên xwerû ku wekî risteyên sade jî tên binavkirin tenê karekî an bizavekê dihewînin (‘Ebdulla Ferhadî, 2013: 39). Risteya xwerû hew ji daneyekê tenê pêk tên (‘Umer Ehmed, 2012:42). Di kurmancî da risteyên xwerû du cure ne ku yek jê ji kirde û pêveberê pêk tê, ya dinê ji kirde, berkar û pêveberê (Malmîsanîj, 2015: 283) Pêvebera risteyên xwerû ji lêkerê yan jî ji navdêrekê pêk tê. Risteyên ku pêvebera wan navdêrî ne, ji yê ku lêkerî ne bêtir hêsan û sade ne (Bûlbûl, 2017: 63). Risteyên ku ji darazekê pêk tên û hevokên alîkar nahewînin û tene ji pêveber an lêker an jî ji navdêrekê pêk tên risteyên xwerû ne (Baran, 2012: 209).

1. Xwezî em biçwana odê (Akyol, 2000: 39).
2. Hundirê dikanê qelebalix bû (Karahana, 2005: 58).
3. Em jî di tahtîlan de diçûn gundî (Karahana, 2005: 63).
4. Her yekî xeberek got (Şemdînanî, 2021: 107).
5. Dîsa mîr cewab neda (Şemdînanî, 2021: 107).
6. Dostîniya wan helweşiyawe (Şemdînanî, 2021: 110).

Wekî ji mînakên me yên jorê jî xuya dikin, her risteyek li ser lêkerê tenê hatîye saz kirin anku her risteyek rûdan û bizavekê tenê didêre. Gotinên binê wan xêzkirî di risteya xwe da tekane lêker in û ji bilî wan tu lêker nînin.

1.3.2.2. Risteyên kompleks

Risteyên kompleks anku complex sentence ew cure riste ne ku ji du yan bêtir lêkerên kişandî pêk tînin. Risteyên kompleks ji risteyeka sereke û cureyeka hevokê yan jî ji çend cureyên hevokan pêk tînin ('Ebdulla Ferhadî, 2013: 43). Di risteyên kompleks da bi awayekî giştî du cure riste hene ku ji wan ra şariste û lariste tê gotin. Şariste wekî hevoka sereke tê zanîn û bi tena serê xwe tê bikaranîn û manayekê didêre. Lariste jî ku wekî pariste jî tê zanîn hevokeka nesereke ye lewra bi tena serê xwe nayên bikaranîn û di rola diyarkerîyê da ye bes bi navgîniya şaristeyê manayekê werdigire. (Xoşnaw, 2011: 35). Herweha dema du riste bi gihanekê wekî *û'yê*, yan *ku'yê* yan jî xal bendîyê bi hev werine bestin dîsa risteyeka kompleks pêk tînin. Risteyên kompleks ku wekî risteyên aloz yan têkel jî tînin zanîn ji bestina du yan zêdetir risteyan pêk tînin û bi piranî risteyên kompleks bi bestina cureyên hevokan tînin dariştin, yên mayî jî bi navgîniya gihaneka *û'yê* û *ku'yê* ku du risteyên xwerû pev dibestînin tînin dariştin.

Risteyeka kompleks bi rewşa xwe ya herî hêsan ji hinek hevokan pêk tînin ku ev hevok di nava rêzeka mantiqî da li pey hev tînin û bi awayekî obsiyonel bi gihanekan pev tînin bestin (Bedirhan&Lescot, 1990: 344).

Risteyên kompleks ew riste ne ku herî kêr ji darezeke bingehîn û du darêzên alîkar pêk tên ku mebest ji van risteyên ew e ku gotinên qiseker û gotinên rastewxwo di nav hev da tên bikaranîn (Yıldırım, 2012: 322).

Hevokên têkel bêtir malê zimanê nivîskî ne. Zimanê axiftinê bi giştî li ser qiseta sade ava ye, lew armanca serekî ya axiftinê û yê rojane qetandina danûstendinê ye bi regekî yekser û bêkêşe (Alan&Öpengin, 2014: 192). Risteyên kompleks herçend di axiftina jîyana rojane da bèn bikaranîn jî bêtir di zimanê nivîskî de zal in. Zimanê axaftinê ji ber ku di çarçoveya demeka tayinkirî û rûbirû tê bikaranîn axêver mebesta xwe bi awayekî sade û bi risteyên kin derdibin. Lê zimanê nivîsînê derfetê dide nivîsevan ku bikaribe mebesta xwe bi awayekî kompleks lê di heman demê da fambar derbibe lewra dê dema xwendevan hebe ku li nivîsê bêtir hûr bibe û têbigihêjê.

1. Wî rahîşt kursiya xwe ya ku rûyê wê ji qayîşa reş hûnandî bû û du caran di hundirê qahwexaneyê de çû û hat (Karahana, 2005: 80).
2. Min dixwast ez xwe dirêj bikim (Karahana, 2005: 13).
3. Keskî newêre ji xwa bi rêwîtî jî here (Akyol, 2000: 154).
4. De melûm e eva zemanê ku derbas bû sala mirina Huseyn qediya (Akyol, 2000: 63).
5. Gote xulaman, “herîn, hindek mewêjan bînin, nîwek birûh, nîwek bêrûh da hindekan ew mêwanene bixon û hindekan jî bo axayê Têlîyan bihinêrim şûndîharî.” (Şemdînanî, 2021: 93).
6. Em jî dê i’lamekî niwîsîn we muhr keyn, deyne deste Mam Silêman ku edî ji noke paş carekî dî ‘Ebbas de’wayê li Mam Silêman neket (Şemdînanî, 2021: 96).

Wekî ji mînakên me jî dîyar dibe di her risteyekê da herî kêr du lêker hene. Dema em bala xwe didin mînaka xwe ya 1. dibînin ku risteya me ya kompleks hem bi gihaneka û’yê hem jî bi ya ku’yê saz bûye û herwiha bi hevoka pêwendîyê *rûyê wê ji qayîşa reş hûnandî bû* kompleksîya vê risteyê dupat bûye. Mînak me ya 2. ji hevokeka sereke *Min dixwast* û nesereke *ez xwe dirêj bikim* pêk hatiye û tercîhen bingihanekek nehatiye bi kar anîn. Mînaka 3. ji hevokeka temamker a lêkera modal wêrîn’ê pêk hatiye ku *ji xwa bi rêwîtî jî here* hevoka temamker e *Keskî newêre* jî hevoka sereke ye û bi bestina wan risteyeka kompleks saz bûye. Mînaka 5. jî risteyeka kompleks e ku hem bi hevoka

hevseng saz bûye hem jî hevoka nesereke ya bi hokera armancî. *herîn, hindek mewêjan bînin, nîwek birûh, nîwek bêrûh da hindekan ew mêwanene bixon* risteyeka kompleks e bi hevoka nesereke ya bi hokera armancî ava bûye ku da bingihaneka wê ye herwiha mînaka me bi gihaneka *û'yê* hevokên hevseng ava bûye. Mînaka 6. da çendîn lêkerên weke *niwîsîn, muhr keyn, deyne, neket* hatine bikaranîn ku ev jî risteyeka kompleks pêk tîne.

1.4. Hevok

Hevok anku “clause” ku wekî “lariste”, “pariste”, “şiwênkewtû” jî hatiye binavkirin wate jê ew e ku ji komeka peyvan pêk tê, fikreke têkûz derdibe û xwediyê kirde û pêvebera xwe ye. Ji aliyê sentaksê ve roleka hevokê ya diyarkirî heye. Taybetîya wê ya xweser ew e dema ku bi cureyeka hevokê ra were bikaranîn risteyeka kompleks pêk tîne û dibe pêkhêneka risteyê (Mukrîyanî, 2003: 5). Cudahîya herî berbiçav ya hevokê ji risteyê ew e ku hevok dikare wekî navdêrekê, rengdêrekê û hokerekê tevbigere.

1. Wî deh baxnotê xwe yê ku berê hazir kiribû dirêjî beqçiyî kir (Karahana, 2005: 26).
2. Wî rahişt kursiya xwe ya ku rûyê wê ji qayişa reş hûnadî bû (Karahana, 2005: 80).

Di mînaka 1. da *Wî* biker e, *dirêjî beqçiyî kir* pêveber e, *deh baxnotê xwe yê ku bere hazir kiribû* bireser e. Wekî dixuyê bireser di vê risteyê da hevokeka pêwendiyê ye ku em dê piştra bi hûrgilî behsa wê bikin. Di esasê xwe da *deh baxnot* bireser e û ji aliyê hevoka pêwendiyê bi gotina *berê hazir kiribû* hatîye modîfîyekirin anku wesifandin û *ku* jî bingihanek e.

Di mînaka 2. da jî *Wî* biker e, *rahişt* pêveber e, *kursiya xwe ya ku rûyê wî ji qayişa reş hûnadî bû* bireser e. Di vê risteyê jî bireser ji hevokeka pêwendiyê pêk hatîye. Wekî mînaka (33)yê di esasê xwe da *kursiya xwe* bireser e û ji aliyê hevoka *rûyê wê ji qayişa reş hûnadî bû* hatîye wesifandin û herweha ku jî bingihanek e.

1.4.1. Cureyên hevokan

Cureyên hevokan di risteyên kompleks da roleke wan ya serekî heye ku bi rola xwe rola risteyê ron dike. Ji bo wê ye di dema behskirin û nîşandana risteyên kompleks da pêdivê pê heye ku ji bo rola wê em giringîyê bidinê. Cureyên hevokan ji aliyê pêkanîna sentaksî û ji aliyê manayê ve pabendê hevoka sereke ye (Mukrîyanî, 2003: 5). Bi binyada xwe hevok di risteyekê da li dorhêla taybetîya xwe wekî heft cureyan tî polînkirin.

1.4.1.1. Hevoka sereke

Hevoka sereke anku “hevoka bingehîn”, “laristeya bingehîn” yan jî “independent/main clause” wekî risteyeke xwerû ew e ku bi tena sere xwe manayekê didêre, bi tena serê xwe dikare were bikaranîn û bi biker û pêvebera xwe halekî bimentiq destnîşan dike (Hewa & Hamamorad, 2015:6). Dema hevoka sereke bi hevoka nesereke ra dibeste risteyeka kompleks pêk tînin û di vê risteya kompleks da lêkera hevoka sereke bi rola xwe mebesta risteyê derdibe:

1. Tu jî were, tobe bike da biçîne hecê (Şemdînanî, 2021: 60).

Wekî dixuye *Tu jî were, tobe bike* hevoka sereke ye, *da* bingihanek e *biçîne hecê* hevoka nesereke ye ku hevoka sereke ji aliyê armancê ve temam kirîye.

2. Ez edî heyirîm û betilim ku van nivînan bişom (Karahan, 2005: 48).

Wekî dixuye *Ez edî heyirîm û betilim* hevoka sereke ye, *ku* bingihanek e, *van nivînan bişom* hevoka nesereke ye ku hevoka sereke ji aliyê sedemê ve temam kirîye.

1.4.1.2. Hevoka nesereke

Hevoka nesereke anku subordinate clause ku wekî hevoka nebingehîn an jî laristeya bend tê zanîn ew cure hevok e ku bi tena sere xwe manayeke xwe tuneye û tu navdêrekê modîfiye nakin. Hevoka nesereke bi navgîniya bingihanekê re hevoka sereke

dinasîne û ji alîye hokera armancê, şertê, demê, dijberîyê, rewşê û sedemê ve wê têkûz dike (Bûlbûl, 2019: 263).

1. Dibît cenabê mîr bo me her yekî şolekê dîhar ket, da her yêk meşxûlî xizmeta xo bît (Şemdînanî, 2021: 64).

Wekî ji risteyê dixuye *Dibît cenabê mîr bo me her yekî şolekê dîhar ket* hevoka sereke ye, *da* bingihanek e, *her yêk meşxûlî xizmeta xo bît* jî hevoka nesereke ye ku hevoka sereke ji alîyê armancê ve dirist dike.

1.4.1.3. Hevoka hevseng

Du hevokên ji hev cuda ku bi gihanekekê yan jî bi xalbandîyekî bi hevdû werin bestin jê re hevoka hevseng anku coordinate clause tê gotin. Bi navên wekî hevoka serbixwe û laristeya serbixwe tê zanîn. Piranî bi gihankên *mîna û, lê, ne ...ne .., ya .. ya ..* çê dibin yan jî bi bêhnokekê li pey hev rêz dibin. Herdu hevokên ku bi gihanekekê hatine bestin manadar in û dikarin bi tena serê xwe manayekê bidin ji ber wê li dorhêla vê pêbestê herdu hevok jî ji alîyê rêza xwe ve wekî hev giring in (Bûlbûl, 2019: 267). Ji bo mînak:

1. Dibêjin ximdarek hebû, şeş-hew mirîşkê qelew hebûn (Şemdînanî, 2021: 56).

Wekî dixuye hevoka *dibêjin ximdarek hebû û şeş-hew mirîşkê qelew hebûn* du hevokên serbixwe ne û bi bêhnokekê jî hev hatine cudakirin.

2. Rastî di her babekî da meqbûl e, cuwan e (Şemdînanî, 2021: 52).

Di vê risteyê da du pêveberên cuda *meqbûl e û cuwan e* bi bêhnokekê jî hev hatine cudakirin û *Rastî di her babekî da* bikera wan ya hevpar e.

3. Roja dinê bavê min çû bajêr, lê min nikarîbû li dêya xwe binêriya (Karahana, 2005: 66).

Di vê risteyê da du hevok hene, yek jê *Roja dinê bavê min çû bajêr* û ya dine *min nikarîbû li dêya xwe binêriya*. Herdû hevok bi gihaneka *lê'yê* hatine beştin lê ji alîye manaye xwe jî hev cuda ne, her yek amaje bi rûdanekê dike.

Hevokên hevseng carcaran di forma hevokên navberî anku paranthetical clause da jî saz bibin. Hevokên navberî ew cure hevok in ku risteyê rave dikin. (Bülbül, 2019: 267). Dema ku ji risteyên tên cudakirin manaya risteyê naguhere. Hevokên navberî bi cotebêhnokê yan jî bi xêzika axaftinê tê nasîn. Hevokên navberî cureyek hevokên hevseng in. Di çavkanîyên berdestê me da mînak ji bo hevokên navberî nehatîye peyda kirin.

1.4.1.4. Hevoka pêwendîyê

Hevoka pêwendîyê anku relative clause ew hevok e ku bi navgînîya bingihaneka ku'yê hêmaneka risteyê yê mîna biker, bireser û hokerê modîfiye dike. Hevoka pêwendîyê serbêjeya risteyê dişayesîne û bi navgînîya bingihaneka ku'yê têkilîyekê di navbera serbêje û hevokê da datîne. Dema em behsa kesekî yan tiştekî dikin piranî em dixwazin bêtir di derbareyê wan da agahîyan bidin ku rêbazeka wê jî ew e ku em hevoka pêwendîyê bi kar bînin ji ber hindê jî hevokên pêwendîyê di nava risteyê da li pey kes yan tiştê behskirî tên û wekî fonksîyona rêngdêran tevdigerin (Collins, 2011: 674). Yek ji taybetîyên hevokên pêwendîyê ew e ku bi navgînîya wan risteyên kompleks saz dibin.

1. Bi gotina wî re, reşika çavên wî ku mîna du zeytûnê xirxalî bûn, dikira ji nav sere wî bazbidana (Karahan, 2005: 77).

Di vê risteyê da *reşika çavên wî* bireser e, *ku* bingihanek e, *mîna du zeytûnê xirxalî bûn* hevoka pêwendîyê ye û bireserê diwesifîne, *dikira ji nava serî wî baz bidana* jî pêveber e.

2. Dîtin qele-belekek, ku dibêjinê keşkele, li ser darekê (Şemdînanî, 2021: 52).

Di mînaka me ya (1.b)yê da *Dîtin* pêveber e, *qele-belekek bireser e, ku* bingihanek e, *dibêjinê keşkele* hevoka pêwendîyê ye ku bireserê diwesifîne û li ser darekê jî berkara nerasterast ya cihî ye.

3. Dîtin soneyek di gomê da melewanîyê diket (Şemdînanî, 2021: 58).

Di vê risteya kompleks da *Dîtin* pêveber e, *soneyek* berkar e, *di gomê da melewanîyê diket* hevoka pêwendîyê ye ku berkarê diwesifîne. Herweha tercihen bingihanekek nehatîye bi kar anîn.

1.4.1.5.Hevoka navdêrî

Hevoka navdêrî anku noun clause ew cure hevok in ku xwedîyê roleke taybet in û di risteyê da bi rewşa xwe ya navdêrî wekî hevokeke nesereke tê pênasîn. Hevoka navdêrî dikare bibe biker ya jî bireser (Şerif, 2003:549).

1. Berfa pêşî bû ku îsal dibariya(Karahan, 2005: 47).

2. Rîwî yeqîn kir ku edî dirêj kirin fayde nîye (Şemdînanî, 2021: 54).

Mînaka me ya 1. ji sê hêmanan pêk hatîye: *berfa pêşî bû* bi temamî pêveber e, *ku* bingihaneke ku herdû hêman pev girê daye, *îsal dibariya* bireser e lê di heman demê da hevokeke navdêrîye jî. Mînaka me ya 2. Jî hevokeke navdêrî dihewîne. *Rîwî* biker e, *yeqîn kir* pêveber e, *ku* bingihanek e, *edî* hoker e, û *dirêj kirin fayde nîye* jî bireser e lê di heman demê da hevokeke navdêrî ye jî.

1.4.1.6.Hevoka temamker

Hevokên temamker yan jî complement clasuse ew cure hevok in ku risteyê dinasîne û ji alîye manayê ve wê têkûz dike (Bülbul, 2019: 264). Cudahîya wê ji hevoka nesereke ew e ku hevoka nesereke hevoka sereke têkûz dike lê hevoka temamker hêmanaka risteyê wekî mînak bireserê têkûz dike. Herweha cudahîya hevoka temamker ji ya pêwendîyê ew e ku hevoka temamker di risteyekê da rola pêkhênaka risteyê werdigire lê hevoka pêwendîyê pêkhênaka risteyê diwesifîne.

1. *Rîwî ku zanî mar micit e* (Şemdînanî, 2021: 51).

Di vê risteyê da *Rîwî* biker e, *ku* bingihanek e *zanî* pêveber e, *mar micit e* hevoka temamker e ku rola berkarê da ye.

2. Digêrinewe kotrekê hêlîna xo di çiyayekî bilind da çêkiribû (Şemdînanî, 2021: 53).

Di vê mînakê da *Digêrinewe* pêveber e, *kotrekê hêlîna xo di çiyayekî bilind da çêkiribû* jî hevokeka temamker e û bi peywira berkarê ye. Herweha tercîhen bingihanekek nehatîye bikaranîn.

2. JÎYAN, BERHEM Û REWANBÊJÎYA MELA SE'ÎD ŞEMDÎNANÎ

2.1. Jîyana Mela Se'îd Şemdînanî

Mela Se'îdê Şemdînanî şexsiyetekî nayab lê kêmnaskirî ye di edebîyat û tarîxa kurdî da û digel wê ji ber ku jîyan û berhemên Mela Se'îd têra xwe nebûne mijara lêkolînê agahiyên derheqê wî da pir kêmtên peyda kirin. Mela Se'îd çendîn wechên xwe hene ku di serdema xwe da bi gelek rol û wazîfeyan rabûye. Li medreseyê dersdar, li nik giregirên civakê rawêjkar û hevkarê kurdologê bernîyas Bazîl Nîkîtînî bûye.

Mela Se'îdê Şemdînanî ku xwe bi navên cuda yê weke Mela Se'îdê Kurdistanî, Mela Se'îdê Herkî Binecî, Mela Se'îdê Bêdawî û Qazîyê Kurdîstanê dide nasîn di berhema xwe ya bi navê Tarîx-ê Kurdistan da ku bi farisî nivîsîyê li ser xwe weha dibêje:

Bende-ê heqîr qazî-ê Kordestan Mela Se'îd ke ez Herkî Binecî est ve der Tekye-ê Nehrî merkez-ê qeza-ê Şemdînan moddet-ê deh sal der tekye-ê Şêx Muhemmed Sidîq ve pesereş Seyîd Teha meşxûl be tedris bûd (...) (Tarîx-ê Kurdistan) (Şemdînanî 2021: 16).

Wate jê: Ez bendeyê cenabê we Qazîyê Kurdîstanê Mela Se'îd ji eşîreta Herkîyên Binecî me û li dewra şexîtiya Şêx Muhemmed Sidîq û kurê wî Seyîd Teha li Tekyeya Nehrîyê ku li navçeya Şemzînanê bûye ez bi qasî deh salan li wira dersdar bûme.

Bi navgîniya xebatên Bazîl Nîkîtîn (1994: 337, 377, 379). û Ergin Opengîn (2021: 16, 17, 18, 19, 20, 21). em xwe digihînin agahiyên derbarê jîyan û şexsiyeta Mela Se'îd. Navê bavê Mela Se'îd, Mela Abdullah e ku dibêje bavê min Qazîyê Herkî û Gerdîyan e ku ev her dû eşîret li devera Şemzînanê gelekî xurt û serdest bûne. Mela li nahîyeya Gerdîyê ya bi ser Şemzînanê ve teqrîben li derdora salên 1875-1880an hatîye dinyayê. Herçend xebatên ku ji bo navê wî hatîye kirin bi me dide agihîn ku Mela ji eşîreta Herkî ji malbata Bêdawî ye di nav şecereya malbata Bêdawî ya ku hêj şênîyên Şemzînanê tu melûmat derbarê wî da ne berdest in (Opengîn, 2021: 16).

Ergîn Oengîn ku bi berfirehî li ser jîyana Mela se'îd xebitîye sedema nebûna vê agahîyê weha derdibe:

Yek jî ihtimalan ew e ku Mela Se'îd çu zurrîyet li dû xwe nehêlan, lewma jî navê wî nehate veguhastin; ihtimala din jî ew e ku malbata wî li Êrmîyeyê ma û têkiliya wan ligel binemala Bêdawî qût bû ku jixwe tê zanîn ku beşek ji vê binemalê li Êrmîyeyê ne. (Şemdînanî 2021: 17).

Ji serpehatî û çîrok û meselokên ku ji bo xatirê Bazîl Nîkîtînî berhev kiriye û veguheztîye dixuye ku Mela Se'îd li başûrê Kurdistanê jî qederekî baş maye. Mela Se'îd li Hewlêrê li nik melayekî ku navê wî Ebû Bekîr Efendî ye xwendina xwe kuta kirîye. Dema şhadetnameya xwe werdigire şûnde teqrîben di salên 1902-1904an da vedigere Şemzînanê medreseya Nehrîyê û li wira dibe miderris (Opengîn, 2021: 17).

Mela Se'îd dema ku fetwaya cîhadê ya padişahê Osmanî bi cih nayne bi şûn da ji neçarî diçe Êrmîyeyê. Herweha ne ew tenê nêzî du hezar kurdên Nawçîya anku Şemdînanê li Êrmîyeyê hebûne ku ew jî ji ber pêkutîya Osmanîyan revîyane wira û pena ji dewlata Rûs xwastine. Mela Se'îd xwe û hemşarên xwe wekî felekzede û talankirî bi nav dike (Opengîn, 2021: 18, 19).

Ji ber rûdaneka nedîyar di hezîrana 1918 da Mela Se'îd bi deste merivên xwe tê kuştin. Li ser vê rûdanê ne Bazîl Nîkîtînî agahîyekê dide ne jî heya niha li ser sebebê kuştina wî agahîyek hatîye bi dest xistin.

2.1.1. Raman û cîhanbînîya Mela Se'îd Şemdînanî

Dema ku em bala xwe didin xîretkêşî û cîhanbînîya Mela Se'îd em dibînin ku millet û dînperwerîya wî digel hev, di nava xelekekê da têkelî hev bûne û biryar û şel û şewaza wî li derdora van du mefhûmên navhatî çerx bûye.

Di zemanê Mela Sê'îd da şahînsahîya Osmanî li zêdepara Kurdistanê serwer bûne. Ji ber ku ji alîye sîyasî ve Osmanî desthilatîya mîrên kurdan têkbirîye û wan ji mîrnişînîya wan nefî kirîye valahîya deshilatîyê demildest ketîye deste terîqet, serokeşîr, beg û axayên kurdan lê bi şertê ku razîbûna dewleta Osmanî hergav pêşînî be.

Milmilaneya şêxên terîqetan, pevçûn û şerên xedar yên eşîran, hesab û kîtabên beg û axayan hergav kirîye ku rewşeke kambax li Kurdistanê li dar be. Osmanî pirî caran weke meseleyek navxweyî li vê rewşê temaşe kirine lê dema ku nîşaneya zerarê ji bo dewletê xuya kiribe tavlê sihêtî lê kirîye.

Ji ber ku Mela Se'îd hergav çavdêriya vê rewşê kirîye li ba xwe daye dû hin çareyan û bi djiberana fikra xwe derbirîye û digel wê jî helwesta xwe nîşan daye. Di sala 1914an di heyna Şerê Cîhanê yê Yekê da dema Siltan Mehmed Reşad li dijî dewletên îtilafê bi deste şêxulîslamê wê demê fetwaya cihada miqeddes deranî û li hemû mizgeftan da daye xwendin wateyek jê ew bû ku hemû cihû û nestûriyên ku li tev kurdan dijîn ji ber hikmê fetwaya cîhadê bibin qurbanîyên sirgûn û kuştinê. Ji ber hindê Mela Se'îd ji bo xatirê hevvelatîyê xwe yên cihû û nestûrî bi şid li dijî vê fetwaya cîhadê kar vedaye. Li pey vê helwesta wî di sala 1915an da hatîye girtin û bi deste qeymeqamê Şemzînanê hatîye darazdan.

Bazîl Nîkîtînî di kitêba xwe da dibêje ku dema cîhad hate îlankirin Mela Se'îd yek ji wan ronakbîrên kurd bû ku guh nedêra banga cîhadê miqeddes ya ku li nik wan ev fetwa fetwayeka nelirê bû (Nikitin, 1994: 379). Amadekarê kitêba Bazeberê Ergîn Öpengîn dibêje ku di nava belgeyên ku Mela Se'îd ji bo xatirê Bazîl Nîkîtînî amade kirîye weke belge parastinek bi vî rengî nîne ihtîmalen Bazîl Nîkîtînî li hember vê parastina Mela ya li dijî fetwayê wî bi xwe ji deve Mela not kirîye û wergerandîye frensî. Heçî kurmançiya wê jî li dorhêla şewaza Mela Se'îd, Ergîn Öpengîn bi xwe danîye (Şemdînanî 2021: 18). Mela Se'îd di mehkemeyê da xwe weha parastîye:

Ferzen ku min fitwa (li dijî cîhadê) dan, ez ne li ber şerî'etê ne jî li ber qanûnê mesûl nînim. Ji ber ku min qet nedîtiye ku di şerî'eta me da bibêjît mirovê bêzerer û bêguneh bikujin. Herwisa, qanûna dewletê jî heta noke emr nekiriye ku mirovan qetl biken; berevajî vê, ew jî bo parastin û çavdêrikirina heqan hatîye danan... Herçî tetbîqkirina fitwayê û iradeyê ye, baweriya min ew e ku mexfîret û ilmê Şêxulîslamî her wekî edalet û merhemeta Xelîfeyî gelek gelek dûr in ji wê hindê ku fitwa û fermana qetl û talana re'îyetan (mesîhiyên nestûrî) biden, ku ji zemanê Mihemed pêxember heta noke dest nedane çekan û şer nekirine. (Şemdînanî 2021: 18).

Wekû ku dixuye Mela Se'îd li dijî fetwaya cîhada miqedes bi piştrastane fetwaya xwe daye û li hember şerî'eta Osmanîyan şerî'eta xwe danîye ku gotîye di şerî'eta me da xusûsek bi vî rengî nîne ku însanên bêguneh û bûsûc werin kuştin. Herweha fetwaya cîhadê li dijî hebûna esasê dewletbûnê ditîye û vê fetwayê dûrî û bileksê zanîn û dilovanîya şêxulîslamî û dadwerîya siltan bi nav kiriye (Opengîn, 2021: 18, 19).

Herçend Mela Se'îd xwe bi vî rengî parastîye jî mehkemeyê dîsan jî cezaya hepsê lê birîye û Mela ji bo Mûsilê bi rê kirine. Di rê da alîgir û merivên Mela wî ji deste leşkeran rizgir kirine li pey wê jî Mela revîyaye çûye Êrmîyeyê ku di bin serwerîya Îranê da bûye. Wî zemanî bajarê Êrmîyeyê penahgehek bûye ji bona sirgunîyan. Herweha konsulxaneyê Rusyayê jî li Êrmîyeyê hebûye ku Bazîl Nîkîtîn sefirê wê bûye û bi hatina Mela Se'îd hevaltî û hevkarîya wan dest pê kirîye (Opengîn, 2016: 5-9).

2.1.2. Baldarîya Mela Se'îd Şemdînanî ji bo çapgêrîya kurdî

Mela Se'îd bi baldarî qewamên nava Kurdistan dişopand bes ne yê Kurdistanê yê derveyî wê, bajarê weke Stembolê ku paytexta Dewleta Osmanîyan bû û gelek Kurd lê niştecih bûbûn. Bi îlana Meşrûtiyeta Duyem kurdên li Stembolê yê xwende û bijare xwastin ji derfetên wê sûdê werbigirin. Malbatên mezin û giregir yê weke Bedirxanî, Baban û Nehrî hem ji alîye sîyasî ve hem jî ji alîye çandî ve serkêşîya vî karî dikir. Kurdên wê serdemê yê xwedanray tedbîra xwe kirin û kovarek bi navê Hetawî Kurd bi deste wan hate avakirin ku rêveberê wê Hemzayê Mîksî û xwedî û berpîrsê wê Ebdulêzîzê Babanzade bû. Lê ji ber ku dubirî kete navbera peyayên Bedirxanî û Nehrîyan dewleta Osmanî vê dubirîyê kirin hincet da ku weşana kovarê qut bikin. Mîlîlaneya Bedirxanî û Nehrîyan ew bû ku temsîliyeta kurdan di dest wan da be û bi saya wê jî statuyekê bi dest bixin. Bedirxanî daw dikirin ku ji berê da yê mezin û rêvebir ew bûne, ji ber wê jî siberoj divê reîsê statuyê ew bin lewra Şêx Ebdulqadirê Nehrî ji kal û bavan ve ye bi karen dînî û ruhanî ve rabûne ji ber hinde wezîfeya wan îrşad û şêxîti ye, kare sîyasî nîne. Merivên Şêx Ebdulqadirê Nehrî jî nerazîbûna xwe

nîşan dane bi delîla ku malbata Nehrî seyîd in, Qureyşî ne, ji ber hinde gotine ew hêjatir in ji bo seroktîya giştî û Bedirxanî bes ji bo seroktîya leşkeri guncav in.

Bi qewlê Mela Se'îd "*hêştta wan tow neçandibû, li ser teqşîma hasilatî bi şer hatin*" Şemdînanî 2021: 224). Talî ev her dû malbatên giregir li ser seroktîyê li hev nekirin û weha li wan hat ku gilîyên hev li dewleta Osmanî bikin da ku zora hev bibin. Lê hesabê wan li hev derneket û Osmanî bi vê minasebeta şerên wan ê navxweyî ew berteraf kirin. Mela Se'îd xemgînîya xwe ya ji bo vê meseleye bi zelalî nîşan dike û di Hekayêta Betal Kirina Xezata Hetawî Kurd da weha dibêje: "*Sefaheta millete wan bîye ewrekîreş, tarî, kewte ber hetawê, nehêla kurdan germ bibît û nehêla ronayî li çawêt wan bidet, man di sermaye w tarîyê da*" (Şemdînanî 2021: 225). Bi dîtina Mela Se'îd vê rewşê ji kêmaqilî û cehalete derbûye û lewma kêmaqilî û cehalet dibe sedema ku kurd di nava tarîyê da bimînin, ronahî bi çavên wan nekeve û her mehrûm bin ji zanînê, xurtîyê û paşerojê.

2.1.3. Bangeka xêrxwazane ya Mela Se'îd Şemdînanî ji bo milletê kurd

Mela Se'îd kambaxîya rewşa sîyasî, aborî û çandî ya kurdan ji nêz ve hergav raçav kirîye. Bi pêşbînîya xwe daxwaz li wan kirîye ku kurd bergirîyê ji bo tifaqa giştî bikin da ku kêşeyên halê hazir veneguhêzin paşeroja wan. Mela Se'îd bi berfirehî li dîroka kurdan meyzandîye û pêşnîyaz ji bo wan gotîye ku bi dû liştokîya şexsî nekevin, li xêra ûmûmî bifikirin. Di nivîsên xwe yên bi sernavên "Beyana Wêzarîya Kurdan ji 'Usmanîyan", "Nesîhetê Xêrxazîyê bo 'Ûmûmê Qewmê Kurd", Nesîhetê Xêrxwazane bo Hemî Kurdan" da bi zelalî bîr û bawerîya xwe raber kiriye.

Yek ji mexsed û daxwaza Mela Se'îd ew bûye rûmet û qîmeta kurdan di nav milletan da bike ku xuyayî bibe. Lewma dixwast ku kurd ji rewşa xwe hayedar bin da ku ji îmajê kurdê nezan rizgar bibin û ji bo wê bixebitin. Ji ber hinde bi vî rengî pend û pêşnîyaz li kurdan kirîye:

Nawê hingo di naw ‘ûmûmê milletan da meşhur bûye bi qewmê nezan. Ewe bo hingo ‘eybekê gellek mezin e. Bes hung jî wekî hemî milletan çawêt xo weken, pembîyê xefletê ji guhê xo derînin, da ew nawê kirêt ji ser hingo rabît (Şemdînanî 2021: 230).

Mela Se’îd hin mînak ji dîrokan kurdan daye û behsa serencama Bedirxanê Begê Botanî, Xanedana Şêx ‘Ubeydullah Şemdînî, Şêxê Barzanê, Şêxên Bidlîsê û Hîzanê, Paşayê Rewandîzê, Begên Mîrsêwdînan, Paşayên Baban û Mîrên Hekarîyan kirîye ku çawa hatine sirginkirin, hepskirin yan jî ji navê birin (Opengîn, 2016: 5-9).

Mela Se’îd nebûna dewletê, şarezatîyê û zanîne ya li nav kurdan bi du sebebên ve girê dide; yek ji sebebên mezin dibêje ku Osmanî bixwe ne, ya dinê jî kurd bi xwe ne. Dibêje ku kurd ji berê da, serê 600 salî ye, di bin serwerîya Osmanîyan da jîyane lê hergav bêpar mana ji adelet û medenîyetê. Dibêje ku:

‘Usmanîyan çu wextan ‘edalet nekirîye digel millete kurd? Egerne bo çî heta noke nîşaneyekê medenîyetê, ji mekteb, ji sen’et di naw wan de çênekirine? (Şemdînanî 2021: 226).

Yêk ji hîzar delîlê nezanîya hingo ewe ye ku şeşsed sal, belko zêdetir e, dewleta ‘Usmanî hukm li ser hingo diket, hêştan nîşanekê medenîyetê w insanîyetê di naw hingo da îcad nekirine, mekteba senayî’an û me’arifan neçêkirine, rêkê memlekete hingoxoş nekirine, me’deniyat li naw hingo nederêxistine, eslen bi qeder zereyekî menfe’et bo hal û istîqbalê hingo nedane. (Şemdînanî 2021: 230).

We heta noke dewleta ‘Usmanî di zemanê şeşsed salan da nîşanekê medenîyetê din av hingo da çênekirîye. Ne mekteb, ne sen’et, ne me’rifet, ne rêk, ne me’den, ne çî bo hingo durist nekirine. Xeyala wan daymî zerera millet e w her wextê bo wan ferset hebît di hingo mehew ken. (Şemdînanî 2021: 234).

Bi awayê qîyasa gotinên Mela Se’îd dîyar dibe ku Osmanî derfetên dewletê ji bo kurdan bikarneanîne bereksê wê kirine ku kurd ji xwendin, fen, huner, pîşesazî û binesazîyê mehrûm bimînin ji ber hindê jî kurd di warê şaristanîyê de, bi qîyas ji hevçerxên xwe gelekî paşda mane.

Wekî ku me lo jorê jî gotibû Mela Se’îd destnîşan dike ku yek sebebê paşdemayîna kurdan dîsan kurd bixwe ne. Nîvenda ramangêrîya Mela Se’îd li ser dijraberîya zanîn û nizanîne ava bûye. Dibêje ku herçend statuko kelem li rêya geşbûna

kurdan raxistibe jî kurdan têra xwe giringî nedane ji bo zanînê. Di derbareyê vê rewşê da weha dibêje:

We kurd qewmekî nexundî ye, tedbîra paşeroja xo nizanin, bêtifaq in. Elbette her millete cahil zêdetir bin ji ‘aliman çu meqsûdê wan hasil nabin. Dibît hekîm nexoşan derman ken, dibît hoştê şolan, sen’etan biken. Nexoş bi xo nizanî co çêket û şol û sen’et bi xo nahêne husûlê.” (Şemdînanî 2021: 226).

Eger sa’etekê pêştir hung nexoşîya xo bi hekîmê haziq û xêrxaz derman neken mikrobê cehalete w sefraê sefahetê, ku ji zamanê bab û bapîran dewê xo di qelb û cigerê hingo naye, piçek maye hingo bikujît. (Şemdînanî 2021: 230).

Wekî dixwîyê Mela Se’îd nexwendinê weke sebeba sereke dîyar dike û pêdivîyê pê dibîne di nava civakê da zana ji nezanan bêtir bin, yan na dê tu mexsada civakê neçe serî. Bi awayekî Mela pûte dide ji bo profesyonelîzmê jî ku divê her branşek bi pispor û sarezyên xwe yê dilpak hebin da ku civak serfiraz bibe.

2.1.4. Rawêjkarî û rêzanîya mela Se’îd Şemdînanî

Mela Se’îd çendîn li ser meseleyên civakî çavdêrekî nişmî be digel wê bi aqilmendî û rêzanîya xwe ve jî tev li meseleyên civakî bûye. Jixwe ji hevkarîya wî ya Bazîl Nîkîtînî ve jî aşkera ye lewra Bazîl Nîkîtîn di kitêba xwe ya Kûrtler Sosyolojik ve Tarihi İnceleme’yê da weke “hocam” bang li Mela Se’îd dike û wî weke kurdekî rewşenbîr û nefsbîçûk diwesifîne (Kûrtler, 1994: 337). Di deqeka dinê da jî Bazîl Nîkîtîn dibêje ku Mela yekî pir zana bûye û li ser kêşeyên dînî hûr dibû û ji ber ku jîyana wî di nava şêxan bihurîye bi hûrgilî serwextê rastî û derewên wan bûye (Kûrtler, 1994: 377).

Di Hekayêta Sûto w Teto da Mela Se’îd edî ne tene bi xeysetê veguhêzekî dixwîyê, herweha weke şewirmendekî zîrek tevdigere ku berê rûdaneka civakî û sîyasî bi bîrewerîya xwe diguherîne. ‘Eşîreta Rêkanî ku wê heyamê axayê wê Teto bû jêrdestên ‘eşîreta Doskanî bûn. Axayê ‘eşîreta Doskanî jî Sûto axa bû. Rêkanî edî deshilatîya Doskanîyan qebûl nakin û serî hildidin. Dema Doskanî êrîşê dibin qesra Rezgeyê ya Rêkanîyan, Qeymaqamê Amêdiyê bi vê rûdanê dihise û cendirmeyan dişîne ji bo Rêkanîyan. Ji ber ku gundê Rezgeyê li ser rîya bazirganîye bûye Şêx Muhammed Siddîq ji dixwaze ji vî şerê du axayan menfetekê werbigire. Şêx Muhammed Siddîq ji

ber ku gotina wî li nik Wilayeta Wanê meqbûl bûye bi navgîniya Qeymaqamê Amêdîyê Teto Axa razî dike ku qesra Rêkanî bifiroşî wî û bedela wê ji alîye sîyasî û aborî ve alîkarî bide Teto Axa. Li ser vê rêkefitnê Sûto Axa bi artêşa xwe erîşê dibe ser Rezgeyê û wê dagir dike. Şêx Muhemmed Siddîq demildest dîwana xwe dicivîne da ku hem ji dahata Rezgeyê mehrûm nemine hem jî ji alîye sîyasî ve xurtîya xwe wenda neke. Şêx Muhemmed Siddîq bi çareyên şewirmendên dîwana xwe qanih nabe û gazî Mela Se'îd dike ku heya wê rojê bi tu rengî Mela ji xencî dersdarîyê şewreka wî bi Şêx ra pêknehatîye. Mela Se'îd bi minesebeta gazî lêkirinê ji Şêx Muhemmed ra weha dibêje:

Bende got, “ ez mela me, taze cahêl im. Şolêt siyasî nizamim. Min ne gelek belkî piçek jî têkiliya umurêt dunyayê nekirîye. Ewete yêt hazir hemî ‘eqldar in, mezin in, şoldîtî ne. (Şemdînanî 2021: 199).

Digel Mela Se'îd dil nake tev li vî karî bibe jî Şêx Muhammed Siddîq jê weha dixwaze:

Şêx fermû, “we ye wekî dibêjî, ema ez hez dikem tu jîre'ya xo beyan key, çi çak, çi xirab, çunko wane hemîyan re'ya xo beyan kirine. (Şemdînanî 2021: 199).

Bi vê minasebetê Mela Se'îd wekî peyayê dîwanê nêrîna xwe dibêje. Rêyek rewa peşkeş dike ku Şêx Muhemmed Teto razî bike da ku gund û qesra Rezgeyê biforişê û bi vî awayê dê ruxseta parastina Rezgeyê ji hikûmetê werbigire. Herweha rêyek nerewa lê adetî jî peşnîyazî Şêx Muhemmed dike ku dîyarîyan ji qeymeqamê Gewerê û Amêdîyê bihinêre da ku di derbareyê Şêx da bi çakî ji hikûmetê ra binivîsin. Dema Mela Se'îd raya xwe dibêje Şêx Muhemmed Siddîq raya wî pir pesend dike. Mela wê gotûbêjê weha derdibe:

Wextê bende ho tertîb beyan kir şêx weto keyfxoş bû, weto kenî, mumkin bû mirîşk bi hemî Perran biçîte dewê wî. Şêx Muhemmed Siddîq goti aferini Mela Se'îd, re'ya te ji hemîyan çêtir kewte ‘eqlê min. Dê ‘emel bi Re'ya te kem. (Şemdînanî 2021: 200).

2.2. Berhemên Mela Se'îd Şemdînanî

Di sedsala 20. da yek ji pêşengê pexşana kurdî, bêguman Mela Se'îdê Şemdînanî ye. Bi encama hevkarî û daxwaza Basil Nikitinî ra Mela Se'îd du berhemên giring li pey xwe hîştine. Yek jê hin nivîsarên kurdî ne û di derbareyê çîrok û mijarên cihêreng da ne û bi gotina *Hekayêt* dest pê dike. Mela Se'îd van nivîsaran ji bo kurdolog Basil Nikitinî bi mebesta dersdayîna kurdî nivîsîye. Ergin OPENGİN van nivîsaran ji koleksiyona Basil Nikitin û David N. MacKenzie berhevandîye û bi sirûşa nivîsareka Mela Se'îd a bi navê *Hekayêta Marî w Rîwî* ku peyva bazeberê lê dibihure navê encama amadekarîya van nivîsaran Bazeber danîye. Bazeber ew kevirên pan û fireh in ku bi qasî bihustekê li ser rûyê avê dimînin da ku peya bi saya wan ji alîyekî çem an jî newalekê bi hêsanî derbasî aliyê din bibin. Amadekarê Bazeberê nivîsarên Mela Se'îd di bin banê sê pişkan da polîn kirîye. Pişka yekem ji 7 çîrokên gelerî pêk tê, pişka duyem ji 31 meseleyên henekî yên devera Şemzînanê pêk tê, pişka sêyem jî ji 23 babetên sîyasî, dîrokî û civakî pêk tên ku temamê wan 61 deq in.

Dema di sala 1917an da şoreşa Bolşevîka çêbû sefirê Rûsyayê Basil Nikitin nikarîbû vegeirîya welatê xwe û di sala 1918an da ji neçarî çû Parîsê. Basil Nikitin li Parîsê hindê metnên Mela Se'îd bi wergera wan ya fransî çap kir lê ji ber ku dem û derfeta wî têrê nekir hemû nivîsaran wergerîne û çap bike daxwaza hevkarîyê li zimannas David. N. MacKenzie kir ku ew pisporê kurdî û zimanên îranî yên din bû. Ji sala 1955an heta sala 1960î wefata Basil Nikitinî, bi nameyan li ser wan nivîsarên Mela Se'îd xebitîn. Ji ber hin sedeman David N. MacKenzie jî xebata li ser destxetên Mela Se'îd kuta nake. Xebata nivcomayî ya David. Mackenzie bi cehd û amadekarîya Ergin OPENGİN têkûz dibe û di sala 2021ê da bi herfên latînî tê çapkirin.

Berhema duyem ya Mela Se'îd Tarîx-ê Kordestan e. Herçend ji navê wê weke xebateke berfireh a dîrokî bixuye jî, vê berhemê bi awayekî berteng li ser civak, dîrok û cografyaya devera Şemzînanê hatîye nivîsîn. Fotokopiyên destxetên berhemê, herfguhêzîya wê, wergera wê ya îngilîzî û farisîya berhemê di arşîva MackKenzie da ne

ku nivê vê arşîvê di destê şagirdê MacKenzie Prof. Ludwig Paul da ye nivê din jî li kitêbxaneya Zanîngeha Göttingenê da ne. Dîsa amadekarê Bazeberê Ergin ÖPENGİN wekî bernameyekê ji xwe ra danîye ku li ser Tarîx-ê Kordestan bixebite û wê ji farisî jî bo kurdî wergerîne. Ergin ÖPENGİN naveroka Tarîx-ê Kordestan wiha dabeş kirîye:

I. Danasîneke kurt a muellifî, sebebê nivîsînê,

II. Danasîna her sê nehîyeyên serekî yên Şemzînan, gundên wan nehîyeyan, çiya û rûbarên deverê;

III. Qebr û mexberên qenc û hakimên deverê;

IV. Tarîxa eşîret û binemalên qedîm ên Şemzînan;

V. Dêr an jî kilîseyên li deverê;

VI. 22 hikayêtên waqî'î (ku dibêjê “waqî'e”) derheqê şexsîyetên xwecih, ku ya ewil hikayêteke derheq Mîrê Behrem Begê Şemdînan û hukmê wî de ye. Piraniya naveroka kitêbê ji van waqî'eyan pêk tê.” (Şemdînanî 2021: 22).

2.3. Ziman û Şêwaza Mela Se'îd Şemdînanî

Dema em dêhna xwe didin edebîyata kurdî ya pêşwext anku klasîk em dibînin ku menzûm weke cureyeka edebî rewac bêtir ji bo wê heye. Zimanê edebîyata klasîk zêdetir ji bo komeka destbijare yê civakê bû ku têgihîştina wê ji bo her kesekî ne hêsan bû. Digel wê zimanê berhemên menzûm ji ber ku bi qayîdeyeka teknîkî hatibû avakirin derfeta nivîsîna bi awayê menzûm teng bû û pisporî ji serkeftina berhemên menzûm ra divîya. Herwiha piranîya dersdarên medreseyên kurdan dersên xwe bi kitêbên menzûmkî didan û vê rewşê weke taybetîyeka medreseyên kurdan dihat zanîn. Herçend cureyên pexşanê bi qîyasa cureyên menzûm kêm be jî bi destê hin miderrisan ew hatine nivîsîn. Bêguman mînakek jê berhemeka pexşankî ya Mela Se'îd Şemdînanî ye ku agahîyên berdest wê nîşan dide ku hemû berhemên xwe bi pêşankî nivîsîye. Wekî tê zanîn têgihîştina pexşanê ji ya menzûmê hêsantir e lê wate jê ne ew e ku nivîsa pexşanê ji ya menzûmê hêsantir e.

Gelek taybetîyên berbiçav ên şêwaza Mela Se'îd hene. Yek jê sivikbûn û rewanbûna zimanê wî ye. Mebest ji sivikbûnê helbet ne hêsanbûn e lewra sivikbûna

zimanê wî ji şêwaza wî ya xweser tê. Şemzînan anku warê Mela Se'îd, cihekî kevnare, asê û ji deverê din hinekî îzolekîrî ye ku van hoyan kirîye çandeka kurdî ya hûr li wê ava bibe. Ji ber ku Mela Se'îd temenekî dirêj di nava vê çandê bihurandîye tesîr li fesîhbûna zimanê Mela kirîye. Tesîreka din a li ser zimanê Mela Se'îd çanda medreseyên kurdan bûye. Ehlê medreseyê li pey perwerdeyeka dirêj dibin xwedanê gelek 'ilman ku yek jê jî fesahet anku rewanbêjî ye da ku bikaribin tesîrê li ser pêgir û guhdarên xwe çê bikin. Ji bo dîyarbûna sivikbûna zimanê wî em dikarin mînakeke weha bidin:

Dibêjin di nihalekê da rîwîyek hebû. Awêk nîw boş bi nîweka nihalê da dihate xar. Bazeberê hebû, rîwî lê derbaz dibû her wextê hez kiriba. Car diçû berojî, car diçû nizarî, bo xo keyf dikir. Marek jî di wê nihalê da hebû. Nedişiya li bazeberî derbaz bibît. Zor hez dikir ew jî wekî rîwî hat-u-çûnê biket, çu çare nedît. (Şemdînanî 2021: 51).

Wekî dixuye dema risteyên Mela Se'îd tînan xwendin sivikbûn û rewanbûna zimanê wê xwe tawilê dide der. Di esasê xwe da teswîreka zor ya halê *rîwî* û *mar* bi fambarî şayesandîye.

Yek ji taybetîya şêwaza Mela Se'îd a herî berbiçav bikaranîna wî ya risteyên dirêj û kompleks in. Herçend risteyên wî dirêj û kompleks bin jî weke hêmaneka bingehîn ya zimanê wî, fambarî dîsa li pêş e. Mela Se'îd derfeta ziman heta pê qedîyaye bi kar anîye. Dema lazim bûye bi awayekî şarezayane bîr û bawerî û daxwazên xwe bi risteyên dirêj û kompleks bi lêv kirîye. Wekî mînak:

Meqsûda şêxan û began û axan jî ji wan nutq û nesîhetane ew e ku da re'îyeta bêçare wekî zemanê pêşî di bin deste wan bît û barê xo li piştta wan biken û kebaba xo bi hestikê wan bibirêjin, egerne ew bi temamî dîzanin ku nesayihêt wan duro ne, çu dewlet re'yeta xî we lê naket wekî ew dibêjin, xusûsên dewleta behîye ku zêdetir ji hemî dewletan hez diket ji azadîya edyan, û hez dike ji 'edale û merhemetê digel re'yeta xo. (Şemdînanî 2021: 228).

Wekî dixuye Mela Se'îd fikra xwe ya di derbareyê rajêr û serdestên da bi awayekî zelal, dirêj û bi navgînîya bingihanekên *û*, *ku* û *egerne'yê* bi risteyeka kompleks der birîye.

Mela Se'îd hemû tekstên xwe bi teknîka kompozîsyonê nivîsîye. Ji her teksteke xwe ra serenavek danîye ku zêdepara seronavên tekstên wî bi gotina *Hekayêt'ê* dest pê dike. Di destpêka tekste da mijara xwe dinasîne, nivenda wê da bi hûrgilî behsa mijarê dike û di encamê da jî mijara xwe bi pirî caran bi awayekî didaktik vedigêre û bi gotina *Wesselam'ê* kuta dike. Ji bo beşa encamê wekî mînak:

Belê, da bizanî gelek kore hene xo biçaw dizanin û yê biçaw kore, heta digene belayê, paşî hişyar dibin û tewbe dikan. (Şemdînanî 2021: 81).

Bo xeyrî pêxemberan, ew jî ne hemê wextan, xariqu-l 'adet nekiriye w naket. Bes hişyar bin, nelêbyên! (Şemdînanî 2021: 72).

Di zemanê Mela Se'îd da jî ber ku erebî *lingua franca* bû û farisî jî li ser edebîyatê hê jî karîger bû van herdû zimanan tesîr li ser ziman û şewaza Mela Se'îd kirine. Mela Se'îd beyî ku ristesazîyê têk bibe gelek peyv ji erebî bi kar anîye. Herweha qalibên erebî yên mîna *ewladu-resûl, xeyri-l hacci heremeyni-ş-şerîfeyn, xariqu-l'adet*, hatine bikaranîn (Şemdînanî 2021: 56, 58,72). Digel wê hindêk wecîzeyên farisî û gotinên helbestkarên faris jî ji bo piştrastîya gotinên xwe weke nimûne daye:

Duşmen-i dana bih ez nadan dûst. (Şemdînanî 2021: 74)

Buzurgî be 'eql est ne be sal,

Tevangerî be huner est, ne be mal. (Şemdînanî 2021: 104)

Zimanê Mela Se'îd jî alîyê ferhengê ve gelekî zengîn e û ji alîyê morfolojik ve jî bo dariştina peyvyan nimûneyan dihewîne. Weke mînak pêşxizmet, ehwalpirsî, cablûsî, ezmanlûsî, şikilguhori, libasguhori, destxalî, destbijar, şundîharî hin nimûne jê ne ku dikare zelalîyekî li meseleyen morfolojin zêde bike.

Weke encam em dikarin bibêjin ku Mela Se'îd vegêr û niktibazekî zal e di pexşana kurmancî da. Xurtîya teswîrên wî, weke teknîk bikaranîna wî ya diyalogan û rewanbêjîya wî di her metneka wî da xwe diyar dike.

2.4. Kurdîya Şemdînanê û Bazeberê û Qîyasa Wê bi Kurdîya Îroyîn ra

Mela Se'îd bi kurdîya kurmancîya Şemzînanê nivîsiye. Kurmancîya ku li Şemzînanê tê xeberdan devoka rojhilatî ya şêwezara behdînanî ye ku ev devok ji bajarokê Akrê heta bajara Êrmîyeyê xwedan axêver e. Devoka ku Mela Se'îd berhemên xwe pê nivîsiye bi çendek taybetiyên xwe ji aliyê fonolojî û morfolojîyê ve ji kurmancîya standard cudatir e.

Ji aliyê fonolojîk ve em dikarin çend nimûneyan bidin. Di kurmancîya standard da dengê “û” di devoka behdînanî ya Şemzînanê da teqabilî dengê “ü” dike ku ev fenomen cudahiyekek gelekî xurt e. Ser meselê dûpişk wekî düpişk, çûn wekî çün, memnûn wekî memnün, rûn wekî rün tê gotin.

Herçend di amadekirina Bazeberê da ev taybetî wekî di metnên eslî da çawa dibihure nehatibe parastin jî amadekarê kitêbê ji bo wê şiroveyeka weha danîye:

Di vê çapê de me ew deng li gor kurmancîya standard danîne lê xwîner divê li bîra xwe bigire ku her cara herfa ‘û’ dibîne di dengê devoka Şemdînanê de tê gotin’û’ ye, wisa jî xwînerên ji wê deverê dikarin li gor devoka xwe bixwînin. (Şemdînanî 2021: 31)

Yek fenomena din dengê y’ya standart ya peyva “diyar” e ku di devoka Şemzînanê da beramberî dengê h’yê ye. Ser meselê:

Ema we **dihar** e tu w babim herdu ker bûn (Şemdînanî 2021: 83).

Xeber bide paşay, axayê Têliyan du miro hinarine, hijîr bi **dîharî** bo îname (Şemdînanî 2021: 93).

Fenomenaka din ya gelekî berbelav dengê “v”yê ye. Vî dengî di devoka Şemzînanê da nîne û beramberî wê dengê “w”yê li kar e. Ser meselê:

Di wî wextî da berxek hat ser **awê** (Şemdînanî 2021: 62).

Rezewan jî dest da bêrikê, çûyê (Şemdînanî 2021: 69).

Babê min jî rehmetî gelek caran te’rîfa **mirowanîya** Sofî Silêmanê rehmetî dikir (Şemdînanî 2021: 70).

Herweha dengê xw’yê da dengê w’yê ketîye û xwe sivik kirîye û hew dengê x’yê maye. Wekî mînak:

Dûpişk jî **keyfxoş** bû, demanê axayê **xo** ramûsî, çû (Şemdînanî 2021: 50).

Çunko ez hawînê w zistanê w biharê w payîzê, her çar wextan, dextl û danê wan **dixom** (Şemdînanî 2021: 50).

Ji alîyê morfolojîk ve jî hin rêzikên devoka Şemdînanê xwe ji kurmancîya standart cuda dike. Kurdîya kurmancî ya standart pirhejmarîyê bi gireya îzafeyê –ên’ê saz dike lê devoka Şemdînanê ya ku Bazeber pê hatîye nivîsîn bi gireya –êt’ê saz dike. Ji bo mînak:

Qelê çî qotibû weta cewab dayê w gelek **cûnêt** kirêt jî dane rîwî (Şemdînanî 2021: 53).

Salekê gelek ‘eskerê ‘Usmanî bo xerc standinê hate naw ‘**eşîretêt kurdêt** Nawçiya (Şemdînanî 2021: 130).

Kurmancîya standart gireya cihnavên kesî ya yekem û pirhejmar wekî –in pejirandîye lê Bazeber vê gireyê bi hevterîbê devoka Şemdînanê wekî –în bi kar îname.

Gotin, “çak e lere bêna xo bideyn, pîçek wehisyêyn, paşî **biçîn** (Şemdînanî 2021: 69).

Kurmancîya standart gireya cihnavên kesî ya duyem û pirhejmar wekî –in pejirandîye lê Bazeber vê gireyê bi hevterîbê devoka Şemdînanê wekî –en bi kar îname.

Rezewan hat, gote wan, “hungo bo çî wihê **diken**? (Şemdînanî 2021: 69).

Kurmancîya standart gireya cihnavên kesî ya yekem û yekhejmar wekî –im pejirandîye lê Bazeber vê gireyê bi hevterîbê devoka Şemdînanê wekî –em bi kar îname.

Di dilê xwe da got, “lazim e bi hostayî wane ji naw rezê xo **bikeme** der û terbiye **bikem**. (Şemdînanî 2021: 69).

Xudê **dikem** ku gurg hatîye terbiye kirin, min bo xo aqil girt, we nebû ku ez bême terbiye kirin û ew aqlî bigirît (Şemdînanî 2021: 67).

Kurmancîya standart gireya cihnavên kesî ya duyem û yekhejmar wekî –î pejirandîye lê Bazeber vê gireyê bi hevterîbê devoka Şemdînanê wekî –ey bi kar îname.

Em ho najîn terzê tu **dikey** (Şemdînanî 2021: 72).

Kurmancîya standart gireya tewanga navdêrên nêr yên yekhejmar û nasyar weke –î pejirandîye lê Bazeber vê gireyê bi hevterîbê devoka Şemdînanê wekî –ey bi kar îname.

Yekî ji wna got, “ ez **wî kerey** dê ji **wî mirowey** dizim (Şemdînanî 2021: 71).

Pêşgira –ve ku lêkeran didarêje di Bazeberê da û bi hevterîba zimanê soranî û devoka Şemdînanî weke –ewe li kar e û wezîfeya paşgirê wergirtîye.

Digêrinewe kotrekê hêlîna xo di çiyayekî biland da çêkiribû (Şemdînanî 2021: 53).

Ez jî **geriyamewe** bo mala x. (Şemdînanî 2021: 56).

Dibêjin carekê gurg çû ser kanîyekê aw **dixarewe** (Şemdînanî 2021: 62).

Bi kurmancîya standart van lêkeran bi vî awayî tên bi kar anîn: digêrinewe →vedigêrin, geriyamewe →vegeriyam, dixarewe →vedixwar.

Wekî herêm Şemdînan û navê navenda vê herêmê Navşar di nava bajar û herêmên kurdîaxêv da ji aliyê lengûstîk ve cîyekî xwe yê navendî heye. Ji ber ku vê herêmê ji demên kevin da bi qasî herêmên din yê kurdîaxêv tûşî karîgerîya zimanê bîyanî nehatîye cudahîya wê ji devokê din her zelaltir bûye. Di Bazeberê da jî çî ji aliyê ristesazîyê be çî jî ji aliyê fonolojî û morfolojîyê be vê cudahîyê bi hêsanî tê dîtin.

3. RISTEYÊN KOMPLEKS Û CUREYÊN WAN DI BAZEBERÊ DA

Herçend meyla zimanî li ser hêsanîyê be jî pîrbûn û tevîhevîya rûdanan zorê dide zimanî ku bikaribe xwe li hemberî van hal û hewalan bi cî bike. Di jîyana rojane da, di danûstendin û danîna têkilîyan da sivikî û sadebûna zimanî bêtir tê tercîhkirin. Sadebûna gotinan çiqasî gur be têgihîştin zûtir û paktir saz dibe. Lê digel vê rewşê jî herçiqas zimanekî sade bixwaze li kar be têkilîyên mirovan yên cûrbicûr û tevîhev zimanekî kompleks zal dike. Zimanekî kompleks ne ew e ku zimanî ne fêhmar be. Mebesta me ji zimanê kompleks ev e ku ziman bi navgînîya risteyên kompleks xwe derbibe. Dirêjî yan jî kurtîya risteyan bi tu rengî kompleksîya wê nîşan nade, heye ku risteyek gelek dirêj be lê ne kompleks be heye ku risteyek kurt be lê kompleks be. Risteyên kompleks bereksê risteyên sade (xwerû) ji têgihîştina wan ra kedek divê. Bikaranîna hevokên kompleks îroj asta herî bilind ya zimanan e û parastina peywendîya tiştan û bûyeran weke prensîb dipejirîne (Aydın 2013: 125). Risteyên sade bes bi lêkerêke kişandî saz dibin lê risteyên kompleks bi zêdeyî ji du lêkerên kişandî saz dibin. Risteyên kompleks ew riste ne ku du an zêdetir lêkerên kişandî tê da hebin. Risteyên kompleks ji yên sade gelekî komplekstir in û bi kêmanî du lariste (*hevok/clause*) di wan da hene (Bülbül 2017: 97). Em dê di temamê xebata xwe da ji bo *sentence*'a îngîlîzî bibêjin *riste*, ji bo *clause*'ê jî bibêjin *hevok*.

Em werin ser nîvenda xebata xwe Bazeberê û şêwaza nivîskarê wê Mela Se'îd Şemdînanî. Mela Se'îd texmînen li dora salên 1875-1880 dihê dinyayê û sala 1918an da diçe ber rehma xwedê. Mela Se'îd di navbera van salan da li Şemdînanê, Hewlêr û Ûrmîyeyê jîyaye. Mela ji ber ku yekî gelekî jîr û jêhatî, behremend û çalak bûye li gelek medreseyan dersdarî kirîye û şewirmandî û aqilmendîya giregirên civaka xwe kirîye. Mela di heyama xwe da her di nava babetên dîrokî, sîyasî û civakî da bûye. Herweha di heyama xwe cografyaya ku Mela lê jîyaye bi para xwe ya pirtir ji ber ku kurmancîaxêv bûne Mela zimanakî hûr û rewan wergirtîye û bi tesîra têkilîyên xwe yên cûrbicûr yên bi civakê ra jî zimanakî xîtabî li ba wî peyda bûye. Dema ku em bala xwe didin ser

berhema Bazeberê jî zimanê Mela yê xurt xwe tavilê nîşan dide. Rewanbêjîya wî li hêlekê ji alîye avakirina têvelîya risteyan jî Mela Se'îd kanîyek boş li dewsa xwe hêlaye.

Mela Se'îd Şemdînanî di berhema xwe ya Bazeber'ê da gelek cureyên risteyên kompleks bi kar aniye. Di hin risteyên wî yê kompleks da em dibînin ku du cureyên risteyên kompleks di heman risteyê da bî awayekî zelal bi kar aniye. Li jêrê em dê di bin sernavên cureyên risteyên kompleks da gelek nimûyên ji Bazeberê wergirtî analîz bikin.

3.1.Risteyên Kompleks ku Hevokên Hokerî di Wan da Hene

Dema ku hevokê sereke û nesereke bi bingihanekekê dibestin risteyê kompleks der tê. Hevoka nesereke bi rola xwe ya hevoka hokerî ji bo ku risteyê kompleks saz bike hevoka sereke ji alîyê armanc, merc, dem, dijberî, rewş û sedemê ve têkûz dike.

3.1.1. Risteyên kompleks ku hevokên hokerî yê armancî di wan da hene

Dema hevoka nesereke ji hêla armancê ve hevoka sereke têkûz bike risteyê kompleks didarêje. Di van cure risteyan da hevoka nesereke armanca rûdana karê hevoka sereke diyar dike (Xoşnaw, 2011: 49). Ev cure hevok bi piranî bi bingihaneka ku'yê tèn girêdan. (Altun Demir, 2020: 37). Van herdû cure hevokan di çarçoveya teksta ber destê me bi piranî bi bingihaneka da û ku'yê dibestin. Ji bo nimûne:

(1)

Marî got, “waqî'en we ye wekî difermûy, emma çi bikem, Xudê ez bo wê çêkirime da bi xelkî we dem (Şemdînanî 2021: 52).

Di mînaka me ya yekem da *Xudê ez bo wê çêkirime* hevoka sereke ye, *da* bingihanek e, *bi xelkî we dem* hevoka nesereke ye. Bi vî rengî risteyê kompleks hatîye darêjtin ku hevoka nesereke bi bingihaneka da'yê manaya armancê li risteyê bar kirîye.

(2)

Şeytanî got, xizmeta hingo çî ye w hingo çiyê weto kirîye ku ez pê keyfxoş bibim, da hingo ji bedel wê çakîyê xelat bikem?” (Şemdînanî 2021: 49).

Di vê mînaka me da du hevokên nesereke *ez pê keyfxoş bibim û hingo ji bedel wê çakîyê xelat bikem* bi bingahenekên cuda *ku û da* hevoka sereke *hingo çiyê weto kirîye* ji alîye armancê ve bi şêweya pirsê tamam kirine.

(3)

Şeytanî got, “xizmeta xo w zerera xo derheq benî-ademî bo min beyan ken da xelatê her kesekî bi qeder xizmeta wî bihête dan, çunko di her tiştekî da însaf û ‘edalet çak e.” (Şemdînanî 2021: 49).

Di vê mînakê da jî dîsan bi bingehaneke *da’yê* hevoka sereke û nesereke hatîye bestin û risteyeke kompleks û dirêj pêk hatîye. Herweha di vê risteyê da hevoka nesereke ya sedemî jî heye. *xizmeta xo w zerera xo derheq benî-ademî bo min beyan ken*” hevoka sereke ye, *xelatê her kesekî bi qeder xizmeta wî bihête dan* hevoka nesereke ya armancî ye, *çunko* gihanek e di her tiştekî da însaf û ‘edalet çak e jî hevoka nesereke ya sedemî ye.

(4)

Wê carê, madam we ye, zû be, kêlikekê bo min hawêje xarê da bixom, dile min qahîm bibît, bişêm çiyaya ragirim (Şemdînanî 2021: 53).

Bingihaneke *da’yê* di vê risteyê da hevoka sereke û hevoka nesereke ya armancî bestîye û risteyeka kompleks pêk anîye. *kêlikekê bo min hawêje xarê* hevoka sereke ye, *da* bingihaneke e, *bixom, dile min qahîm bibît, bişêm çiyaya ragirim* û ev her sê hevoka jî hevokên neserekê ne û di rewşa armancê da ne.

(5)

Zanî ku edî Teto çu penah neman û Sûto mulaheze kir, “ çak e li hukûmetê jî wî mehkûm bikem, da çu rê bo wî neminin, paşî wî bifewitînim (Şemdînanî 2021: 204).

Di vê mînaka me da “*çak e li hukûmetê jî wî mehkûm bikem* hevoka sereke ye, *da bingihanek e, çu rê bo wî neminin, paşî wî bifewitînim* û ev her du hevka jî hevokên nesereke yê armancî ne ku bi bestina her sê hêmanan hevoka sereke, hevoak nesereke û bi bingihanekekê risteyeka kompleks pêk hatiye.

(6)

Edî bîra mirîşkan nekir, xebata wê kir ku bi çî terz xo xilas biket (Şemdînanî 2021: 56).

Wekî ku ji mînaka me jî dixuye *xebata wê kir* hevoka sereke ye, *bi çî terz xo xilas biket* hevoka nesereke ye û ji aliyê armancê ve hevoka sereke diyar dike û bingihaneka *ku* 'yê jî her du hevok pev bestiyê. Di encamê da risteyeka kompleks pêk hatiye.

(7)

Demekê hez dikem bigeriyê da pîçek ji xawî derkewim, wehisê mewe. (Şemdînanî 2021: 64).

Di vê mînaka da ji aliyê avanîyê ve du cure risteyên kompleks hene. Yek jê bi hevoka tamamker saz bûye ya dinê jî bi hevoka nesereke ya armancî ve saz bûye. *Demekê hez dikem bigeriyê* bi hevokeka tamamker ku bi lêkera modal hez dikem saz bûye. *Demekê hez dikem* hevoka sereke ye, *bigeriyê* hevoka tamamker e û biresera hevoka sereke ye ku bi vî awayî risteyeka kompleks ava bûye. Herwiha *Demekê hez dikem bigeriyê* hevoka sereke ye û *pîçek ji xawî derkewim, wehisê mewe* jî hevoka nesereke ye ku bi navgîniya bingihaneka *da*'yê ji aliye armancê ve manayek li hevoka sereke bar kiriye.

(8)

Du cendirme w heşt xulam dane Sûto ku biçîte naw Doskî w Horemariyan ku hizar û sêsed lire bo şêx cema ket, bînît (Şemdînanî 2021: 204).

Di vê mînaka risteye kompleks da du hevokên nesereke yê armancî hevokeka sereke ji aliyê manayê ve diyar kirine. *Du cendirme w heşt xulam dane Sûto* hevoka sereke ye, herdû *ku* bingihanek in, *biçîte naw Doskî w Horemariyan û hizar û sêsed lire bo şêx cema ket, bînît* jî hevokên nesereke yê armancî ne ku hevoka sereke ji aliyê manayê ve diyar kirine.

(9)

We diharîyêt gelek çak bo qaymeqamê Gewerê w qaymeqamê Amêdiyê bihinêrin, dile wan çak xoş ken, weto ku derheq şêx daymî bi çakî w derheq Sûto bi xirabî biniwîsin (Şemdînanî 2021: 200).

Di vê mînaka jorê da wekî dixuye du hevokên sereke ji aliyê hevokeka sereke ji aliyê armancê ve hatine diyarkirin. *We diharîyêt gelek çak bo qaymeqamê Gewerê w qaymeqamê Amêdiyê bihinêrin û dile wan çak xoş ken* hevokên sereke ne, *derheq şêx daymî bi çakî w derheq Sûto bi xirabî biniwîsin* hevoka nesereke ya armancê ye û manaya hevoka sereke ji aliyê armancê ve diyar kiriye. Herwiha ku jî bingihanek e ku hevokên sereke û hevoka nesereke pev girêdaye. Bi vê encamê jî risteyeka kompleks pêk hatiye.

(10)

Sala ku jina Xalid rewa Muhemmed Hafiz ew jin digel xo îna ku bihête kûstanê li Zê derbas bû (Şemdînanî 2021: 187).

Vê risteyê bi hevokeka nesereke ya armancî rewşa kompleksbûnê wergirtiye. *Muhemmed Hafiz ew jin digel xo îna* hevoka sereke ye *bihête kûstanê* hevokeka nesereke ye û hevoka sereke ji aliyê armancê ve diyar kiriye. Herwiha binghaneka *ku*'yê jî herdû hevok pev gire daye da ku encama risteyeka kompleks pêk were.

3.1.2. Risteyên kompleks ku hevokên hokerî yê mercî di wan da hene

Dema hevoka nesereke ji hêla mercî ve hevoka sereke tîkûz bike risteyeke kompleks didarêje (Altun Demir, 2020: 38). Di van cure risteyan da hevoka nesereke merca rûdana û diyardeya karê hevoka sereke diyar dike (Xoşnaw, 2011: 50). Van herdû cure hevokan li dorhêla teksta ber destê me bi piranî bi bingihaneka eger û ku'yê dibestin. Ji bo nimûne:

(1)

Belê heta ez tîm eger nêçîrek hingo îna ragirin da wextê hatim bişkînim.
(Şemdînanî 2021: 64).

Weke ji mînaka me jî diyar e bingahaneka me *eger* li pêş e, piştra hevoka nesereke li rîz e *nêçîrek hingo îna*, li pey wê jî hevoka sereke *ragirin* hatiye. Herweha vê nimûneya me hevoka nesereke ya armancî dihevine: *da wextê hatim bişkînim*. Li vê nimûneyê û gelekên din da em dê bibinin ku gelek crûreyên hevokan yê cuda di risteyekê da digihêjin hevdû û binyada kompleksî pêk dihînin.

(2)

Paşî wê, eger merhemet biferimût, bende bi xizmetkarê xo qebûl biket, heta rojekê ez sax bim ji zatê wî cuda nabim (Şemdînanî 2021: 51).

Adeten pêşîyê bingihaneka *eger*'ê hatiye lê vê mînaka me balkêşîyekê weha raberî me dike ku sê hevokên nesereke li pey hev hatine: *merhemet biferimût, bende bi xizmetkarê xo qebûl biket, heta rojekê ez sax bim*. Ji sê hevokên nesereke şûnde hevokeke sereke hatiye: *ji zatê wî cuda nabim*.

(3)

Eger te hind musa'ede kiriba, piçek stukira xo kêşaba pêş çawêt min û carekê dî di pêş mirina xo da min çawêt te dîtibana, paşî bila ez miribam, da di dile min da nebîte keser (Şemdînanî 2021: 52).

Weke ji mînakê jî diyar e, dîsan bingihaneka *eger*'ê hatiye sere pêş û rewşa mercê daye risteyê. *te hind musa'ede kiriba* hevoka nesereke ye. *piçek stukira xo kêşaba pêş*

çawêt min û carekê dî di pêş mirina xo da min çawêt te dîtibana hem hevokeke nesereke ye hem risteyeke hevedudanî ye. *paşî bila ez miribam* heveko sereke ye û li pey wê bingihaneka da”yê hatiye û bi hevoka nesereke ya armancî *di dile min da nebîte keser* riste bi dawî bûye. Di temamê deqên berdestê me yên Bazeberê da fenomeneke berbiçav e ku gelek cureyên hovokan di heman risteyê da hatine pevbestin.

(4)

Eger sa’etekê pêştîr hung nexoşîya xo bi hekîmêt hazîq û xêrxaz derman neken mîkrobê cehalete w sefraê sefahetê, ku ji zemanê bab û bapîran dewê xo di qelb û cegerê hingo naye, pîçek maye hingo bikujît (Şemdînanî 2021: 230).

Di vê mînak me da gihaneka *eger’ê* riste bi hev bestîye. *sa’etekê pêştîr hung nexoşîya xo bi hekîmêt hazîq û xêrxaz derman neken* hevoka sereke ye, *mîkrobê cehalete w sefraê sefahetê, pîçek maye hingo bikujît* jî hevoka nesereke ye ku rewşa mercî daye risteyê. Herweha vê risteyê bi hevoka *ku ji zemanê bab û bapîran dewê xo di qelb û cegerê hingo naye* weke cure hevoka pêwendiyê ku em dê bi hurgilî di serenava eleqedar da wê analîz bikin.

(5)

Sûto mûlaheze kir, eger qesra Rezge bi wî terzî temam bibît û deste şêxî bikewîte naw Rêkanê hingî quweta Teto dê gete dereceyekê edî neşet beramberiya wî biket. (Şemdînanî 2021: 197).

Di vê mînak me da jî dîsa bi gihaneka *eger’ê* hevokeka nesereke ya mercî pêk hatiye û bi hevoka sereke ra risteyeka kompleks pêk anîne. *qesra Rezge bi wî terzî temam bibît û deste şêxî bikewîte naw Rêkanê* hevoka sereke ye û herwiha risteyeka hevseng e ku *qesra Rezge bi wî terzî temam bibît û deste şêxî bikewîte naw Rêkanê* bi gihaneka *û’yê* du hevokên ji alîyê maneya xwe ve xweser pevgerîdaye. *hingî quweta Teto dê gete dereceyekê edî neşet beramberiya wî biket* jî hevoka nesereke ye û ji alîye mercî ve hevoka sereke wesifandiye.

(6)

Ewê nemirît exleb seqet dibît (Şemdînanî 2021: 50).

Di vî risteya kompleks da tercîhen bingihanekek nehatiye bikaranîn lê bi pêwend em dizanin ku bi hevokeka nesereke ya mercî vê risteyê saz bûye. *exleb seqet dibît* hevoka sereke ye û *Ewê nemirît* hevoka nesereke ye û mercê li hevoka sereke bar kiriye ku bi vî rengî risteyeka kompleks pêk hatiye.

(7)

Eger rîwî bi tedbir û hîle xo ji destê marî xilas nekiriba da bi bineguha wî we det û da kujît (Şemdînanî 2021: 52).

Di vê mînakê da *rîwî bi tedbir û hîle xo ji destê marî xilas nekiriba* hevoka sereke ya mercî ye ku bi bingihaneka *eger'ê* hatiye saz kirin *da bi bineguha wî we det û da kujît* hevoka sereke ye û ji alîyê hevoka nesereka ya mercî ve hatiye wesifandin ku bi vî rengî rsiteyak komplkes pêk hatiye.

(8)

Tebeqêt binî nêzikî tamam-bûnê bûn, Sûto mulaheze kir, eger qesra Rezge bi wî terzî tamam bibît û destê şêxî bikewîte naw Rêkanê hingî quweta Teto dê gete dereceyekê edî neşêt beramberiya wî biket (Şemdînanî 2021: 197).

Vê mînakê cudahîyeka xwe heye ku sê rêbazên avasazîya risteyên kompleks digel xwe hewandiye. Di serî da risteya kompleks bi hevoka nesereke ya mercî pêk hatiye. Du hevokên nesereke hevokeka sereke ji alîyê mercê ve diyar dike. *qesra Rezge bi wî terzî tamam bibît û destê şêxî bikewîte naw Rêkanê* hevokên nesereke ne, *hingî quweta Teto dê gete dereceyekê edî neşêt beramberiya wî biket* jî hevoka sereke ye ku bi navgîniya gihaneka *eger'ê* ev herdû cure hevok pev hatine girêdan û di encamê da risteyeka kompleks derhatiye. Ya duduyan da hevokeka nesereke ya demê encamek daye. Hevokên neserekê yên mercê din ava risteyê da bûye hevokeka sereke û ji alîyê hevokeka nesereke ya demê ve hatiye diyarkirin. *Rezge bi wî terzî tamam bibît û destê şêxî bikewîte naw Rêkanê* hevokên sereke ne, *quweta Teto dê gete dereceyekê edî neşêt*

beramberiya wî biket hevoka nesereke ya demê û hingî hokerek e ku herdu cure hevoka ji aliyê deme ve wesifandiye. Di ya sisîyan da hevokeka pêwendîye heye. *quweta Teto dê gete dereceyekê edî neşêt beramberiya wî biket* bi hevokeka pêwendîyê saz bûye. *edî neşêt beramberiya wî biket* hevoka pêwendîyê ye û bikera risteyê *quweta Teto* ji aliyê çawanîyê ve modîfiye kiriye.

(9)

Ew delîlê şer'û qanûnan hemî pirr-û-pûç in, bêfayde ne. Ew hingî bi kar tîn ku kalûme nebît (Şemdînanî 2021: 149).

Vê risteya kompleks herçend bi hokera demê *hingî* hatibe bikaranîn jî ji ber ku pêwenda risteya berî xwe amajeyê bi şert û mercekê dike riste wekî ya mercî hatiye polînkirin. *bi kar tîn* hevoka sereke ye, *kalûme nebît* hevoka nesereke ye û şert û mercekê li hevoka sereke bar kiriye. Bingihaneka *ku'yê* jî her du hevok pev bestiyê û di encamê da risteyeka kompleks saz bûye.

(10)

Paşî eger gelek dizî bikem kes xiyala min naket (Şemdînanî 2021: 86).

Di vê risteyê da *kes xiyala min naket* hevoka sereke ye, *gelek dizî bikem* hevoka nesereke ye ku hevoka sereke ji aliyê mercê ve diyar kiriye. Herwiha bingihaneka *eger'ê* jî herdu hevok pev girêdaye da ku risteyeka kompleks pêk were.

3.1.3. Risteyên kompleks ku hevokên hokerî yên sedemî di wan da hene

Dema hevoka nesereke ji hêla sedemê ve hevoka sereke tîkûz bike risteyeka kompleks didarêje. Di van cure risteyan da hevoka nesereke sedema rûdana karê hevoka sereke nîşan dide (Xoşnaw, 2011: 39). Van herdu cure hevokan li dorhêla deqên ber destê me bi piranî bi bingihaneka çunko'yê dibestin. Ji bo nimûne:

(1)

Gotin, “bes lazim e ku me xelat bikey, çunko em daymî zerera benî-ademî dikeyn.” (Şemdînanî 2021: 49).

Di vê risteya kompleks da *bes lazim e ku me xelat bikey* hevoka nesereke ye *çunko* bingihanek û “*em daymî zerera benî-ademî dikeyn jî* hevoka sereke ye ku bi pevbestina van hêmanan şertê risteyeka kompleks pêk hatiye.

(2)

Wextê ku min dîtewe bihêm, xeber bideme gurgî da ew jî bihêt, harî min bihajot, çunko ew ji min çusttir û biquwettir e (Şemdînanî 2021: 64).

Cudahîya vê mînakê ew e ku hevokên nesereke ya armancî, mercî û sedemî pevra di risteyê da hatine pevbestin. *Wextê ku* bingihaneka hevoka nesereke ya mercî ye, *min dîtewe bihêm* hevoka nesereke ye *xeber bideme gurgî* hevoka sereke ye, herweha *da* bingihaneka hevoka nesereke ya armancî ye *ew jî bihêt*, *harî min bihajot* hevokên sereke ne *çunko* bingihaneka hevoka nesereke ya sedemî ye *ew ji min çusttir û biquwettir e* hevoka sereke ye.

(3)

Bi dewê herkesî nelêbyêt, temaşay kirine biket, ne gotinê çunko di ber şolan da kirin şert e (Şemdînanî 2021: 52).

Ev jî mînakeke me ya dinê ye. *Bi dewê herkesî nelêbyêt, temaşay kirine biket, ne gotinê* herçend ev hevokê sereke be jî herweha ji sê risteyan pêk hatiye. *çunko* bingihaneka sedemî ye, *di ber şolan de kirin şert e* jî hevoka nesereke ye.

(4)

Zabit gote Sûto, “ez hatime mexsûs bejime te ku ez hez nakem mala te xirab bibît, çunko tu axayekî xanedan û mu’teber î (Şemdînanî 2021: 195).

Di vê mînakê da *ez hez nakem mala te xirab bibît* hevoka sereke ye, *çunko* gihanek e û *tu axayekî xanedan û mu’teber î* ku di ku rewşa sedemî da ye jî hevoka nesereke ye û herwiha hokera risteyê ye.

(5)

Çûne huzûra muctehîd, gotin “em ji Silêmaniyê hatîne bo tewafa merqedê mubarekê hesretê Imam Huseyn û bo ziyaretkirina deste meymenet-peyweste cenabê aqaê muctehîd, çunko me xewnekê zor ‘ecîb derheq Imam Huseyn û muctehide Kerbelayê w Mu’ezzinê Kerbelayê w Nadir Şah dîtiye (Şemdînanî 2021: 75).

Vê mînaka me jî bi hevokeka nesereke ya sedemî saz bûye ku di heman demê da hokera risteya kompleks e. *em ji Silêmaniyê hatîne bo tewafa merqedê mubarekê hesretê Imam Huseyn û bo ziyaretkirina deste meymenet-peyweste cenabê aqaê muctehîd* hevoka sereke ye *çunko* gihanek e ji bo ku hevoka nesereke sedemîbûna xwe diyar bike, *me xewnekê zor ‘ecîb derheq Imam Huseyn û muctehide Kerbelayê w Mu’ezzinê Kerbelayê w Nadir Şah dîtiye* jî hevoka nesereke ya sedemî ye û hokera risteya kompleks e.

(6)

Rîwî got, “ne simbêlêt te bel bûbûn û ne çawêt te sor bûbûn û ne mûyêt te girj bûbûn û ne kilika te bûbû xelek, ema min ‘eql û me’rîfeta te tecrîbe dikir da bizanim tu çîy (Şemdînanî 2021: 65).

Di vê risteya kompleks da hevoka nesereke ya sedemî û ya armancî di heman risteyê da hatine bikaranîn. *ne simbêlêt te bel bûbûn û ne çawêt te sor bûbûn û ne mûyêt te girj bûbûn û ne kilika te bûbû xelek* hevoka sereke ye, *min ‘eql û me’rîfeta te tecrîbe dikir* hevoka nesereke ye û bi gihaneka *ema’yê* hevoka sereke ji alîyê sedemî ve diyar kiriye. Herwiha di heman risteyê da hevoka sereke di çarçoveya pêwendîya xwe da bûye hevoka nesereke ya armancî. *min ‘eql û me’rîfeta te tecrîbe dikir* hevoka nesereke ye, *da* bingihanek e û *bizanim tu çîy* hevoka nesereke ye. Di vê risteyê da jî hevoka nesereke ji alîyê armancê ve hevoka sereke wesifandiye û ji ber wê risteyeka kompleks pêk hatiye.

(7)

Her teşebbusa em bikeyn çak e di bin himayeta dewleta Urûs bikeyn, da dûmayîyê bo me nebîte sebebe pêşîmanê w derdeserîyê, çunko eger çak, eger xirab, noke li furuntê Qefqas, Urûs xalibtir e ji 'Usmanî, we Inglîs jî li furuntê Beynu-n Nehreyn û li furuntê Bêlcîk xalibtir e ji 'Usmanî w Alman (Şemdinanî 2021: 208).

Mînak jorê ya risteya kompleks du cure hevokên nesereke di gel xwe dihewîne. *Her teşebbusa em bikeyn çak e di bin himayeta dewleta Urûs bikeyn* hevoka sereke ye, da bingihanek e û *dûmayîyê bo me nebîte sebebe pêşîmanê w derdeserîyê* hevoka nesereke ye, ku hevoka sereke ji aliyê armancê ve bi mana û diyar kiriye. Di heman deme da hevoka nesereke ya armancê bûye hevoka sereke ya risteya li pey xwe. *dûmayîyê bo me nebîte sebebe pêşîmanê w derdeserîyê* hevoka sereke ye, çunko gihanek e, eger çak, eger xirab, noke li furuntê Qefqas, Urûs xalibtir e ji 'Usmanî, we Inglîs jî li furuntê Beynu-n Nehreyn û li furuntê Bêlcîk xalibtir e ji 'Usmanî w Alman hevoka nesereke ye û hevoka sereke ji aliyê sedemê ve diyar kiriye.

(8)

We çunko zahirê hal bena li ser gotina ehaliyê Hewlêrê Sofî Ehmed mirowê durowê nîye wî jî 'efû biken, biçîte mala xo (Şemdinanî 2021: 114).

Di vê risteya kompleks da *zahirê hal bena li ser gotina ehaliyê Hewlêrê Sofî Ehmed mirowê durowê nîye* hevoka nesereke ya sedemî ye, *wî jî 'efû biken* hevoka sereke ye, çunko bingihanek e ku herdû hevok pev bestiyê. Bi encama têkiliya van hêmanên navborî risteyek kompleks pêk hatiye.

(9)

Rezewan jî, çunko bi tenê bû w xelk dûr bû, kes dîhar nebû ku di hewara wî bihêt, tirsar. (Şemdinanî 2021: 69).

Di vê risteya kompleks da sê hevokên nesereke yê sedemî hevokeka sereke diyar kirine. *bi tenê bû w xelk dûr bû, kes dîhar nebû* hevokên nesereke yê sedemî ne, û hevoka sereke *tirsar* ji aliyê sedemê ve diyar kirine. Herwiha çunko jî bingihanek e, hatiye serê risteyê û herdû cûre hevok pev bestiyê.

(10)

Gote gurgî, “êrwe were da min guh lê bît, çunko guhêt min pîçek giran in (Şemdînanî 2021: 66).

Di vê mînaka risteya kompleks da bingihaneka çunko ketiye navbera herdû hevokan. *êrwe were* hevoka sereke ye, *guhêt min pîçek giran in* hevoka nesereke ye û bi bingihaneka çunko’yê pev hatine bestin.

3.1.4. Risteyên kompleks ku hevokên hokerî yê demî di wan da hene

Dema hevoka nesereke bi rola hokera demê ve hevoka sereke têkûz bike risteyeke kompleks didarêje. Di van cure risteyan da hevoka nesereke dema rûdana karê hevoka sereke diyar dike û bi vê hoyê dema rûdana karê hevoka sereke tê zanîn (Xoşnaw, 2011: 48). Van herdû cure hevokan di çarçoveya teksta ber destê me da bi piranî bi hokera demê “wextê ku” dibestin. Ji bo nimûne:

(1)

Wextê ku soneyê cewaba selama wî ho şirîn û nerm dawê rîwî ji keyfxoşîyan wext bû bifirît (Şemdînanî 2021: 58).

Di vê mînaka me da *sonyê cewaba selama wî ho şirîn û nerm dawê* hevoka nesereke ye, *wextê ku* hokera demê ye *rîwî ji keyfxoşîyan wext bû bifirît* hevoka sereke ye. Bi vî rengî risteyek kompleks hatîye darêjtin ku hevoka nesereke bi hokera demê ra manaya demê li risteyê bar kirîye.

(2)

Wextê ku min dîtewe bihêm, xeber bideme gurgî da ew jî bihêt, harî min bihajot, çunko ew ji min çusttir û biqwettir e (Şemdînanî 2021: 64).

Vê mînaka me ji aliyê avasazîya xwe ve taybet e lewra hokera armancê, sedemê û demê pevne hatine bikaranîn û risteyeke kompleks pêk anîne. Dema em bixwazin her sê cure hevokan ji nav hev derên rewşeke wiha çê dibe: *Wextê ku* hokera demê ye, *min dîtewe bihêm* hevoka nesereke ye, *xeber bideme gurgî* hevoka sereke ye û bi navgînîya

hokera demê ra hatine bestin. *Xeber bideme gurgî* hevoka sereke ye *da* bingihanek e *ew jî bihêt, harî min bihajot* hevoka sereke ye. *Ew jî bihêt, harî min bihajot* hevoka sereke ye *çunko* gihanek e *ew ji min çusttir û biquwettir e* hevoka nesereke ye. Dema em bi nerîneka giştî li risteyê binêrin riste derfeteka wiha jî dide: *Wextê ku* hokera demê ye, *min dîtewe bihêm* hevoka nesereke ye, *xeber bideme gurgî da ew jî jî* hevoka sereke ye.

(3)

Wextê ku Mela têgeşt ku ewane zor wehşî ne gote wan (Şemdînanî 2021: 112).

Hokera vê risteyê ji hevokeka nesereke pêk hatiye. *Wextê ku têgeşt ku ewane zor wehşî ne* hevoka nesereke ye *û Mela gote wan jî* hevoka sereke ye. Di vê mînaka me da hevoka nesereke ji aliye demê ve hevoka sereke tamam kiriye. *Wextê ku jî wekî gihanekekê* kiriye ku manaya deme li hevoka nesereke bar bibe.

(4)

Wextê ku şêx ew xebere digot xulaman dizanî çî ye dibêjît çunko di pêş da têgehandibûn (Şemdînanî 2021: 187).

Bi vê mînaka me, bi hevokeka nesereke ya demî û bi ya sedemî risteyeka kompleks saz bûye. *xulaman dizanî çî ye dibêjît* hevoka sereke ye, *Wextê ku* gihanek e, *şêx ew xebere digot* hevoka nesereke ye û bi navgînîya gihaneka *Wextê ku* wateya demê daye hevoka sereke. Herwiha *Wextê ku şêx ew xebere digot* hokerek e û ji aliye demê ve riste wesifandiye. Ji bilî wê hevoka sereke ya *xulaman dizanî çî ye dibêjît* di heman deme da bi hevoka nesereke ya bi pey xwe ra *çunko di pêş da têgehandibûn* risteyeka kompleks saz kiriye. *çunko di pêş da têgehandibûn* hevokeka nesereke ye û ji aliyê sedemê ve riste wesifandiye. Di vira da çunko gihanek e *û di pêş da têgehandibûn* hokera sedemî ye.

(5)

Wextê ku kêjik diînane derê, pîçek ferace dibûn, hêşta temam nedişîyan bifirin, rîwîyek fêr bûbû her sal di wî wextî da dihat, kilika xo dihelpisare çiyay (Şemdînanî 2021: 53).

Di vê mînaka me da sê hevokên nesereke hene ku di heman deme da hokerên deme ne û sê hevokên sereke temam dikin. *Wextê ku kêjik diînane derê, pîçek ferace dibûn, hêşta temam nedişîyan bifirin* hevokên nesereke ne û di heman deme da di risteyê da bi rola hokerên demê tevdigerin. *rîwîyek fêr bûbû her sal di wî wextî da dihat, kilika xo dihelpisare çiyay*, van hevokan jî hevokên sereke ne û ji alîyê hevokên nesereke ve hatine temamkirin. Bi vî awayî risteyeka kompleks ava bûye ku ji lîyê avasazîya xwe va xweser e lewra sê hevokên nesereke yê hokerî sê hevokên sereke ji alîyê deme ve wesifandine.

(6)

Paşî dûpişk hate pêş, got, “ zerera min ewe ye, ez her wextê bigeme wan bi wan we didem (Şemdînanî 2021: 49).

Di vê mînakê da risteya kompleks bi navgîniya hokera dem ve saz bûye. *ez her wextê bigeme wan* hevoka nesereke ye û hokera demê *wextê lê hewandî ye, bi wan we didem* jî hevoka sereke ye û ji alîyê hevoka nesereke bi navgîniya hokera demê ve hatiye wesifandin ku bi vî awayî risteyeka kompleks saz bûye. Herwiha tercihen bingihaneka ku'yê nehatiye bikaranîn.

(7)

Bazeberek hebû, rîwî lê derbaz dibû her wextê hez kiriba (Şemdînanî 2021: 51).

Vê risteya kompleks jî bi navgîniya hevokeka nesereke ku di heman demê da hevokeka hokerî ye saz bûye. *rîwî lê derbaz dibû* hevoka sereke ye, *her wextê hez kiriba* jî hevokeka nesereke ye û ji ber ku bi hokera demê *her wextê* hatiye saz kirin hevokeka hokerî ya deme ye ku hevoka sereke ji alîyê demê ve wesifandine.

(8)

Çi dema ez kiliko xo ji çiyaya wekem çiya dê herifit (Şemdînanî 2021: 53).

Vê risteya kompleks bi hevoka hokerî ya demê ve saz bûye ku di heman demê da em wê wekî hevoka sereke jî bi nav dikin. *çiya dê herifit* hevoka sereke ye *Çi dema* hokera deme ye, *ez kiliko xo ji çiyaya wekem* hevoka nesereke ye û hevoka sereke ji aliyê demê ve wesifandiye ku bi vî awayî risteyeka kompleks saz bûye.

(9)

Sala paşî ku hat kotrê kêjikêt xo îname der (Şemdînanî 2021: 53).

Di vî risteya kompleks da bingihaneka *ku'yê* tercîhen di nava hevoka nesereke hatiye bikaranîn, bileksê wê vê bingihanekê piranî li sere hevokê ye. *kotrê kêjikêt xo îname der* hevoka sereke ye, *Sala paşî ku hat* hevoka nesereke ye û bi navgîniya hokera demê *sala paşî ku* hevoka sereke ji aliyê demê ve wesifandiye. Ji ber wiha jî risteyaka kompleks pêk hatiye.

(10)

Dema ku çawê mam rîwî bi soneyê kewt, dît sone gelek qelew e, dile wî qewî çû goştê wê (Şemdînanî 2021: 58).

Wekî ji mînaka jorê jî dixuye du hevokên nesereke hene ku hevokeka sereke ji aliyê manaya demî ve diyar kirine. *çawê mam rîwî bi soneyê kewt* û *dît sone gelek qelew e* hevokên nesereke ne û hevoka sereke *dile wî qewî çû goştê wê* bi navgîniya hokera demê *dema ku* diyar kiriye. Ji ber vê têkiliya nava wan risteyeka kompleks saz bûye.

3.1.5. Risteyên kompleks ku hevokên hokerî yên dijberî di wan da hene

Risteyên kompleks ên ku bi hevokên hokerî yên dijberî çê dibin digel zorî û bêderfetiyekê, hêsanî û derfetekê jî didêrin. Di van cure risteyan da hevoka nesereke pile û pîvana karê hevoka sereke nişan dide û sînore karekî nişan dide (Xoşnaw, 2011: 50). Nimûneyên ber desten me yê van cure hevokan bêtir bi hokerên *egerçî* û *hindî* û herçend

û gihaneka *ema* disazin. Ev cure riste bi bestina hevokeka sereke, hokerekê û hevokeka nesereke pêk tîn. Bo nimûne:

(1)

Got,“ egerçî ketxudayê gundeki bim dîsa dişêm hindî wî bixom (Şemdînanî 2021: 119).

Wekî ji mînaka me jî dixuyê *egerçî* hoker e, *ketxudayê gundeki bim* hevoka nesereke ye, *dîsa dişêm hindî wî bixom* jî hevoka sereke ye.

(2)

Egerçî ez bêbehr bûm ji xarina mirîşkê wê malê *ema* xudê weto merhemet digel min kir ez kirime seyîd, *i'tibar* da min (Şemdînanî 2021: 56).

Vê mînaka me hem bi hokerekê hem jî bi gihanekê saz bûye. *Egerçî* hoker e *ez bêbehr bûm ji xarina mirîşkê wê malê* hevoka nesereke ye, *ema* gihanek e, *xudê weto merhemet digel min kir ez kirime seyîd, i'tibar da min* hevoka sereke ye û di heman deme da bi sere xwe risteyek e kompleks e lewra sê lêker *kir, kirime, da* hatine bikaranîn.

(3)

Hindî mulaheze dikem ji wê çêtir nahête xiyala min (Şemdînanî 2021: 116).

Vê mînaka me jî bi navgînîya hokera *hindî* dijberîyekê li cem xwe dihewîne. *Mulaheze dikem* hevoka nesereke ye, *ji wê çêtir nahête xiyala min* jî hevokeka sereke ye û bi bestina herduyan risteyeka kompleks pêk hatîye.

(4)

Hindî ku fikra min li ser hîle w dizîyê w xurtîyê bû min zikek têr bû deh birsî (Şemdînanî 2021: 56).

Di vê mînakê da ji ber ku du navbera du cure hevokan ji alîyê manayê ve qiyasek heye em dikarin vê risteyê jî wekî risteyeka kompleks binirxînin. *Hindî ku* gihanek e û manaya dijberîyekê yan jî qiyasekê didêre. *fikra min li ser hîle w dizîyê w xurtîyê bû*

hevoka nesereke ye, *min zikek têr bû deh birsî* jî hevoka sereke ye. Di vê risteyê da qiyasa hevoka sereke û nesereke heye. Mînaka jorê bi dêvê *rîwî* hatiye gotin. *Rîwî* dibêje ku herçend fikra min li ser *hîle w dizî w xûrtîyê bû* jî lazim bû ez hergav têr bûma lê bi qiyasa wê *min zikek têr bû deh birsî* bû.

(5)

Noke jî Şêx ‘Ebdulqadir Efendî li Istembolê, herçend e’zaê e’yan e, emma esîr hesab e (Şemdînanî 2021: 226).

Noke jî Şêx ‘Ebdulqadir Efendî li Istembolê, herçend e’zaê e’yan e hevoka nesereke ya dijberî ye, *emma esîr hesab e* hevoka sereke ye, herçend jî hoker e. Herwiha hevoka nesereke ji ber ku bi hokerekê hatiya bikaranîn ew bi xwe jî wekî hevok di rola hokerê da ye.

(6)

Gurgî got, herçend *rîwî birayê kiçke* ye, ema ji me têgeştîtir e, çêtir şolan dizanît.” (Şemdînanî 2021: 64).

Di vê risteya me ya kompleks da *herçend* hevoka çendînyê ye û kiriye ku hevoka nesereke *rîwî birayê kiçke* ye rola hokerîyê di risteyê da werbigire. *ema ji me têgeştîtir e, çêtir şolan dizanît* jî hevoka sereke ye û ji alîyê hevoka nesereke ya hokerîyê ve manaya dijberîyê wergirtiye.

(7)

Wekî *rîwî sê çendan qazanc biket*, ne wekî gurgî xo mezin hesab biket, paşî sere wî bihête şkandin û mejîyê wî bihête înane-der (Şemdînanî 2021: 67).

Di vê mînakê da qiyasek du navbera du hevokan de hene ku bi navgîniya wan risteyeka kompleks saz bûye. Qiyasa *Wekî rîwî sê çendan qazanc biket*, bi hevoka *ne wekî gurgî xo mezin hesab biket, paşî sere wî bihête şkandin û mejîyê wî bihête înane-der* hatiye kirin, ji ber wiha risteyeka kompleks pêk hatiye.

(8)

Herçend bi wî terzî rapor dane emînêt sultanî belê hîç ehemmiyet neda wan, digot, “ewe hemî duro ne, ‘Elî Şamîl bom in rast e.” (Şemdînanî 2021: 221).

Di vê risteyê da bi hokera çendînîyê hevokeka nesereke heyê ku hevoka sereke diyar kiriye. *Herçend bi wî terzî rapor dane emînêt sultanî* hevoka nesereke ye û hevoka sereke *belê hîç ehemmiyet neda wan* ji alîye dijberîyê ve diyar kiriye ku bi vî rengî risteyeka kompleks ku bi hevokeka hokerî saz bûye.

(9)

Meqsûda wî ewe bû ku dilê paşa endêşe kir, edî i’tibara wî çû, Herçî wî wextî gotiba fayde nebû (Şemdînanî 2021: 101).

Di vê risteyê da *herçî* ku hokera çendînîyê ye hevokeka nesereke çêkiriye ku wê jî hevoka sereke diyar kiriye. *Herçî wî wextî gotiba* hevoka nesereke ye û hevoka sereke *fayde nebû* ji alîye dijberîyê ve diyar kiriye ku bi vî rengî risteyeka kompleks ku bi hevokeka hokerî saz bûye pêk hatiye.

(10)

Ema keşkele, egerçî pîs e, belê hemî wext digel me ye, li rahatîyê w zehmetê digel me refîq e, xudan-wefa ye (Şemdînanî 2021: 108).

Di vê risteyê da *egerçî* ku hokera çendînîyê ye hevokeka nesereke çêkiriye ku wê jî hevoka sereke diyar kiriye. *egerçî pîs e* hevoka nesereke ye û hevoka sereke belê hemî wext digel me ye ji alîye dijberîyê ve diyar kiriye ku bi vî rengî risteyeka kompleks ku bi hevokeka hokerî saz bûye pêk hatiye.

3.1.6. Risteyên kompleks ku hevokên hokerî yên rewşê di wan da hene

Van cure risteyên kompleks bi navgînîya hokerên rewşê yanî yên çawanîyê pêk tînin û herwiha bi bestina hevokeka sereke û nesereke tînin bestin. Hevoka hokerî ya rewşê şiroveya bizava hevoka sereke dike ku ka bi çi rengî pêk hatiye (Gültekin, 2020: 55). Di teksta ber destê me da mînak ji bo vê mijarê nehat peyda kirin.

3.2. Risteyên Kompleks ku Hevokên Temamker di Wan da Hene

Hevokên tamamker ew cure hevok in ku bi wesfa hêmanaka risteyê tevdigerin û risteyê bi taybetî jî hevoka sereke ji alîyê mana û binyadê ve têkûz û pênase dikin û bi vî rengî risteyek kompleks pêk tîne. Bi taybetîya xwe ev cure hevok weke hêmana pêveberê di risteyê da bi cî dibe (Gültekin, 2019: 12). Hevoka tamamker ji alîyê manayê ve hevoka sereke tamam dike (Altun Demir, 2020: 40). Bi piranî li dorhêla deqên berdestê me hevokên tamamker di risteyê da bi rola bireserê tevdigerin. Ji bo nimûne:

(1)

Herkes wekî rîwî neşêt xo xilas ket (Şemdînanî 2021: 52).

Dema em li mînaka xwe dînerin dîbînin ku bi binya da xwe ve ji du risteyan pêk hatine. *Herkes wekî rîwî neşêt û xo xilas ket* her yek ji wan bi sere xwe risteyek in. Lê dema ku ev rsite pev hatine bestin *xo xilas ket* ji bo risteya *herkes wekî rîwî neşet xo xilas ket* bûye bireser/berkar û rola hevoka tamamker wergirtîye û herweha bûye pêkhêneke risteyê û ji alîye mana û binyadê ve tesir lê kirîye.

(2)

Ez nedîşiyam tola xwe wekem (Şemdînanî 2021: 70).

Di vê mînakê da bi navgîniya lêkera modal şîyan 'ê hevokeka tamamker saz bûye lewra lêkera *şîyan*'ê lêkereke teper e û *tola xwe wekem* hevoka tamamker e herweha bi manaya xwe rola bireserê wergirtîye û bi vî rengî risteyeke kompleks hatîye darêjtin.

(3)

Em nizanin bo çî paşa hinde 'Îsa xoş diwêt (Şemdînanî 2021: 103).

Di vê mînakê da lêkera pêzanînê zanîn hatîye bikaranîn û ji ber ku li pey xwe hevokeka tamamker *bo çî paşa hinde 'Îsa xoş diwêt* wergirtîye bi navgîniya wê risteyeke kompleks pêk hatîye.

(4)

Lazim e tedbîrekê weto bikey ku kes xiyal neket tu hingûnê xelkê didiz. (Şemdînanî 2021: 121).

Di vê risteya me ya kompleks da hevoka temamker bûye biresera hevoka sereke û wê ji alîyê manayê ve temam kiriye. *tedbîrekê weto bikey* hevoka sereke ye, *ku bingihanek e* û her du hevok pev bestiyê, *kes xiyal neket tu hingûnê xelkê didizî jî* hevoka temamker e û bi rola xwe ya bireserê hevoka sereke têkûz kiriye.

(5)

Hindekan gotin, “ me bihîstiyê canewerek heye rûhan dikêşît (Şemdînanî 2021: 111).

Di vê mînaka me da tercihen bingihaneka ku'yê nehatiye bikaranîn. *me bihîstiyê* hevoka sereke ye, *canewerek heye rûhan dikêşît* hevoka temamker e û bi rola xwe ya bireserê hevoka sereke temam kiriye. Bi bestina hevoka sereke û temamker jî risteyeke kompleks pêk hatiye.

(6)

Ewe aqlê te nîya, ema xozî min zanîba ew aqle kê nişan te daye (Şemdînanî 2021: 54).

Di vê mînakê da lêkera pêzanînê *zanîba* bûye lêkera hevoka sereke. *xozî min zanîba* hevoka sereke ye *ew aqle kê nişan te daye* hevoka temamker e û biresera hevoka serekeye ku bi vê têkilîya nava wan risteyeka kompleks pêk hatiye.

(7)

Çunko xudanê kerî jî weto xiyal dikir ku herdû hewalêt wî dê harî wî ke. (Şemdînanî 2021: 69).

Di vê mînaka me da hevoka temamker bûye biresera risteyê û bi wî awayî ji alîyê avanîyê ve riste kompleks kiriye. *xudanê kerî jî weto xiyal dikir* hevoka sereke ye, *herdû hewalêt wî dê harî wî ken* hevoka temamker e û biresera risteyê ye û *ku jî bingihanek e* ku hevoka sereke û temamker pev bestiyê.

(8)

Ne millete kurd ew hind medeniyet û me'rîfet heye ku rêka husûla metlûba xo bizanin we ne siyasîyûnêt dewletan heta noke himmeta xo bi layê wan de serf kirine w nepirsîne ka bo çî millete kurd di pêş muahrebê da her sal sed eşqiya w qaçaq hebûn şer dikirin digel 'Usmanî dihatine naw Urûsî, ema noke nahên (Şemdînanî 2021: 227).

Mînaka jorê di nava xwe da çend cure risteyên kompleks dihewîne. *Ne millete kurd ew hind medeniyet û me'rîfet heye ku rêka husûla metlûba xo bizanin* risteyeke wiha ye ku ji hevokeka sereke û ya nesereke ya armancî pêk hatiye. *Ne millete kurd ew hind medeniyet û me'rîfet heye* hevoka sereke ye, *rêka husûla metlûba xo bizanin* hevoka nesereke ye û hevoka serek ji alîyê armancê ve diyar kiriye û bingihaneka ku'yê jî herdu cure hevok pev bestiyê ku di encamê da risteyeka kompleks pêk hatiye. Herwiha *siyasîyûnêt dewletan nepirsîne ka bo çî millete kurd di pêş muahrebê da her sal sed eşqiya w qaçaq hebûn şer dikirin digel 'Usmanî dihatine naw Urûsî, ema noke nahên* vê risiteyê jî ji hevokeka sereke û temamker saz bûye. *siyasîyûnêt dewletan nepirsîne* hevoka sereke ye, *ka bingihanek e û bo çî millete kurd di pêş muahrebê da her sal sed eşqiya w qaçaq hebûn şer dikirin digel 'Usmanî dihatine naw Urûsî, ema noke nahên* hevoka temamker ku bi bestina wan risteyeka kompleks pêk hatiye. Dema em bala xwe didine em dibinin ku di heman deme da hevoka temamker bi sere xwe risteyeka kompleks e ku ji hevokên hevseng pêk hatiye. *millete kurd di pêş muahrebê da her sal sed eşqiya w qaçaq hebûn, şer dikirin digel 'Usmanî, dihatine naw Urûsî, ema noke nahên* her yek ji wan hevokan xwedan lêkerekê ye û di heman risteyê da hatine bikaranîn.

(9)

Noke dewleta mexşûş e, wextê wan nîye ku hem şerê dujminî, hem islahî daxilî biken (Şemdînanî 2021: 208).

Di vê risteyê da hevoka temamker rewşa kompleksbûnê saz kiriye. *wextê wan nîye* hevoka sereke ye, *hem şerê dujminî, hem islahî daxilî biken* hevoka temamker e kur ola biresera risteyê wergirtiye û *ku* bingihanek e herdû hevoka pev bestiyê da ku risteyê kompleks saz bibe.

(10)

Ewwel, dibît reîsê wî dînî iddî'a biket ku, "ez ji layê Xudê hatime hinarin bo te'lîma insanan." (Şemdînanî 2021: 147).

Di vê risteya kompleks da hevoeka temamker bûye biresera risteyê. *dibît reîsê wî dînî iddî'a biket* hevoka sereke ye, *ez ji layê Xudê hatime hinarin bo te'lîma insanan* hevoka temamker e û di rola biresera risteyê da ye, herwiha *ku* bingihanek e û herdû hevoka pev gihandiyê. Di encamê vê têkilîya nava wan da risteyê kompleks saz bûye.

(11)

Rojekê wezîrê turkan tedbîr kirin ku tiştekî weto biken 'Elî Şamîl Paşa li nik Sultan Hemîd lekedar bibît (Şemdînanî 2021: 221).

Vê risteya kompleks bi hevoeka temamker ku bûye biresera risteyê saz bûye. *Rojekê wezîrê turkan tedbîr kirin* hevoka sereke ye, *tiştekî weto biken 'Elî Şamîl Paşa li nik Sultan Hemîd lekedar bibît* hevoka temamker e û di rola bireserê da ye. Herwiha *ku* bingihanek e, herdû cure hevok pev bestiyê û di encamê de risteyê kompleks pêk hatiye.

3.2.1. Risteyên kompleks ku hevokên temamker ên lêkerên pêhesînê di wan da hene

Lêkerên mîna dîtî û bihîstinê wekî lêkerên pêhesînê tên binavkirin. Ev cure lêker dema ku li pey wê hevokê temamker were risteyê kompleks pêk tîne (Bûlbûl, 2019: 265).

(1)

Dîtî soneyek di gomê da melewanîyê diket (Şemdînanî 2021: 58).

Di vê mînaka me da *dîtî* lêkera pêhesînê ye û li pey wê hevokê temamker bi rola bireserê *soneyek di gomê da melewanîyê diket* hatiye. Di van cure risteyan da bingihaneke *ku 'yê* hêmanên risteyê pev dibestîne lê di vê mînakê da tercihen nehatiye bikaranîn.

(2)

Dîtî hupopke-silêmanek li ser darekî dixûnît (Şemdînanî 2021: 57).

Di vê mînaka me da *dîtî* lêkera pêhesînê ye û li pey wê hevokê temamker bi rola bireserê *hupopke-silêmanek li ser darekî dixûnît* hatiye. Dîsa bi heman awayî tercihen binighaneke *ku 'yê* nehatiye bikaranîn.

(3)

Gurgî sere xo rakir, dît berxek ji wî pêda awê dixotewe (Şemdînanî 2021: 62).

Vê mînaka risteya kompleks jî bi lêkera pêhesînê ya *dîtî* pêk hatiye ku dê li pey xwe hevokê temamker werbigire. (Gurgî) *dît* hevokê sereke ye, *berxek ji wî pêda awê dixotewe* hevokê temamker e û di rola bireserê da ye. Di risteyê da tercihen bingihanekek nehatiye bikaranîn. Bi bestina van hêmanan ve risteyeke kompleks pêk hatiye.

(4)

Gurgî w rîwî dîtî garana gundeki hate çiyayê wan (Şemdînanî 2021: 64).

Di vê mînaka me ya risteya kompleks da biresera risteyê ji hevokekê pêk tê ku hevoka sereke têtûz dike ji ber hindê jî di rola hevoka tamamker da ye. *Gurgî w rîwî dîtî* hevoka sereke ye, *garana gundeki hate çiyayê wan* hevoka tamamker e û biresera risteyê ye ji ber wê jî hevoka sereke tamam kiriye. Herweha tercihen tu bingihanek nehatiye bikaranîn.

(5)

Hirçê ku dît piling mir hate xarê, neçû (Şemdînanî 2021: 73).

Di vê mînaka me da jî hevokek bi rola bireserê ye û hevoka sereke ya risteya kompleks tamam kiriye. *Hirçê ku dît* hevoka sereke ye, *piling mir hate xarê* hevoka tememker e û hevoka sereke têtûz kiriye, *ku* bingihanek e û her du cure hevok pev bestiyê lê tercihen di nava hevoka sereke de hatiye bikaranîn ne di navbera her du cure hevokan.

(6)

Dît ku şêx digel jina wî suhbet diket, dizanî rast e, ema dîsa çû deng nekir (Şemdînanî 2021: 186).

Li pey lêkera pêhesînê hevokekê tamamker hatiye û rewşa risteya kompleks saz kiriye. *Dît* hevoka sereke ye, *ku* bingihanek e, *şêx digel jina wî suhbet diket* hevoka temameker û biresera risteyê ye. Bi bestina van hêmanan risteya kompleks ava bûye.

(7)

Micêwirê mizgewta şêxê Bicîlê digot, “gelek caran şewê tême mizgewtê, dibînim şêx di mihraba mizgewtê da, we derê mizgewtê daêxistîye, kilil lalî min (Şemdînanî 2021: 187).

Di vê mînakê da ji yên din ne cudatir dîsan lêkera pêhesînê dîtîni hatiye bikaranîn. *dibînim* hevoka sereke ye, *şêx di mihraba mizgewtê da, we derê mizgewtê daêxistîye* jî hevoka tamamker e û biresera risteyê ye. Tercîhen bingihanekek nehatiye bikaranîn. Di encamê da lêkereka kompleks pêk hatiye.

(8)

Wan dît ji xeflet we li hemi qeraxêt gundî oxulmeyêt tifengan hatine wan (Şemdînanî 2021: 187).

Di vê risteyê da *Wan dît* hevoka sereke ye, *ji xeflet we li hemi qeraxêt gundî oxulmeyêt tifengan hatine wan* hevoka tamamker e û biresera risteyê ye. Tercîhen bingihanekek nehatiye bikaranîn. Li pey lêkera pêhesînê dîtîni hevoka tamamker hatiye û di encamê da risteyeka kompleks çê kiriye.

(9)

Wextê çû jor dît jinek meşkê dihişînit (Şemdînanî 2021: 90).

Li pey lêkera pêhesînê hevokek hatiye. *Dît* hevoka sereke ye, *jinek meşkê dihişînit* hevoka tamamker e û biresera risteyê ye. Tercîhen bingihanekek nehatiye bikaranîn. Bi vî rengî risteyeka kompleks pêk hatiye.

(10)

Dîsa bibînim her roj gayekî bixom (Şemdînanî 2021: 119).

Di vê mînakê da *bibînim* hevoka sereke ye, *her roj gayekî bixom* hevoka tamamker e û biresera risteyê ye. Bi awayekî obsîyonel bingihanekek nehatiye bikaranîn. Bi vî rengî di encamê da risteyeka kompleks pêk hatiye.

Di teksta ber destê me da, di çarçoveya mînakên peydakirî ku hevokên temamker û lêkerên pêhesînê digel hev hatine bestin lêkera dîtin'ê bi hejmara xwe gelek in. Wekî ji mînakên jî dixuye hevoka temamker ya ku li pey lêkera pêzanînê hatiye di rola bireserê da ye. Herwiha bikaranîna bingihanekê jî bi awayekî obsiyonel carinan hatine bikaranîn carinan jî nehatine bikaranîn lê digel wê jî manaya risteyê nehatiye guhertin.

3.2.2.Risteyên kompleks ku hevokên temamker ên lêkerên pêzanînê di wan da hene

Lêkerên mîna zanîn, têgehiştin, texmîn kirin, guman kirin, û bawer kirinê wekî lêkerên pêzanînê tên binavkirin. Ev cure lêker dema ku li pey wê hevokeka temamker were risteyeka kompleks pêk tîne (Bülbül, 2019: 265).

(1)

(a) Rîwî ku zanî mar micit e. (Şemdînanî 2021: 51)

(b) Tu nizanî çawa cergê min bo biçûkêt xo disojît. (Şemdînanî 2021: 53)

(c) Em nizanin bo çî paşa hinde 'Îsa xoş diwêt.(Şemdînanî 2021: 103)

Mînakên jorîn (1a) zanî, (1b) nizanî, (1c) nizanin lêkera pêzanînê ye. (1a) mar micit e, (1b) çawa cergê min bo biçûkêt xo disojît, (1c) bo çî paşa hinde 'Îsa xoş diwêt hevokên temamker in ku bi rola bireserê ne û bi navgînîya lêkera pêzanînê rsiteyek kompleks pêk anîne.

(2)

Hewalan weta bawir kirin ku edî çu şêx wekî seyîd hacî rîwî di dunyayê nebûne w nabin (Şemdînanî 2021: 60).

Vê risteya kompleks bi navgînîya lêkera pêzanînê ya *bawir kirin'ê* saz bûye. *edî çu şêx wekî seyîd hacî rîwî di dunyayê nebûne w nabin* hevoka temamker e û bi rola bireserê tevgerîyaye. *Hewalan* kirde ye, *weta* hokera rewşê ye, *ku* bingihanek e û bi vî rengî bi bestina van hêmanan risteyeka kompleks saz bûye.

(3)

Wan weto texmîn kir ku paşa gelek ji wan razî ye (Şemdînanî 2021: 132).

Vê risteya kompleks bi navgînîya lêkera pêzanînê ya *texmîn kirin* 'ê saz bûye. *paşa gelek ji wan razî ye* hevoka tamamker e û bi rola bireserê tevgerîyaye. *Wan* kirde ye, *weto* hokera rewşê ye, *ku* bingihanek e û bi vî rengî bi bestina van hêmanan risteyeka kompleks saz bûye.

(4)

Mela têgeşt ku ewane zor wehşî ne. (Şemdînanî 2021: 112)

Vê risteya kompleks bi navgînîya lêkera pêzanînê ya *têgehiştin* 'ê saz bûye. *ewane zor wehşî ne* hevoka tamamker e û bi rola bireserê tevgerîyaye. *Mela* kirde ye, *ku* bingihanek e û bi vî rengî bi bestina van hêmanan risteyeka kompleks saz bûye.

(5)

Noke jî hatime, digeriyê bizanim kî hez diket biçîte sefera hece, digel min bihêt (Şemdînanî 2021: 56).

Dema ku di risteyekê da li pey lêkera pêzanînê hevokek were risteyeke kompleks pêk tê. *bizanim* hevoka sereke ye, *kî hez diket biçîte sefera hece* hevoka tamamker e, *biresera* risteyê ye û hevoka sereke tamam kiriye.

(6)

Gurgî gote rîwî, “ bere xo bide min da bizanî ka nîşanê şêrî dê peyda bin di min da yan ne (Şemdînanî 2021: 65).

Di vê risteya me da dîsa berî lêkera pêzanînê hevokek di rola bireserê da ye. *bizanî* hevoka sereke ye, *ka* gihanek e, *nîşanê şêrî dê peyda bin di min da yan ne* hevoka tamamker e û biresere hevoka sereke ye û wê tamam kiriye. Ji ber hinde risteyeka kompleks pêk hatiye.

(7)

Nedizani ku rezewani herdu lebandine (Semdini 2021: 69).

Di ve minaka me da lekera pezanine *zani* hatiye bikaranin. *Nedizani* hevoka sereke ye, *rezewani herdu lebandine* hevoka tamamker e u rola biresera risteye wergirtiye u *ku* ji bingihanek e ku hevoka sereke u tamamker pev bestiye. Di encame ve bestine da risteyeke kompleks ku bi hevoka tamamker u lekereka pezanin ava buye pek hatiye.

(8)

Ez ho selah u munasib dizanim em pirsekê bi cenabê qunsul u bi cenabê Duktur Set bikeyn (Semdini 2021: 208).

Di ve minake da lekera pezanine *zani* hatiye bikaranin u buye lekerea hevoka sereke. *Ez ho selah u munasib dizanim* hevoka sereke ye, *em pirsekê bi cenabê qunsul u bi cenabê Duktur Set bikeyn* hevoka tamamker e u rola biresera risteye wergirtiye. Tercihen di ve risteye da bingihanek nehatibe bikaranin ji herdû hevok bi tesira pewendê pev hatine bestin.

(9)

Zani ku edi Teto çu penah neman u Suto mulaheze kir (Semdini 2021: 208).

Ve risteya kompleks ji bi lekereka pezanine u hevoka tamamker saz buye. *Zani* hevoka sereke ye, *edi Teto çu penah neman* hevoka tamamker e u ji risteya kompleks ra buye bireser. Herwiha *ku* bingihanek e ku hevoka sereke u tamamker pev girêdaye da ku encama risteyeka kompleks pek were.

(10)

Ez jî dizanim ku bê delîl nabît (Şemdînanî 2021: 149).

Vê risteyê bi hevoka temamker rewşa kompleksbûnê wergirtiye. Di risteyê da lêkera pêzanînê *dizanim* hatiye bikaranîn. *Ez jî dizanim* hevoka sereke ye, *bê delîl nabît* hevoka temamker e û rola biresera risteyê wergirtiye. Bingihaneka *ku'yê* jî herdû hevoka pev bestiyê.

(11)

Ez *texmîn dikem* ku tu dê *dumayê min* teslîmî destê Romîyan key (Şemdînanî 2021: 182).

Wekî dixuye bi lêkerekê pêzanînê *texmîn kirin* di vê risteye da heye. *Ez texmîn dikem* hevoak sereke ye, *tu dê dumayê min* teslîmî destê Romîyan key hevoka temamker e ku bûye biresera risteyê. Bingihaneka *ku'yê* jî hevok pev bestiyê. Di encamê da risteyeka kompleks pêk hatiye.

3.2.3. Risteyên kompleks ku hevokên temamker ên lêkera vegotinê di wan da hene

Di risteyekê da heger gotina kesekî din bi hatibe veguheztin ji ber ku ew gotin wekî hêmanakê risteyê bi cî dibe û rola biresere werdigire gotine wergirtî dibe hevokeke temamker û bi vî rengî risteyeke kompleks pêk tê (Bülbül, 2019: 265). Axêver anku veguhêz bi du şêweyan van gotine vediguhêze. Di yekê da veguhêz bi awayekî yekser gotina wergirtî vediguhêze ku em jê ra dibêjin veguhestina rasterast di ya dinê da jî bi awayekî neyekser vediguhêze ku jê ra jî tê gotin veguhestina nerasterast. Ev her du şêwe jî di risteyê da karê bireserê dikin û risteyek kompleks pêk dihînin. Di temamê tekstên me da nimûneyên vegustina rasterast û ya nerasterast gelekî xurt in ji ber ku nivîskarê kitêba berdest ya ku em liser dixebitin kesekî vuguhêz e ji bo sefirê Rûsyayê Basîl Nîkîtîn.

3.2.3.1. Hevokên temamker ku lêkera vegotinê ya veguhestina rasterast di wan da hene

Di vê cureyê da axêver anku veguhêz beyî ku destwerdanê bi gotina kesê xîyabî bike bi awayê wergirtî dibêje (Bûlbûl, 2019: 265). Ji bo nimûne:

(1)

Rezewanî gote xudanê hespî, “tu teşrîf ke, here mal, rûnê (Şemdînanî 2021: 70).

(2)

Elî Beg got, “bes e zadî bînin, da bixoyin.” (Şemdînanî 2021: 147).

(3)

Gul Muhammed got, “suphanellah, ez te’eccub dikem ji ‘ilm û me’rifeta te, çawa heta noke te ew delîl fam nekirîye.” (Şemdînanî 2021: 149).

(4)

Got “ez halê xo elbette ji hingo çêtir dizanim.” (Şemdînanî 2021: 163) .

(5)

Rîwî çû, got, “çak e biçim, hîleyekê li qelê bikem, belkî tola xo jê wekem” (Şemdînanî 2021: 54).

Wekî ku ji mînakên me jî dîyar in veguhêz beyî destwerdanekê, gotin çawa bihîstîbe yan jî xwendibe wiha veguheztîye. Veguhestina rasterast bi lêkera “gotin”ê çê dibe. Di mînakên (1, 2, 3, 4’yê) da *tu teşrîf ke, here mal, rûnê, bes e zadî bînin, da bixoyin, suphanellah, ez te’eccub dikem ji ‘ilm û me’rifeta te, çawa heta noke te ew delîl fam nekirîye, ez halê xo elbette ji hingo çêtir dizanim , çak e biçim, hîleyekê li qelê bikem, belkî tola xo jê wekem* hevokên temamker in û hemû bi rola bireserê tevgerîyane, hevoka beriya xwe ya sereke temam kirine û ji ber hindê jî risteyeke kompleks pêk anîne.

(6)

Mirowek hat, hêdî gote min, “Mîrza Hesên millet du-qet niwîsîye.” (Şemdînanî 2021: 210).

Di vê mînaka me da *hêdî gote min* hevoka sereke ye, *Mîrza Hesên millet du-qet niwîsîye* hevoka temamker e û biresera risteya kompleks e. Wekî ji mînakê dixuye veguhêz rasterast gotin guhêztiye û li pey lêkera vegotinê hevoka temamker hatiye û bi rola xwe ya bireserê hevoka sereke temam kiriye.

(7)

Derwêş ‘Elî got, “cewaba wihê gelek bi senayî ye, emma ditirsim cenabê muctehîd ‘aciz bibît, çunko weto iqtîza diket hindek xeberêt kirêt bihêne gotin.” (Şemdînanî 2021: 141).

(8)

Derwêş ‘Elî ewwelen pîçek kenî, paşî got. “Subhanellah ez gelek te’eccube dikem ji ‘ilm û fezla cenabê aqayê Muctehîd û ji l’îmadada wî li ser wan terze delîlane ku ji tewnê dapîroşkê sisttir in (Şemdînanî 2021: 140).

(9)

Derwêş ‘Elî got, “belê, bi dew bi senayî ye bêjim ez bûme şî’e, ema ji mezhebê xo çûn bo mezhebekî dî bê delîlekî muhkem û aşkera mumkin nîye dil bawir biket (Şemdînanî 2021: 136).

(10)

Muctehîd got, “elbette di guftugoya mezhebî da zêdetir azadîya kelam lazim e, e-illa heqqaniyet aşkera nabît (Şemdînanî 2021: 136).

Wekî ji mînakên jorê jî dixuyên di her yekê da lêkera vegotinê ya veguhestina rasterast heye. Her yek ji aliyê axêverê xwe ve çawa hatibe gotin, beyî destwerdanekê yekser hatiye veguhestin. Li pey lêkera vegotinê îja gotinên axêver hatiye ku ew jî bûye hevoeka temamker û rola biresera risteyê wergirtiye. Bi vî rengî di encamê da risteyeka kompleks pêk hatiye.

3.2.3.2. Hevokên temamker ku lêkera vegotinê ya veguhastina nerasterast di wan da hene

Di vê cureyê da axêver anku veguhêz u destwerdanê bi gotina kesê xîyabî dike û bi awayê wergirtî nabêje (Bülbül, 2019: 265). Ji bo nimûne:

(1)

Dibêjin carekê sê kes çûne karwanî, yekî hebû hesp, yekî hêstir, yekî ker. (Şemdînanî 2021: 69).

(2)

Dibêjin carekê mirowekî Paweyî hate layê Somayê û biradost û Kuresnîyan, xo kiribû şêx (Şemdînanî 2021: 78).

(3)

Dibêjin axayê Zerzan kiçekê gelek çak heye (Şemdînanî 2021: 151).

(4)

Dibêjin paşî çend salan carekê Perîxan zîz bû, ji qelatê derkewt, rêka Zînî girt ku biçîte mala babê xo (Şemdînanî 2021: 153).

Wekî ku ji mînakên me jî dîyar in veguhêz ji hin kesan bihîstîye ku gotin weha ye û bi şêwaza xwe veguheztîye. Veguhastina nerasterast bi lêkera “*gotin*”ê ya halê tewandî *dibêjin*’ê çê dibe. Di mînakên (1, 2, 3, 4’yê) da *carekê sê kes çûne karwanî, yekî hebû hesp, yekî hêstir, yekî ker, carekê mirowekî Paweyî hate layê Somayê û biradost û Kuresnîyan, xo kiribû şêx, axayê Zerzan kiçekê gelek çak heye, paşî çend salan carekê Perîxan zîz bû, ji qelatê derkewt, rêka Zînî girt ku biçîte mala babê xo* hevokên temamker in û hemû bi rola bireserê tevgerîyane hevoka beriya xwe ya sereke temam kirine û ji ber hindê jî risteyeke kompleks pêk anîne.

(5)

Dibêjin nêçîrwanekî zor çak li naw ‘eşîreta Mizûrî Jorîyan hebû, nawê wî Silêman Bazîd bû (Şemdînanî 2021: 73).

Wekî ji mînaka jorê jî dixuyê di vê risteya kompleks da vegotineka nerasterast heye. Veguhêz agahî ji hinan wergirtiye ji ber hindê riste bi lêkera *dibêjin* dest pê kiriye. Dibêjin hevoka sereke ye û *nêçîrwanekî zor çak li naw ‘eşîreta Mizûrî Jorîyan hebû, nawê wî Silêman Bazîd bû* hevoka temamker e û biresera risteyê ye û di heman demê da hevoka sereke temam kiriye. Bi vî rengî risteyeka kompleks saz bûye.

(6)

Dibêjin wextê ku li silêmanîyê muderris bû, Şêx ‘Ebdulla Dehalwî bi sûretê derwêşî di xewnê dît, nezani kî ye (Şemdînanî 2021: 163).

(7)

Begê Rewandizê dibêjin ewladê mirowekî ‘ereb in, ji naw ‘Erebê Şemer hat, çend salan li deşta Rewandizê, li gundê Badilyan û Bapîştîyan şuwani w gawanî kir (Şemdînanî 2021: 191).

(8)

Dibêjin wextekê ji ‘eşîreta Zêbarîyan mirowekî gelek mêrçak hebû, nawê wî Silêman bû (Şemdînanî 2021: 86).

(9)

Dibêjin carekê mirowekî Telî çû nawa rezê xo, çû bin dara hijîrê, temaşa kir hijîrekê geheştî bi tayê hijîrê we (Şemdînanî 2021: 93).

Dema em bala xwe didin mînakên jorê 6, 7, 8 û 9. Em dibînin ku hemû bi lêkera vegotinê pêk hatine û veguheztina nerasterast pêk anîne. Veguhêz rewş û bûyera risteyê ji hin kesan bihîstiyê û bi şewaza xwe vegotiyê. Li pey lêkera vegotinê *dibêjin* hevokên temamker hatine ku di rola bireserê da ne. Di encamê wê da risteyên kompleks pêk hatine.

(10)

Dibêjin carekê xulamêt Smail paşa di naw xo da gotin, “em nizanin bo çî paşa hindê ‘Îsa xoş diwêt. Ew ne ji me eslîtir e w ne ji me lawtir e w ne ji me mêrçaktir e, xulase bi çî terzan ji me zêdetir nîye (Şemdînanî 2021: 103).

Di vê mînakê da lêkera vegotinê ya veguheztina rasterast û nerasterast di heman risteyê da cî girtine. *Dibêjin* lêkera vegotinê ye, *carekê xulamêt Smail paşa di naw xo da gotin* hevoka temamker e, biresera risteyê ye û ji aliyê veguhêz ve nerasterast hatiye vegotin. Herwiha *gotin* jî lêkera vegotinê ye *em nizanin bo çî paşa hindê ‘Îsa xoş diwêt. Ew ne ji me eslîtir e w ne ji me lawtir e w ne ji me mêrçaktir e, xulase bi çî terzan ji me zêdetir nîye* hevoka temamker e, biresera risteyê ye û ji aliyê veguhêz ve bi awayekî rasterast hatiye vegotin. Di encamê de du risteyên kompleks pêk hatine ku vegotina rasterast cî di nava vegotina nerasterast da girtiye.

3.2.4. Hevokên temamker ku lêkerên modal di wan da hene

Lêkerên modal anku lêkerên alîkar ên wekî xwastin/hez kirin, karîn/şîyan, vîn bi bikaranîna xwe risteyeka sade dike risteyeka kompleks. Lêkerên modal bi rola hevoka sereke tevdigerin û ku biresera risteyê jî ji hevokekê pêk were bireser jî bi rola hevokeka temamker tevdigere (Bülbül, 2019: 265-266).

(1)

Ez nedişiyam tola xwe wekem (Şemdînanî 2021: 70).

Di vê risteya me da lêkera modal a *şîyan*’ê bi awayê xwe yê kişandî *nedişiyam* hatiye bikaranîn û hevoka sereke ye. Wekî biresera risteyê “*tola xwe wekem*” jî hevokeka temamker e û bi bestine wê ya hevoka sereke ra risteyeka kompleks saz bûye.

(2)

We ye Xudê her tiştî dişê biket (Şemdînanî 2021: 119).

Di vê mînakê da jî bi awayê xwe yê kişandî *dişê* lêkera modal ya şîyan'ê hatiye bikaranin. Herçend hevoka temamker wekî *her tiştî biket* be jî lêkera şîyanê ketîye nava hevoka temamker. Em dikarin vê risteyê wiha analî bikin: *Xudê dişê* hevoka sereke ye, *her tiştî biket* jî hevoka temamker ê û bi rola bireserê tevgerîyaye. Bi bestina van her du hevoka risteyek kompleks saz bûye.

(3)

Ew kesê hind li nik Xudê bi qedr û hurmet bît sifrê ji esamnî bo bihinêrît û ji xeybî xorakî bidetê elbette dişê du'ayekê weto biket, her roj himbanekê herzinî bo te ji Xudê bixazît û hîç şubhe nîye dema min xast dê det (Şemdînanî 2021: 57).

Di vê risteya kompleks û dirêj da dîsa lêkera modal şîyan bi awayê kişandî hatiye bikaranîn û li pey wê du hevokên temamker hatine ku bi bestina wan risteyeka kompleks pêk hatiye. *Dişê* hevoka risteyê ye, *du'ayekê weto biket û her roj himbanekê herzinî bo te ji Xudê bixazît* du hevokên temamker in û biresera risteyên e ku her wiha hevoka sereke ji aliyê manayê ve têkûz kirine.

(4)

Zor hez dikir ew jî wekî rîwî hat-û-çûnê biket, çu çare nedît (Şemdînanî 2021: 51).

Di vê risteya kompleks da jî yên din cudatir lêkera modal hez kirin bi manaya xwe xwastinê bi awayê xwe yê kişandî hatiye bikaranîn û li pey wê jî hevoka temamker hatiye. *Zor hez dikir* hevoka sereke ye *ew jî wekî rîwî hat-û-çûnê biket hevoka temamker e û di rola biresera risteyê da ye.*

(5)

Nedişiya li bazeberî derbaz bibît (Şemdînanî 2021: 51).

Di vê mînakê da dîsa wekî gelek nimûneyên ber destê me bi lêkara şiyane risteyeka kompleks hatiye sazkirin. *Nedişiya* hevoka sereke ye, *li bazeberî derbaz bibît* hevoka tamamker û bireser e û ji ber hinde hem hevoka sereke tamam kiriye hem jî risteyeka kompleks.

(6)

Ji rêwe kolare hate pêş, got, “ zerera min ewe ye, wextê mirîşkê wan cûcikan diînîne der, ez heta bişêm dibem, dixom (Şemdînanî 2021: 49).

Di vê mînakê da *ez heta bişêm* hevoka sereke ye ku lêkera wê lêkereka modal e û du hevokên wê yên tamamker hene: *dibem* û *dixom*. Ku bi vî awayî risteyeka kompleks saz bûye. Di vê mînakê da jî yek ji taybetîyê nivîskarê teksta ber destê me xwe nîşan dide ku dikare çendîn cureyên risteyên kompleks di heman risteyê da bihewîne. *wextê mirîşkê wan cûcikan diînîne der* hevoka nesereke ye û bi hokera demê ya *wextê* hatiye sazkirin û *dixom* jî hevoka sereke ye. Xala taybet di vê risteyê da ew e ku *dixom* di heman risteyê da hem rola xwe ya hevoka tamamker heye hem jî hevoka sereke.

(7)

Zor hez dikem tu jî zehmetê bikêşî, bihêy da wêkra biçîn (Şemdînanî 2021: 58).

Vê mînaka risteya kompleks jî ji aliyê avaniya xwe ve cuda ye lewra hem hevokeka tamamker ku bi lekereka modal saz bûye di risteyê da heye hem jî hevokeka nesereke ya armancî. *Zor hez dikem* hevokeka sereke ye bi lêkera modal xwestinê ku hevmanaya wê *hez kirin* e, saz bûye. *tu jî zehmetê bikêşî, bihêy* jî hevoka tamamker e ku di rola biresera hevoka sereke da ye ku bi vî rengî risteyeka kompleks saz bûye. Herwiha *Zor hez dikem tu jî zehmetê bikêşî, bihêy* hevoka sereke ye, *wêkra biçîn* hevoka nesereke ye û ji ber ku bi bingihaneka *da`yê* pev hatine bestin û hevoka nesereke ji aliyê armancê ve hevoka sereke diyar kiriye û wesifandiye dîsa risteyeka kompleks pêk hatiye.

(8)

Ez hez dikem serfî nezer bikeyn ji dujminîya wan (Şemdînanî 2021: 175).

Di vê mînakê da lêkereka modal hez kirin hatiye bikar anîn. *Ez hez dikem* hevoka sereke ye, *serfî nezer bikeyn ji dujminîya wan* hevoka tamamker e û biresera risteyê ye. Di vê risteyê da tercihen bingihanekek nehatiye bikaranîn û di encamê da risteyeka kompleks pêk hatiye.

(9)

Ewe serê zistanê ye, neşêyn bo çi cîyan bihelêyn (Şemdînanî 2021: 178).

(10)

Sefwet Beg bi wê cewabê ‘eciz bû, ema neşîya bêemrîya Fazil Paşa biket (Şemdînanî 2021: 176).

Di minakên jorê yên 9. û 10. lêkera modal şîyan hatiye bikaranîn. *Neşêyn û neşîya* lêkerên modal in û hevokên sereke ne. *bo çi cîyan bihelêyn û neşîya bêemrîya Fazil Paşa biket* hevokên tamamker in û her yek biresera risteya xwe ye. Tercihen ti bingihanekek nehatiye bikaranîn û di encamê da risteyeka kompleks ku bi hevoka tamamker ava bûye pêk hatiye.

3.2.5. Hevokên tamamker ku lêkerên manîpulatif di wan da hene

Manîpulatif bi manaya xwe ya ferhengê ji bo kesên ku ya hişê xwe bi hinekan didin kirin, ku hinekan didin ber bayê xwe, herwiha ji bo kesên liştok û fenok tê gotin. Bi manaya xwe ya rêzimanê jî wiha ye lewra hin lêkerên mîna *kirin, hiştin û xwestinê*, ne bi manaya xwe ya sereke bi manaya xwe ya duyem tînin bikaranîn ji bo manîpulekirinê. Lêkerên manîpulatif risteyên aloz pêk tînin. Di risteyên ku lêkerên mîna *kirin, hiştin û xwestinê* hene ew bi awayekî manîpulatif tînin bikaranîn û du pêkhênên sereke hene ku yek jê manîpuleker e ya din jê manîpuleber e û manîpuleker tevgera manîpuleber manîpule dike (Bülbül, 2017: 122). Herwiha lêkerên mîna *rica kirin, hêvî*

kirin û misaide kirin jî lêkerên manîpulatîf in (Bûlbûl, 2017: 124, 125). Di teksta ber deste me da mînak ji bo risteyên aloz yên ku bi lêkerên manîpulatîf saz dibin li jêr in.

(1)

Hafizî digot, “sofi w jina xo ho digel min kirin da pare min bixon (Şemdînanî 2021: 114).

Vê risteya aloz ku bi hevokeka temamker saz bûye lêkera manîpulatîf *kirin* hatiye bikaranîn. *sofi w jina xo* manîpuleker in, *min* ango *Hafiz* manîpuleber e *pare min bixon* hevoka temamker e.

(2)

Wextê taste hat, xulamek ç, gazî kire maqûlêt Mizûriyan gotê, “werin, paşa hingo dixazît da teştê bixoyî.” (Şemdînanî 2021: 132).

Vê risteya aloz ku bi hevokeka temamker saz bûye lêkera manîpulatîf *xwestin*, *xastin* hatiye bikaranîn. *paşa* manîpuleker e, *maqûlêt Mizûriyan* manîpuleber e *teştê bixoyî* hevoka temamker e.

(3)

Zabitî got, “ez dê derkewim, paşî bila bêjît. Şêx gotî, “ nahêlim derkewî heta temam ehwalê hafiz dibêjît.”(Şemdînanî 2021: 113).

Vê risteya aloz ku bi hevokeka temamker saz bûye lêkera manîpulatîf *hiştin*, hatiye bikaranîn. *Şêx* manîpuleker e, *Zabitî* manîpuleber e *heta temam ehwalê hafiz dibêjît* hevoka temamker e.

(4)

Kotrê got, “ewê çûy çû, emma eger tu bizanî çareyekê bikey da sala têt nehêlîn wê zererê li min bidet. (Şemdînanî 2021: 53).

Vê risteya aloz ku bi hevokeka temamker saz bûye lêkera manîpulatîf *hiştin*, hatiye bikaranîn. *Kotrê* ango *tu* manîpuleker e, *ew* manîpuleber in *wê zererê li min bidet* hevoka temamker e.

(5)

Rîwî got, “wextê ku ez û tu wêkra digeriyan gelek mehebbeta min hebû derheq çawêt te. Eger te hind musa’ede kiriba, pîçek stûkira xo kêşeba pêş çawêt min û carekê dîdi pêş mirina xo damin çawêt te dîtibana paşî bila ez miribam da di dilê min da nebîte keser (Şemdînanî 2021: 52).

Vê risteya aloz ku bi hevokeka temamker saz bûye lêkera manîpulâtîf *musa’ede kirin* hatiye bikaranîn. Rîwî manîpuleker e, *te* manîpuleber e, *pîçek stûkira xo kêşeba pêş çawêt min û carekê dîdi pêş mirina xo damin çawêt te dîtibana* hevoka temamker e.

(6)

Em hîwî dikeyn ewro paşa sebr biket, muhlet bidet, paşî, eger heta sube paşa ma li ser wê fikre, em dê şkinîn (Şemdînanî 2021: 103).

Vê risteya aloz ku bi hevokeka temamker saz bûye lêkera manîpulâtîf *hêvî kirin*, hatiye bikaranîn. *Em* manîpuleker e, *paşa* manîpuleber e *sebr biket, muhlet bidet* hevoka temamker e.

(7)

Xelkê gote wî, “ em hîwî dikeyn car-baran teşrîfa mubareka zatê hingo derkewin, da hemî kes bi dîtina wucûda mes’ûd a ‘alî xudan, feyz û bereket bibît.” (Şemdînanî 2021: 86).

Vê risteya aloz ku bi hevokeka temamker saz bûye lêkera manîpulâtîf *hêvî kirin* hatiye bikaranîn. *Em* manîpuleker e, *wî* manîpuleber in *car-baran teşrîfa mubareka zatê hingo derkewin* hevoka temamker e.

(8)

Şêx newêra biçît, helat, hate Nehrîyê lalî Şêx Muhemmed Siddîq, got, “hîwî dikem tedbîrekî li halê min bike.” (Şemdînanî 2021: 188).

Di vê mînakê da dîsa bi lêkera manipulafê *hêvî kirin* û hevokeka temamker risteyeka kompleks saz bûye. *Şêx* manîpuleker e, *Şêx Muhemmed Siddîq* manîpuleber e, *hîwî dikem* hevoka sereke ye, *tedbîrekî li halê min bike* hevoka temamker e û biresera risteyê ye.

(9)

Em rica dikeyn dewleta ‘elîye bi lutf û merhemeya xwe me ‘efû biket (Şemdînanî 2021: 179).

(10)

Em gelek rica dikeyn Fazil Paşa ji cîyê me raken, me’mûrekî xêrxaz, bêxerez, xudan-merhemet bihinêrine Barzanê, şahide halê me bît (Şemdînanî 2021: 179).

Di van herdû mînakên da *Em* manîpuleker in *dewleta ‘elîye* manîpuleber e. *Em rica dikeyn û Em gelek rica dikeyn* hevokên sereke ne. *dewleta ‘elîye bi lutf û merhemeya xwe me ‘efû biket û Fazil Paşa ji cîyê me raken, me’mûrekî xêrxaz, bêxerez, xudan-merhemet bihinêrine Barzanê, şahide halê me bît* hevokên temamker in û herdû jî bireserên risteya xwe ne. Di encamê da bi lêkerek manîpulatîf û hevoka temamker risteyeka kompleks pêk hatiye.

3.3. Risteyên Kompleks ku Hevokên Navberî di Wan da Hene

Hevokên navberî anku parenthetical clause ew cure hevok in ku manaya risteyê xurt û zelal dike lê dema ji risteyê werin veqetîn tiştek ji manaya risteyê kê nabe. Hevokên navberî weke ji navê xwe jî diyar e dikeve nava risteyê û agahîyekê li ser risteyê dide. Hevokên navberî di nava risteyê da bi bêhnok an jî xêzîka axaftinê tên diyarkirin. Dema di risteyekê da hevokeka navberî hebe risteyeka kompleks saz dibe. (Bülbül, 2019: 267). Di texta ber destê me da nimûne ji bo hevokên navberî nehatin peydakirin.

3.4. Risteyên Kompleks ku ji Hevokên Hevseng Pêk Tê

Bi rêya hevokên hevseng jî risteyê kompleks saz dibin. Dema du hevok bi gihanekekê yan jî bi xalbendîyekê bi hevdû werin bestin jê ra hevoka hevseng anku hevoka serbixwe tê gotin (Bülbül, 2019: 267). Piranî bi gihanekên mîna *û, lê(ema), egerne, ne ...ne .., ya .. ya ..* çê dibin yan jî bi bêhnokekê li pey hev rêz dibin.

(1)

Gurgî serê xo rakir, dît berxek ji wî pêda awê dixotewe (Şemdînanî 2021: 63).

Di vê risteya kompleks da du risteyên serbixwe, yek jê risteyeke sade *Gurgî serê xo rakir* ya dinê risteyeke kompleks *dît berxek ji wî pêda awê dixotewe* bi bêhnokekê hatine bestin. Ev her dû hevok hevseng in û pevbestina wan risteyeke kompleks saz kirîye. Herwiha kirdeya her dû hevokan *Gurgî hevbeş* e. ji bilî wê di risteya *dît berxek ji wî pêda awê dixotewe* da tercîhen bingihanekek nehatîye bikaranîn.

(2)

Hez kir bixot, ema di dilê xo da fikr kir (Şemdînanî 2021: 62).

Di vê nimûneya me da bi gihaneka *emaéyê* du risteyên sade pev hatîye girêdan. Her yek ji wan hevokeka hevseng e anku serbixwe ye û bi bestina wan risteyeka kompleks saz bûye.

(3)

Hez bikem dê te xom, hez bikem dê te 'efû kem (Şemdînanî 2021: 62).

Di vê nîmûneyê da jî du hevokên hevseng hene: *Hez bikem dê te xom û hez bikem dê te 'efû kem*. Her du jî bi gihaneka *hez bikem* pev hatine bestin û bi vê boneyê risteyek kompleks pêk anîne hole.

(4)

Gotin, "baş e, ema ewe dê çawa mumkin bît em malê wî bibeyn û ew neşêt biaxiwît? (Şemdînanî 2021: 99).

Di vê nimûneya me da çar hevokên serbixwe anku hevseng hene ku dudu jê bi bêhnokê, duduyê din jî bi gihaneka û'yê pev hatine bestin û risteyeke kompleks pêk anîne. *baş e* û *ema ewe dê çawa mumkin bît* du hevokên hevseng in û bi bêhnokê hatine bestin. *em malê wî bibeyn û ew neşêt biaxiwît?* ew jî du hevokên hevseng in û bi gihaneka û'yê hatine bestin.

(5)

Wextê hate jûr, solêt xo helgirtin, îrane naw meclîsê, li ber xo danan (Şemdînanî 2021: 141).

Di vê risteya kompleks da çar hevokên hevseng hene. *Wextê hate jûr, solêt xo helgirtin, îrane naw meclîsê û li ber xo danan*. Ev her çar hevokên hevseng bi bêhnokekê ji hev hatine cudakirin lê ji ber ku ji aliyê konteksê ve dewama hevdû ne bi bestina wan risteyeka kompleks pêk hatiye.

(6)

Dibêjin mirowekî gelek bîaqil bû, zor sexî w xuda mêwan û xudan kerem û ihsan bû. (Şemdînanî 2021: 146).

Vî risteya kompleks bi du hevokên hevseng saz bûye. Wekî ku dixuye herdû hevok bi bêhnokekê ji hev hatine veqetandin.

(7)

Rojekê gote xulmaêt xo, “keyfa min diînit koçekan, melan gazî bikem, herduyan rûbirûyê yêkudu bikem, di mabeyna wan da bikime cedele (Şemdînanî 2021: 146).

Vî risteya kompleks bi çar hevokên hevseng saz bûye. Wekî ku dixuye her çar hevok bi bêhnokan ji hev hatine veqetandin.

(8)

Şêx Hadî emr kiriye, “paşî mirina min melekek dê xo nîşa tabî’êt min det û koçek dê hemî rojan bibînin û ‘erş û kursîyan û ga w masîyan, hemî ‘esmanan dê nîşa wan det (Şemdînanî 2021: 146).

Vî risteya kompleks bi sê hevokên hevseng saz bûye. Wekî ku dixuye her sê hevok bi gihaneka *û’*yê ji hev hatine veqetandin.

(9)

Zewî ji zemanê bab û bapîran di destê Şerîf da bû, çû wextan Gul Muhammed teserrufa wê zewîyê nekiribû. (Şemdînanî 2021: 149).

Vî risteya kompleks bi du hevokên hevseng saz bûye. Wekî ku dixuye her du hevok bi bêhnokekê ji hev hatine veqetandin.

(10)

Herzalekê bilind jî çêkirî bû, Oso w jina xo li ser herzalê diniwistin, kurêt wî w mala wî jî dikepra binî da bûn (Şemdînanî 2021: 154).

Vî risteya kompleks jî bi sê hevokên hevseng saz bûye. Wekî ku dixuye her sê hevok bi bêhnokekan ji hev hatine veqetandin.

3.5. Risteyên Kompleks ku Hevokên Pêwendîyê di Wan da Hene

Hevokên pêwendîyê yek ji wan cure hevokan e ku risteyeka kompleks pêk tîne. Hevoka pêwendîyê di nava risteyê da pêkhêneka risteyê yên mîna biker, bireser û hokerê diwesifîne (Bülbül, 2016: 24-25). Hevoka pêwendîyê hêmaneka risteyê terîf dike û ev hêman dibe biker, bireser ya jî hoker be. Dibe ku hevoka pêwendîyê gelek hêmanan tarîf bike lê ya mihîm ew e ku ev hevok di kîjan risteyê da cî bigire wê dike risteya kompleks (Altun Demir, 2020: 49). Herwiha di van cûre risteyên kompleks da tercîhen bingihaneka ku'yê tê bikaranîn.

(1)

Xudê dê me 'efû ket bo xatira Imam Huseyn, ku dile me gelek bo wî disojît (Şemdînanî 2021: 139).

Di vê mînak me da hevoka pêwendîyê hokera risteyê wesifandîye. *Xudê kirde ye, me berkar e, dê 'efû ket pêveber e, bo xatirê Imam Huseyn hoker e, ku bingihanek e û dile me gelek bo wî disojît* hevoka pêwendîyê ye û hokera risteyê *bo xatirê Imam Huseyn* modîfiye kirîye.

(2)

Ew me'aşe weto hatibû te'yîn kirin ku paşî wan bo nesla wan çu wextan nehête birrîn (Şemdînanî 2021: 118).

Di vê mînaka me da hevoka pêwendîyê berkara risteyê wesifandîye. *Ew me'aşe* berkar e, *weto* hoker e, *hatibû te'yîn kirin* pêveber e, *ku* bingihanek e *paşî wan bo nesla wan çu wextan nehête birrîn* hevoka pêwendîyê ye û berkara risteyê *Ew me'aşe* wesifandîye.

(3)

Belê heceteke weto neîna ku bikewîte 'eqlê ehlê siyaset (Şemdînanî 2021: 62).

Di vê mînaka me da hevoka pêwendîyê berkara risteyê wesifandîye. *heceteke* berkar e, *weto* hoker e, *neîna* pêveber e, *ku* bingihanek e *bikewîte 'eqlê ehlê siyaset* hevoka pêwendîyê ye û berkara risteyê *heceteke* wesifandîye.

(4)

Eger sa'etekê pêştîr hung nexoşîya xo bi hekîmêt hazîq û xêrxaz derman neken mîkrobê cehalete w sefraê sefahetê, ku ji zemanê bab û bapîran dewê xo di qelb û cegerê hingo naye, pîçek maye hingo bikujît (Şemdînanî 2021: 230).

Di vê nimûnê da hevoka pêwendîyê kirdeya risteyê modîfîye kiriye. *mîkrobê cehalete w sefraê sefahetê* kirde ye, *ku* bingihanek e *ji zemanê bab û bapîran dewê xo di qelb û cegerê hingo naye* hevoka pêwendîyê ye û bikera risteyê ji alîyê çawanîyê ve rave kiriye, *pîçek maye* hoker e, *hingo* berkar e *û bikujît* pêveber e. Bi vî rengî risteyeka kompleks saz bûye.

(5)

Madam hingo ewe nedît û nezanî bes çawa hung ‘erş û kursîyan dibînin ku ji hemî ‘esmanan pêhel in we çawa ga w masîyan dibînin ku ji hemî ‘erdî pêda ne? (Şemdînanî 2021: 148).

Di vê risteye kompleks da ku bi du hevokên pêwendîyê saz bûye *hung kirde ye, ‘erş û kursîyan berkar e, dibînin pêveber e û ku bingihanek e ji hemî ‘esmanan pêhel in* jî hevoka pêwendîyê ye ku berkara risteyê ji aliyê çawanîya wê rave kiriye. Herwiha *hung kirde ye, ga w masîyan berkar e, dibînin pêveber e û ku bingihanek e ji hemî ‘erdî pêda ne* jî hevoka pêwendîyê ye ku berkara risteyê modîfiye kiriye.

(6)

Dibêjin zemanê beget Mîrsewdînan, ku hukumdarî dikirin li ser ‘eşairê etrafê Amêdîyê, Sadiq Beg hebû, li Amêdîyê dirûnişt, mîr bû w gelek mirowekî xurt bû (Şemdînanî 2021: 134).

Di vê mînakê da hevoka pêwendîyê hokera risteyê ji aliyê raveyê ve modîfiye kiriye. *zemanê beget Mîrsewdînan* hoker e, *ku bingihanek e, hukumdarî dikirin li ser ‘eşairê etrafê Amêdîyê* hevoka pêwendîyê ye û hokera risteyê modîfiye kiriye, *Sadiq Beg kirde û hebû* pêveber e.

(7)

Dibêjin zemanê Smail Paşayê Amêdîyê, ku texmîn sed û pênce sal heye, çu hukûmet li naw ‘eşairê kurdêt Nawçiyayê qeraxê Amêdîyê w Akrê W Rewandizê w Nehrîyê nebûn (Şemdînanî 2021: 132).

Di vê risteyê da *ku bingihanek e, texmîn sed û pênce sal heye* hevoka pêwendîyê ye û hokera risteyê *texmîn sed û pênce sal heye* modîfiye kiriye. Herwiha *çu hukûmet kirde ye, li naw ‘eşairê kurdêt Nawçiyayê qeraxê Amêdîyê w Akrê W Rewandizê w Nehrîyê* têrker e, *nebûn* pêveber e.

(8)

Wextê Şêx Muhemmed Barzanîyê babe Şêx ‘Ebdusselam, ku ‘Usmanîyan helawîstibû, mirîdek li Hesenekan hebû (Şemdînanî 2021: 127).

Di vê mînakê da *ku* bingihanek e ku hevoka pêwendîyê bi risteyê ve *bestiye û hevoka pêwendîyê jî hokera risteyê modîfiye kiriye*. Wextê Şêx Muhemmed Barzanîyê babe Şêx ‘Ebdusselam hoker e, ‘Usmanîyan helawîstibû hevoka pêwendîyê ye û hokera risteyê ji alîyê çawanîyê ve rave kiriye, *mirîdek kirde ye, li Hesenekan têrkar e û hebû jî pêvebera risteyê ye*. Bi vî rengî risteyeka kompleks pêk hatiye.

(9)

Roja paştir sed mêr me li Rezge helan, sêsed mêr digel Ehmed Begê Beresorî, ku yêk bû ji çawuşêt xulamêt Şêx Muhammed Siddîq, me hinarine ser gundê Bîrê w gundê Çê (Şemdînanî 2021: 201).

Di vê mînaka risteya kompleks da *yêk bû ji çawuşêt xulamêt Şêx Muhammed Siddîq* hevoka pêwendîyê ye ku biresera risteyê *sêsed mêr digel Ehmed Begê Beresorî* modîfiye kiriye anku ji alîyê çawanîyê ve wê rave û tekûz kiriye. *hinarine* pêveber e, *me kirde ye, ser gundê Bîrê w gundê Çê* têrkara risteyê ye.

(10)

Di wê mabeyne de xeber geheşte hukûmeta Amêdîyê ku ewe dwazde roj e leşkirê Sûto li ser qesra Teto ye w Teto digel morîwêt xo di muhasere da ye (Şemdînanî 2021: 195).

Vê risteya kompleks bi hevokeka pêwendîyê saz bûye ku biresera risteyê modîfiye kiriye. *ewe dwazde roj e leşkirê Sûto li ser qesra Teto ye w Teto digel morîwêt xo di muhasere da ye* hevoka pêwendîyê ye û biresera risteyê *xeber* ji alîyê çawanîyê ve wesifandiye.

3.6. Risteyên Kompleks ku Lêkerên Espektîf di Wan da Hene

Risteyên kompleks bi bikaranîna lêkerên espektîf ên wekî *rabûn*, *çûn*, *lêxistin*, *kirinê* jî saz dibin. Lêkerên espektîf mîna lêkerên modal tîbî bikaranîn lê wekî wan wekî pêkhênaka risteyê bi rola berkarê nayên bikaranîn. Herwiha ew bi manaya xwe ya ferhengê jî di risteyê da cih nagirin. (Bûlbûl, 2019: 268). Di risteyekê da dema ku lêkerekî espektîf û lêkerekî bingehîn pevne werin bikaranîn risteyeka kompleks pêk tê. (Bûlbûl, 2019: 268).

Di tekstên ber dîstê me da jî bo vî cure risteyê jî bo lêkera *rabûnê* du mînak jî bo lêkera *çûnê* mînakekî lêkera espektîf hatîye peydakirin .

(1)

Rabû, çû nik qelê, dil bi xem pejmurde, ‘eciz (Şemdînanî 2021: 53).

(2)

Wextê bû zistan dîsa Ertoşî her weku caran rabû, çû Mûsilê, qesda mala dostê xo kir. (Şemdînanî 2021: 110)

(3)

Rîwî çû, got, “çak e biçim, hîleyekê li qelê bikem, belkî tola xo jê wekem” (Şemdînanî 2021: 54).

Wekî jî mînakên me jî dîyar in lêkera *rabûn* û *çûnê* di rewşa espektê da hatîye bikaranîn. Lêkera *rabûnê* di van risteyan da wekî hevokeka sereke yanî bingehîn dixuyê û bizavekekê nîşan dide lê bileksê wê ne bi manaya xwe ya ferhengê ve hatîye bikaranîn.

ENCAM

Vê xebatê bi kurdîya kurmancî hatîye nivîsin û mijara wê risteyên kompleks yê Bazeberê ye. Riste, risteyên kompleks, hevok, cureyên hevokan û bingihanek ji Bazeberê, ji Senem Xanim ku kitêbeka folklorik a çîrokan e û ji Xanima Kozê ku kitêbeka çîrokên modern e, nimûne hatine raberkirin. Beşa yekem ji bo mijarên mîna riste, ristesazî, riste ji alîye armanc û avasazîyê ve, hevok û cûreyên hevokan hatîye terxankirin. Beşa duyem ji bo jîyan, kesayet û berhemên Mela Se'îd û rolên wî yê civakî, dînî, sîyasî û herwiha hevkarîya wî ya edebî bi Bazil Nikitinî ra hatîye terxankirin. Beşa sêyem jî digel risteyên nimûnê ên ji Bazeberê wergirtî li ser pêkhatina risteyên kompleks ên ku bi cureyên hevokan ra çê dibin hatîye terxankirin.

Riste yekîneya herî mezin û serbixwe ya rêzimanê ye û ji gotineka ku biker û lêkerekê dihewîne û his û ramaneka têkûz derdibe, saz dibe. Riste ji alîyê armanc û avasazîyê ve hatîye dabeşkirin. Risteyên xwerû xwedîyê daraz û lêkerekê ne û risteyên kompleks jî herî kêr xwedîyê du lêkeran in. Hevok, ji komeka peyvên pêk tê, fikreke têkûz derdibe û xwedîyê kirde û pêvebera xwe ye. Cudahîya herî berbiçav ya hevokê ji risteyê ew e ku hevok di risteyê da dikare wekî navdêrekê, rengdêrekê û hokerekê tevbigere. Çendîn cureyên hevokan hene: hevokê sereke û ya nesereke ku hevoka sereke piranî berîya hevoka nesereke tê, hevoka hevseng, du hevokên cuda û xwedan lêker in û bi gihanekan yan jî xalbendîyekê hatine bestin, hevoka pêwendîyê biker, berkar û hokera risteyekê modîfîye dike, hevoka tamamker di risteyê da rola pêkhênên mîna biker û berkarê hildide. Dema ku di risteyekê da herî kêr cureyeka hevokê hebe ew riste ji alîyê avasazîya xwe ve dibe risteyeka kompleks. Risteyên kompleks jî bi piranî bi navgînîya cureyên hevokan pêk tên.

Mela Se'îdê Şemdînanî ji ber ku ji alîyê rewanbêjîyê balkêş e bûye mijara vê tezê. Di berhema wî ya Bazeberê da tiştên herî berbiçav ew e ku risteyên wî fambar,

kompleks û dirêj in. Herwiha bi berhema xwe ya Bazeberê pexşana kurdîya kurmancî gelekî xurt kirîye. Cureyên risteyên kompleks yê ku bi hevoka sereke, nesereke, tamamker, pêwendî, hevseng, yê lêkerên espektîf û yê navdêrê ava dibin, gelek nimûneyên xwe di Bazeberê da hewandî ne.

ÇAVKANÎ

- ‘Ebdulla Ferhadî, S. (2013). Hendê Layenî Ristesazî Zimanê Kurdî. Hewlêr: Çapxaney Hacî Haşim.
- ‘Ebdulla Xoşnaw, N. (2011). Ristesazî. Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.
- ‘Umer Ehmed, B. (2012). Riste ji Layê Pêkhatinê ve Di Dayalêkta Serî ya Zimanê Kurdî da Govera Badinî. *Govara Zankoya Dihok*, 15(1), 40-53.
- Akyol, H. (1992). Senem Xanim. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Alan, R. & Öpengin, E. (2014). Tîr û Armanc. Stenbol: Weşanên Peywend.
- Altun Demir, N. (2020). Kirmanckî/Zazakî da Cumleyê Kompleksî. *Kovara Folklor û Ziman*, 1(1), 35-60.
- Aydogan, İ. S. (2013). Guman-1. İstanbul: Lis Yayınları.
- Baran, B. (2015). Rêzimana Kurmancî. Diyarbakır: Belki Yayınları.
- Bedirhan, E. C. & Lescot, R. (1990). Kürtçe Grameri. Paris:Paris Kürt Enstitüsü.
- Bülbül, M. (2016). Risteyên Peywendiyê û Peyvrêzîya Wan (Devoka Mêrdînê). *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2(4), 22-45.
- Bülbül, M. (2017). Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêzîya Wan (Di Dîyalekta Jorî ya Zimanê Kurdî da - Devoka Mêrdînê), Teza Doktorayê, Zankoya Zaxoyê, Fakulteya Zanistên Mirovayetî, Zaxo.
- Bülbül, M. (2019), Risteyên Aloz Di Kurmancî Da. *Humanities Journal of University of Zakho (HJUOZ)*, 7(2), 263–273.
- Collins H.(2011) English Grammar, Third Edition. Great Britain: HarperCollins Publishers.
- Gültekin, Sinan (2019). Hevokên Temamker ên Berkarî yên Kurmancî yên Devoka Torê. Teza Lîsansa Bilin a Bitez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî. Mêrdîn.
- Gültekin, S. (2020). Hevreferansîya Bikeran Di Hevokên Kompleks Da. *Kovara Folklor û Ziman*, 1(2), 38-60.

- Jabar Abozaid, Majid (2018) Rolên Morfemên Nivîşî Di Sentaksa Zimanê Kurdî Da (Govera Behdîni). Teza Lîsansa Bilind a Bitez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî. Mêrdîn.
- Kan Yukuş, G. (2017). Teoriya Sentaksê û Sentaksa Kurmanciyê. Kenan Subaşî & Resul Geyik (Ed). dnv. Gotarên Zimannasiyê. İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- Malmîsanij. M. (2015), Kurmanca İle Karşılaştırmalı Kırmanca (Zazaca) Dilbilgisi. İstanbul: Vate Yayınları.
- Mukrîyanî, K.(2003). Sîntaksî Ristey Têkel. Hewlêr, Dezgayî Çapî Billawkirdinewe Aras.
- Nikitin, B. (1994). Kûrtler Sosyolojik ve Tarihi İnceleme. İstanbul:Deng Yayınları.
- Öpengin, E. (2016). Molla Said Şemdinani'den 1. Dünya Savaşında Kürtlere Alternatif Bir İttifak Önerisi, *Kürt Tarihi Dergisi*. Kürt Tarihi Dergisi, 26. Sayı, 5-9.
- Öpengin, E. (2019). Mela Se'îd Şemdînanî: Kesayetî û Berhemên Dersdarekî Tekiya Nehrî ji Serê Sedsala 20an. *Kovara Derwaze*, Hejmar 3, 92-104.
- Ornek, S. (2022). Ceribînek Li Ser Hevoksaziya Kurmancî. Ankara: Weşanên J&J.
- Salam Khalid, H. & Hamamorad, A. (2015) New Forms and Functions of Subordinate Clause in Kurdish. *International Journal of Kurdish Studies*, 1(2), 1–14.
- Şemdînanî, M. S. (2021). Bazeber. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Şerif, B. (2003). İngilice Dilbilgisi. İstanbul: Fono Yayınları.
- Yıldırım, K. (2012). Kûrtçe Dilbilgisi. İstanbul: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkîye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.